K.T.

ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ

ENSTÎTUYA ZİMANÊN ZİNDÎ

ŞAXA MAKEZANISTA ZİMAN Û ÇANDA KURDÎ

TEZA LÎSANSA BİLİND

**Avahîya Derûnî Ya Karekter Di Romana Diwahemîn Henarî Dunya Yê Bextiyar Elî De**

REBAND ISMAEL AHMED

ŞÊWIRMEND

Yrd. Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR

WAN– 2017

T.C.

YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVESİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

YÜKSEK LİSANS TEZİ

**Behtiyar Eli'nin Dünyada Nar Son Adlı Romanında Karakterlerin psikolojik Tahlili**

REBAND ISMAEL AHMED

DANIŞMAN

Yrd. Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR

VAN –2017

# NAVEROK

**MIJAR** **RÛPEL**

**KURTE** ........ III
**ÖZET** ........ IV
**ABSTRACT** ........ V
**PÊŞGOTIN** ........ VI
**SPAS Û PÊZANÎN JI BO** ........ IX
**KURTEBÊJE** ........ X
**1 DESTPÊK** ........ 1
**1.1 Têgeha Derûnasîyê** ........ 1
**1.1.1 Pênaseya Derûnasîyê** ........ 2
**1.1.2 Nasandina Zanista Derûnasîyê** ........ 2
**1.1.3 Peywendiya Di Navbera Derûnasî Û Wêjeyê De** ........ 3
**1.1.4 Rexneya Derûnî** ........ 8
**1.1.5 Dîroka Serheldana Dibistana Rexneya Derûnî** ........ 11
**1.1.6 Asta Derûnîya Mirovan** ........ 12
**1.1.7 Beşa Derûnîya Şîrovekirina Kesayetî** ........ 13
**1.2 Kesayetî Li Cem Pêşengên Dibistana Rexneyê Derûnîyê** ........ 13
**1.2.1 Sîgmond Froud** ........ 13
**1.2.2 Karl Gostaf Young** ........ 18
**1.2.3 Alfrêd Adler** ........ 22
**1.2.4 Can Pîyace** ........ 25
**1.2.5 Eric From** ........ 28
**2 Jiyan û Berhmên Ya Bextiyar Elî** ........ 30
**2.1 Ew Sedem Û Pirsgirêkane Bandorîya Wan Li Ser Avahîya Derûnîya Kareter Di Romana (Diwahemîn Henarî Dunyayî) Bextiyar Eli De** ........ 31
**2.1.1 Sedemên Pirisgirêkin Jivakî Li Ser Avahîya Derûnîya Karekterên Di Romana (Diwahemîn Henarî Dunyayî) Bextiyar Elî De** ........ 31
**2.1.2 Rolê Desethelata Sîyasî Li Ser Avahîya Derûnîya Karekterên Di Romana (Diwahemîn Henarî Dunyayî) Bextiyar Elî De** ........ 39
**2.1.3 Rolê Bandorîya Aborî Li Ser Avahîya Derûnîya Karekterên Di Romana (Diwahemîn Henarî Dunyayî) Bextiyar Elî De** ........ 45
**2.2 Xesleta Derûnîya Karekterên Di Nava Romana (Diwahemîn Henarî Dunyayî) Bextiyar Elî De** ........ 50
**2.2.1 Karekterê Geşbîn** ........ 51

**2.2.2 Karekterê Reşbîn** .......... 54
**2.2.3 Karekterê Asude (Aram)** .......... 57
**2.2.4 Karekterê Dilgiranî (Dilteng)** .......... 60
**2.2.5 Karekterê Xeydî (Aciz)** .......... 65
**2.2.6 Karekterê Sergerim (Hilçun)** .......... 68
**2.2.7 Karekterê Tirsinok** .......... 71
**2.2.8 karekterê Xemgîn** .......... 75
**2.2.9 Karekterê Namo (Nediyar)** .......... 79
**2.2.10 Karekterê Şermin** .......... 82
**ENCAM** .......... 86
**JÎNENÎGARÎ** .......... 91
**ÖZGEÇMİŞ** .......... 92

**KURTE**

Alîyê Derûnî karekter di va romanan de weke cûrekê giring di hê pêşçav. Herwisa durust bûna hevberya di nava karekteran romanên nivîskarê navborî de. Ji alîyekê din de destnîşankirina şehrezaya nivîskarî ji eşkerekirina alîyê Derûnî karekterên romanê de.

Bextiyar Alî xelkê bajerê Silêmanî ye. Niha li Elmanî ye jiyandike. Bextiyar Elî çend helbest û romanê di nivîse, ew jî hin ji wan romaninin: Êwarewy Perwane, Mercî Taqaney Dûwem, Koşkî Balindey Xemgînekan, Şarî mosîqare Sipîyekan û Diwahemîn Henerî Dûnya li gel çend helbestan. Eşkereye di romana Diwahemîn Henarî Dûnya piranîya bûyer û karekterekan qala jiyana xwe a çaxê 1990 an de dike. Ku bişkeka baş a romanê qala çaxê Serheldan û Şerê Navxwe dike.

Di vê lêkolînê de eşkerekirna eger û pirsgirêkên civakî, siyasî û aborî bandûra xwe heye li ser Derûnî ya karekterên romanê. Li gel çareserkirina wan pirsgirêkên di nava civakê kurdî de heye. Ji bo vê yekê van sê egeran bandûreka pir baş hebû li ser Derûnîya karekteran. Digel eşkerekirina xesletên Derûnî ya karekteran wek karekterên Geşbîn û reşbîn û aram ...hwd. Ku bi awayekê eşkere di nava romanê de heye.

**Peyvên Sereke:** Derûnnasî, Derûn û Wêje, Rexne ya Derûnî, Karekter, Bextiyar Elî

**ÖZET**

Insanın psikolojik halleri romanin içinde önemli bir yer tutar, ve insanlarin birbiriyle rekabet halinde olmasi yazarin romanında öne çıkan önemli bir boyuttur.

Bahtiyar Ali Süleymanyali ama şimdi Almanya oturuyor. Bahtiyar Ali bir kaç roman ve kaside yazmiş; romanlarından bazıları: Pervane akşamı, Şimdi ikini ruh,Üzgün kuşların köşkü,Beyaz sakalların müzik şehri,Dünya narın sonu... romandaki olaylar ve karakterler kendi zamanini anlatiyor yani 1990lı yıllardaki olaylar; iç savaş, devrimler ve göçler....

Bu araştirmalmda sosyal, siyasi, ve iktisadi problemlerin sebeplerinden bahsediliyor ki insanin karakterine ve ruhuna dolayısıyla etkide bulunuyor. Ve ayni zamanda kürd toplumun sorunlarinin çözümüne yönelik dolaylı ve dolaysız imalarda bulunuluyor.

**Anahtar kelimeler:**Piskoloji, Edebiyat, Piskolojik Eleştri ,Karekter Çözümlemeleri, Behtiyar Ali

## ABSTRACT

The psychological side of character is one of the main genres in the novel. The conflict is happening between characters in the author's novel, on the other, selecting the aesthetic use of the author in providing the psychological side of the character.

Bakhtair Ali is from Sulaimani and living in Germany. He wrote many novels and poems. Novels are Ewaray Parwana, Marji Taqanay Dwam, koshki Balinday Ghamginakan, Shari Mosiqa Spyakan and Dwahamin hanari dunya. The novel of (Dwahamin hanari dunya) is talking about the author's life in 90s and mostly the novel talks about the kurdish uprising and civil war.

The research reveals the reasons and issues of the social, political and economic which effect on the psychology of the character, furthermore, solving the problems that appear in the Kurdish community. The 3 reasons that mentioned before effect on the characters. The psychological features of the characters become apparent on the novel such as optimistic, pessimistic, relaxing and boring of the characters.


**Key words:** psychology, psychology and literature, psychological criticism, character, Bakhtiar Ali.

## PÊŞGOTIN

Roman her wek cûreke nû ya wêjeyê tê berçavan û di nîşandana bûyer û serpêhatîyên rasteqîneyên civakê û di derxistina alîyên wan yên veşartîyên nav civakê da giringî û pûteya wê heye , ji ber wê em dikarîn di nav romanan da ew alîyên ku romannivîs guzariştê li wan dike û di cîhê cuda cuda da behsa bûyer û kesayetîya wan dike bibinin.Çunkî romannivîs gelek carî hewlê dide ku bi nivîsandinê guzariştê li ew bûyerên ku di raborîya wî/wê da bi şêweyekî rasteqîne hebûn dike û gelek car jî guzariştê li ew tiştên ku di dilê wî/wê da mabû û nikarîbû bi axaftinê derbibira (îfadebikira) dike.

Ew xebata nivîskar jî ji bo wê ye ku heta bi temamî hestê bi aramî û asûdeyîya dil û derûna xwe bike.

**Sînorê Lêkolînê**

Ev lêkolîna taybete bi romana (Diwahemîn Henarî Dunya) û derxistina taybetmendîyên derûnîyên nav romanê.

**Navnîşana Lêkolînê**

Ev lêkolîna her wek ji navnîşana xwe jî diyare (Avahîya Derûnî ya Karekter Di Romana Diwahemîn Henarî Dunya Ya Bextîyar 'Elî De) hewleke akademîke ji bo derxistin û diyarkirina taybetmendîyên derûnî yên kesayetîyên nav romanêye û behskirina hokar (sedem) û pirsgirêkên civakî, sîyasî û aborî ne ku bandora wan li ser avabûna derûna kesayetîyên nav romanê da heye.

**Astengî û Pirsgirêkên Lêkolînê**

Bêguman hemû xebatên zanistî û akademîk di dema encamdanê da lêkolêr rûbirûyê hinek arîşe û astengîyan dike ku em jî di vê lêkolîna xwe da rastî van arîşe û astengîyan hatin, wek; nebûna çavkanîyên pêwîst bi zimanê kurdî di derbarê derûnzanîyê da herwisa di serî da nebûna pisporîyeke baş ji bo çawanî nivîsandina perawêzan bi pergala (sîstema) (APA 6) em rûbirûyê astengîyan kir lê belê paşê bi hewldan û pirskirina zêdetir ji kesên di vî warî da pisporin, êdî me ev pirsgirêkên xwe çareser kirin.

**Giringîya Lêkolînê**

Giringîya vê lêkolînê xwe di wê da nîşan dide ku heta niha tu (hîç) xebateke taybet li ser alîyê derûnîyê di romanên Bextîyar 'Elî da nehatine kirin û bi taybetî jî li ser alîyê derûnîyên romana ''Diwahemîn Henara Dunayê'' nehatîye kirin.

**Rêbaza (Metoda) Lêkolînê**

Siruşta lêkolînê em neçar kirin ku em li ser çar rêbazan bixebitin ku ew jî ; rêbaza dîrokî, rêbaza wesfî, rêbaza hûrnêrîyê (şîkarî, analîtîk) û rêbaza derûnî ne.Herwisa me di beşa yekem da rêbazên wesfî û dîrokî bikar anîn, di beşa duyem da jî rêbazên wesfî û hûrnêrî û derûnî bikar anîn.

**Armanca Lêkolînê**

Armanca lêkolîna me ji diyarîkirin û berçavkirina hokar û pirsgirêkên civakî, sîyasî û aborî û diyarkirina taybetmendîyên kesayetîyan wek; kesayetîyên geşbîn, reşbîn, asûde (aram), dilgiranî (dilteng), xeydî (aciz), sergerim (helçun), tirsonek, xemgîn, namo (nediyar), şermin.

**Pêkhateya Lêkolînê**

Ev lêkolîna ji bilî pêşkeşkirin û spas û pêzanîn û pêşekî û kurteya bi zimanê kurdî , tirkî , îngilîzî , du beşan li xwe digre ku ev in :

**Beşa Yekem**

Ji du teweran pêk hatîye, di tewera yekem da; behs têgih û rêmana derûnzanîyê, pênaseya derûnzanîyê, nasandina zanista derûnzanîyê, peywendîya di navbera derûn û wêjeyê da, rexneya derûnî, dîroka serhildana rexneya derûnî, astên derûnîya mirovan û beşên derûnîya mirovan hatîyekirin,Di tewera duyem da jî; behsa kesayetî li ba pêşengên rexneya derûnî bi mînakên Sîgmond Froud (1856-1939), Karl Gostaf Yong (1875-1961), Alfrêd Adler (1870-1937), Can Piyace (1896-1980), Eric From (1900-1980) hatîyekirin.

**Beşa Duyem**

Ji du teweran pêk hatîye ku di tewera yekem da behsa ; ew hokar û pirsgirêkên ku bandora wan li ser avahê ya derûnî ya kesayetîyên di nav romana (Diwahemîn Henarî Dunya) ya Bextîyar 'Elî da hebû hatîyekirin . Herwisa me behsa hokar (sedem)

û pirsgirêkên civakî, rola desthelatîya sîyasî û rola bandorîya aborûyê li ser avahîya derûnî ya kesayetîyên nav romanê jî kirîye, Di tewera duyem da jî behsa; Taybetmendîyên derûnî yên kesayetîyan di nav romana (Diwahemîn Henarî Dunîya) ya Bextîyar ‘Elî De bi mînakên; geşbîn, reşbîn, asûde (aram), dilgiranî (dilteng), xeydî (aciz), sergerim (helçun), tirsonek, xemgîn, namo (nediyar), şermin.

Di dawîyê da me di çend xalan da destnîşana armancên ku em gihîştin wan kir, paşê jî me bi şêweyeke zanistî lîsteya çavkanîyên hatine bikaranîn destnîşan kir.

**REBAND ISMAEL AHMED**

**VAN 2017**

## SPAS Û PÊZANÎN JI BO

Xwedayê Mezin ku derfeta xwendina masterê (lisansa bilind) da min.

Dayik û bav û xwişk û brayên min ku di her demên pêvajoya jîyanê da piştgirîya min kirin.

Zanîngeha Yuzunci Yil (Yüzüncü Yıl Üniversitesi) ku derfeta xwendina masterê da min.

Gelek birêz Dr. Mahmut Dündar ku erka şêwirmendîya nameya min girte ser stûyê xwe.

Gelek birêz Dr. Goran Soran Feyzî û Ni'me Qerenî ku wanebêjin li Zanîngeha Sellaheddîn Kolêja Perwerde Beşa Ziman û Wêjeya Kurdî ku herdem hevkar û rênîşander bûn ji bo xwendina masterê.

Mamosta Dîdar û Mamosta Raber ku di dema nivîsandina nameyê da gelekî alîkarîya min kirin.

Hemû ew mamostayên ku di xwendina fakultê û masterê da mamostayên min bûn û em digel hev bûn.

**REBAND ISMAEL AHMED**

**VAN 2017**

**KURTEBÊJE**

| | | |
|---|---|---|
| T.m | : | Teza Master |
| Weş | : | Weşanxane |
| Wer | : | Wergêr |
| Hdw | : | Heta Dwayî |
| Hej | : | Hejmar |
| Pz | : | Pêş Zayinî |

# 1 DESTPÊK

Li ba (li gorî) gelek kesan zelale ku roman cûreyeke nû ye û zêdetir bi şêweya pexşanê ve tê nûsîn, lewma dema ku nivîskarek romanekê dinivsîne bi armanca çareserkirina pirsgirêkên nav civakê da hene bi şêweyeke nerasterast guzariştê li bûyerên civaka ku têda dijî dike,ev jî olanê di dema ku xwendevanek romanê dixwîne û hest bi ew bûyer û alîyên ku di nav civaka xwe da heye dike dide.

Peywendîya di navbera wêje û derûnê peywendîyeke tund û xurt e ku dema romannûs romanekê dinivsîne çend raguhastinên (palnerên) derûnî yên serekî û neserekî hene ku ji bo nivîskar dibin rawestgeha destpêkirina nivîsandina berhemên wêjeyî wek; roman , ji ber wê dema ku em bala xwe didin romana nîvîskarê navborî em dibînîn gelek sedemên derûnî hene ku bûne sedema nîvasandina romanê û digel hebûna olandana (dengvedana) hinek astengîyên sîyasî û aborî û civakî bûne heyvan (maya, hewên) û nivîsandina romana (Diwahemîn Henarî dunyayê).

## 1.1 Têgeha Derûnasîyê

Ka em bi balkêşî temaşe bikîn û bi zanîn peyva Derûnasî ji kuderê hatîye ? Di nava gelan de kijan peyv beramberî wê bi kar hatîye ? Em dibînîn ku Yunana kevin di destpêkê de ev peyv bi kar anîne ,(Psyche ) ku tê wateya derûn yan jî ruh û ( Logos ) jî tê wateya Zanîst.

Em dibînîn ku di alîyê gelên din de jî bi zarevayek din beramberî vê peyvê hatîye bi karanîn ,*“Di zimanê Yunanî de jêre di bêjin ( Psychelogos ) û di zimanê Îngîlîzî de jî ( Psychology ) di heman demê de Firansî jî jêre di bêjin, ( Psychelogos ). Di zimanê Erebî de jî bi wateya ( Elm Alnfs yan jî Alsîkolocya ) hatîye”* (Xerîb, 2011: 4),Peyvên gelek bi wate beramberî Derûnasîyê bi kar hatîye. Di zimanê Ukranî de beramberî peyva Derûnasî, peyva (Психологія ) bi kar hatîye. Di zimanê Rusî de jî peyva (Психология) bi kartê û di zimanê turkî de jÎ peyva ( Piskoloji ) bi kar hatîye.

Peyva ( Derûnî ) di pirtûka Dîrokî a Rexnesazîyê de bi vî awayî hatîye amajekirin : *" Zaravê derûnî wate ( Alnfs ) di kevintirîn qunaxa dîroka şaristanîya cîhanê de bi kar hatîye. Li gorî zimanên kevin yên wekî zimanê Yunanî, Romanî û Erebî bi dehan pirtûk û lêkolîn hatîna çêkirin ji bo şîrovekirin û qalkirina wê "*(Besîr, 1993:

12), dema ku di zimanê kurdî de peyva Derûnî tê gohê me yekser derûnîya kesî tê ber çavê me.

Di alîyê hemuyan de jî eşkere ye ku Derûnasî ji derûnîya mirovan pêk tê. Bandorîya derûnîyê jî li ser mirovan heye em ê li jêr çend pênase, erk û naveroka Derûnasîyê bidin diyarkirin.

### 1.1.1 Pênaseya Derûnasîyê

Derûnasî : *" Ew zanîsteye ku lêpirsîna jîrîya mejîyê mirovan dike. Lê belê hinek din di wê bawerîyê de ne ku derûnasî ji lêkolîna zanîna derûnîya mirovan pêk tê "*(Şerîf, 2009: 15) .

Derûnasî : *" Ew zanîste ye ku hewil dide ji kesayetîyan fêm bike, helwesta kesan beramberî sergirtina hestan di rêya laşde di guncîne "* (Nûser, 2008: 77) .

Kirîstîyan Von Wlf : Peyva derûnasî ji bo vê armancê bi kar anîye . *" Şîrovekirina felsefeya rastî a meteryalîzma diyardeyên hestan destnîşan dike "* (Şerîf, 2009: 11)

Derûnasî : *" Pêktê ji lêpirsîna zanistî û reftarê mirov, ji bo xwe çareserkirinê di jîyanê de "* (Qereçetanî, Saykolojiyay Giştî, 2007: 33).

Eger li gorî wan pênaseyên li jor be ji me re tê diyarkirin ku gelek ji wan misogerîyê li ser wan dike. Derûnasî lêkolîneke di derûnîya mirovan de, gehiştina rastîya derûnîya mirovane. Xweza û dewruber bandore li ser derûnîya mirovan.

### 1.1.2 Nasandina Zanista Derûnasîyê

Eşkereye ku zanîsta derûnîyê jî mil bi mil li gel zanîstên dine jî , mînak : zanîstên wekî; kîmya û bîrkarî û fîzîk û gelek zanîstên dinjî. Lê belê cîyawazîya vê zanîstê ji yên din ew e ku lêkolînê di derbarê derûnîya mirovan de dike. Her pisporek û zanayekî ê derûnîyê fikrên cuda hene di beramberî vê zanîstê de. *" Derûnasî dozgerê zanistîye. Pêwîste li ser dozgerîya zanîstî giring bi sekine û di alîyande kar tê de bike. Li ser armnca fêmkirina çareserîya zanîstan "* (Şerîf, 2009: 33) ,naskirina derûnîyê ew kare ye ku pê radibe. Pêktê ji projeyekî zanîstî ji bo lêkolîna derûnîya mirovan.

Her zanîstek bi şêweyekî di şêweyek din de geştyarîyê di alîyê din de dike û kar li ser dike. Mînak : *" Jîyolojî, mijarekî a zevî yê ye. Zîndîvanî jî dozgerîya ajan û gîyandaran dike. Fîzîk jî ji germî, deng û meqletîzê pêktê... hwd "* (Qereçetanî, Saykolojiyay Giştî, 2007: 33) , Ji ber vê jî pêwîste di wan hemu alîyan de lêkolînê

bike ku peywendî bi reftar û derûnîya mirovan re heye. Bandorîya wê jî li ser alîyê laşê mirovan de ye.

Eger em lê hurbunek li ser zanîsta derûnasîyê bikîn emê bi bînîn ku dibe du alî. Ew jî alîyê Zanistî ( û alîyê (Praktîkî). Alîyê zanîstê pêk tê ji " *Dozgere li ser diyardeyan û bi armanca komkirina zanîstê ye. Danîna bîrdozîyekî dibistana derûnîyê ye* "(Qereçetanî, Saykolojyay Giştî , 2007: 34) Lê belê alÎyê Piraktîkî " *Taybete bi karkirina zanistê û bîrdozîya derûnasîyê di alîyên cuda cuda ê jîyanê de ji bo sudê jê wer bigirin û xizmetê ji bo mirovatîyê bike* " (Qereçetanî, Saykolojiyay Giştî, 2007: 34) , ev jî wê rastîyê radigihîne ku her du alî jî temamkerên hevdune û ji hevdû cuda nabin.

Em dikarîn bêjin girîngîya vê zanîstê di jîyana me de bi sude û em dikarin sudê jê bigirin. em dikarin bersivên zanistî bi din diyarkirin û pirsgirêkan bidîn çareserkirin bi taybetî wan pirsgirêkên ku taybetin bi alîyê derûnîya mirovan ve.

### 1.1.3 Peywendiya Di Navbera Derûnasî Û Wêjeyê De

Peywendîyek hişk û bi tol di navbera derûnî û wêjeyê de heye. Ji ber vê jî dema ku em dibînîn helbestvan yan jî nivîskarek Roman û çîrok û destnê dinivîse tê diyar kirin ku peywendîyek bi derûnîyê ve heye. Ev jî dibe sedemê ku berhema xwe a wêjeyî bi bilindî bi nivîse. Ji ber vê jî " *Wêje û wateya derûnîyê, pirsgirêka kesan di derûnîyê de, lêkolîna pîskolojîyê di karên wêjeyî de Cîhana wêjeyê di rêya wêjeyê de ji bo cudakirina ji rastîyê, bilindbuna wêjeyê li ser rastîyan de cîyawazîya xwestekên derûnîya wêjeyê bi pisporane, afirandina hunerî û xemilandina wêjeyê* "(Bokanî, 2006: 10).

Di peywendîya derûnî û wêjeyê de, nivîskar hewil dide ku jîyana xelkê di nava wêjeyê de bide diyarkirin. " *Wêjeyê hewildaye ji bo diyarkirina derûnîyê xelkê di reftarê rojanede bê hest bike û nebîne. Ji ber ku bazarekî û karkirinekî pêwîst ji bo nasandina derûnîyê nîne* "(Bokanî, 2006: 11-12) , Pêwîste bi şêweyekî derûnî bide diyarkirin ku xelk pêwîstîya wan a rojane pê heye.

Nivîskar hewil dide pirsgirêkên civakê kom bike, di nivîsînên xwe de tamê bide xwêneran û derûnîya wan asude bike. " *Ji ber ku endamên hestyarîya nivîskar karek girîng dibîne di avakirina berhemê de. Bi heman şêwejî kesê peyamgir jî endamên wî yên hestkirinê karê wergirtinê dibîne. Ev jî peywendîyê di navbera nivîskar û*

*xwendekar de çê dike "* (Kerîm, 2013: 30 - 31) , nivîskar di xwaze fikr û hizra li cem wî heyî bi gehîne xwendekar da ku tamê pêşkêşî wî bike.

Derûnîya wêjeyê hewildide wê rastîyê diyar bike ku di nava mijara nivîskar de heye. Ji ber vê jî du dibistan hene di navbera derûnîya wêjeyê û nivîskar de ew jî evin.

Dibistana Yekem : *" Dibêjea xweşikîya mijar, berjeng û taybetmendîya rizgarîyê di wêje û bingeh de heye. Serxwebuna fêmkirina mejîyê me buye sedemê hemu xelk wekhevbin û li ser yekbin. Belê xweşik bun heye her çiqas aqil hest jî neke "*(Hemed U. U., 2015: 27), *Her çiqas li gorî dibistana duwem " Hêza mijarê heye ku aqil û hizrê me li hev bide. Mijarên baş ji aqil û hizra me çêdibe, nek wek babetekî bi awayekî serbixwe. Ev dibistane dibêje; Mijara guncav li ser hizir û pêşveçûna kesan û derûnîya rewşenbîrîya kesan di sekine "*(Hemed U. U., 2015: 27),li gorî dibistana yekem xweşikbuna babetê sedemeke ji bo tam bexşîna xwendevan û asudekirina derûnîya xwendevan. Lê belê li gorî dibistana duwem jî babetên baş dikare hizrek liser mejîyê me çêbike, di heman demê de hest bi rastîya babetê bike.

Eger em bên û temaşe bikîn, em ê bibînîn tam bexşîna mijaran ji kesekê derbasî kesek din dibe. Her kesek bi şêweyek cuda tamê ji mijarê distîne. Li gorî derûnîya xwe tamê jê digire, ev jî dizivire li ser du beşên mirovan. *" Yekem ; Jîyên mejîyê hemu kesê ne wekheve, li gel cîyawazîya dab û nerêt. Duwem: Cîyawazîya kar na gehe li ser fêmkirina hestkirin, şêwe, mijar û rengê. Ji ber ku hizir beşdarîya diyarîyê dike "* (Hemed U. U., 2015: 28) ,Ji ber vê jî perwerde bandorê li ser tama mijarê dike. Hizrê mirovan wisan dike ku ta demekê tama mijarê bi derûnîya xwêner bi bexşîne.

Xwendekar wisan dike ku bi cûrekê tamê ji mijarê bistîne, da ku bandor li ser derûnîyê jî hebe. Ev jî rengê bi ser jîyanê. Ji ber vê jî *" Xwendekar ezmuna burîyê xwe û kesayeta xwe têxe di nava mijarê de. Piştî wê jî xwêner balê dikişîne ser nîşanên rêkû pêkên mijarê. Babetên xwe lêkolîne dike, wê çaxê ji hêvênê hizrê xwe tecrubeyên nu derdixe. Bi cûrekê van tecrubeyên nu bi awayekî helbestîyane dide nivîsandin "*(Birêslêr, 2007: 30) , di vir de armanca nivîskar ewe ku xwendekar temaşeyî buyerên bûrî û yên niha ê xwe dike. Wê çaxê wan ceribandinên nû li gel jîyana xwe di guncîne.

Her di derbarê derûnî û wêjeyê de wa dibînîn ku nivîskarên kevin yên Romanî û Yunanî qala helbest û gelek babetên derûnî kirîne. Li gorî wan jî evan berheman bandora wan li ser derûnîya xelkê hebû. Di heman demê de reng jî daye jîyana wan a rojane. Ji ber vê jî emê li jêr qala çend ji wan nivîskaran bikîn.

### 1.1.3.1 Sokrates[1]

Yek ji wane ku misogerîyê di alîyê derûnî de dike *" Li gorî bawerîya wî, mirov ji can û rih pêkhatîye "* (Nesreddîn, 2013: 27) ,her dema ku mirov bi hestên û hizrê çavdêrî li ser tiştên dewruber kir wê demê ji xeletîyan dur dikeve.

Ji ber vê jî em dibînîn ku Sokrates jî yek ji wane ku ji durve qala alîyê derûnîyê kirîye. *" Wî ji xwezaya mirovan dabeşî du beşan kirîye ew ji Aqil û Xwesteke "* (Xerîb, 2011: 5)eger wisan be Sokrates dibêje ; Mirov pêwîstîya wî di hemu deman de bi derûnîyê heye ew ji bi aqil û xwestekan biryarê li ser titşan dide.

*" Sokrat di felsefeya xwe de girîngîyê bi mirovan dide, di kolan û bazarê de li gel xelkê hevpeyvîn dikir. Ne diçu cem sofîstan ji ber ku dizanî ew metirsîne li dijî girîngîyan. Bingeha bineretîya derûnîyan ji ( Xwe naskirinê )pekdihat. Ji ber ku ya ku didît zanyarîyên rast ê di nava kesan deye "* (Şerîf, 2009: 22) , Ji ber vê jî diçu bazarê ji bo ku derûnîya xelkê nasbike û lêkolînan li ser bike daku zanyarîyên rast li ser derûnîya wan bike.

### 1.1.3.2 Arîstotales [2]

Li gorî Arîsto derûnnasî dabeşî bi ser sê beşan de dibe. Ew jî wekî yên li jêrin:
*A- Derûnîya Pêşketî* **:** *"Ev derûnî bingeha jîyan xwarin û pêşketinê ye. Ev derûnî li cem kesan heye û karê yekem ê derûnîyê ye .*
*B - Derûnîya Gîyandaran ( Heywanan ) : Karên rêxistinan û hîskirina di rêya her pênc lebetên hîskirinê ne. Ev ji çav, bihîstin, bêhnkirin,tamkirin*
*C - Derûnîya Bêjeran* **:** *" Karê wêjî hizirîne ev derûnî jî taybet a mirovane "* (Şerîf, 2009: 26) , li gorî beşkirina arîsto, bê ewna jî derûn bandorîyek zêde heye. Ev jî çi di alîyê jîyanê de hebe û bandorê li ser hestên mirovan dike. Derûn wisan dile ku tu bi hizirî û hizran jî bidî.

Arîsto di derbarê lêkolînê de dibêje : *" Ji xwesteka zikmakî û destpêka dayîkbûnê, xwesteka lêkolînê, heskirina fêmkirinê û zanînê û xwesteka xwe dîtinê ev*

---

[1] Sokrates*" 399-470 pz Fîlozofê binav û deng ê şêweyê ( Zanîsta Sokratîye ). Sokrates mamostayê Eflaton Platone"*(Şerîf, 2009: 22) .

[2]Arîstotales **:***" 322- 384 pz Arîsto yek ji wan zana û fîlozofane ku cara destpêkê pirtokek di derbarê deronasî de jêr navê ( Deronî ) çêkirîye. Arîsto rulekî du serî hebu di deronasîyê de "* (Şerîf, 2009: 25)

*xwestek hemu di destpêkê de ji alîyê gelan ve ye. Hunandîya ( Ertcalî ) pêkhatîye, ( ji dayîk bûye ). Wê çaxê hêdî hêdî ev hunadî ye li gorîya derûnîya hestan hatîye gohertin "*(Besîr, 1993: 82) , li cem arîsto lêkolîn sedemeke helbestvan derûnîya xwe pê asude bike û gelek fikir û hizrê pê birêje.

Li gorî Arîsto *" Komedya, lêkolîna mirovan bê qedir û qîmed dike... Ne wisane ku em bêjin bingeha kesayetîya van mirovan li ser hemu pirsgirêkên xirap damezirayîye. Lê belê kesayetîyên wisa herî zêde taybetîyên bi vî awayî bi pêkenokên jê neyên heskirin dertixin û zîyanê bi kesan nadin "*(Birêslêr, 2007: 49) , eger wisan be komedya jî lêkolîna wan tiştan dike ku bê qîmete. Wateya komedyayê wisan radigihîne ku çi bandorê li ser xirabîyê hebe yan jî nebe ev di zivire ser alîyê derûnîya kesan.

### 1.1.3.3 Eflaton Platon[3]

Li gorî wî jî derûnîya mirovan dabeşî bi ser Sê beşan de dibe , wekî yên li jêr me dayîn diyarkirine.

*" A- Derûnîya Aqil **:** Cihê serwê di serê mirov deye û nêzîkî asîmane.*

*B- Derûnîya Aciz **:** Cihê wê dile.*

C - Derûnîya Xwestek Perest***:*** *Cihê wê di nava sing deye "* (Xerîb, 2011: 6) *,* li gorî Eflaton peywendîyek baş di navbera derûnî û laşê mirovan de heye. Bandora wê li ser mirovan heye ku karên wê bi başî rêve bibe.

Li gorî Eflaton helbestvan dînin û pêwîste ji komara wî derbikevin û cihê wan tê de nîne. Ji ber vê jî dibêje : *Desthilatîya helbestvan, zilamekî kêm aqile. Jinekî kêm aqil tîne û zarokekî kêm aqil jî çêdike "* (Birêslêr, 2007: 44) , li gorî vî fikrê Eflaton; Helbestvan dînin û di xwazin di rêya berhemên xwe de derûnîya xelkê têk bibin. Bi wateyek din jî helbestvan dibin sedemê têkdana derûnîya xelkê û wisan dikin aqilê xelkê têkbibin. Ji ber vê jî a baş ewe ku ji komara xwe derbixe.

Eger qala zanîsta Eflton bikîn. Xuyaye ku ( Zanîsta Eflaton ) li ser bingeha lêkolînê çêbûye. *Bi vê wateyê hemu berhemên hunereî ji lêkolîna wan a li ser xwezayê pêktê. Hemu tiştên destkarîya wan hatîne kirin wêneyên mijarên cîhanîne û mînakên wane. Li gorî fikrê Eflaton cîhana rast rastîye. Di vî alî de hemu berhemên hunerî ji*

---

[3] Eflaton : 347- 427 pz *" Eflaton xwendevanê Sokrates bû. Xwedîyê gelek berhevkirina ne di derbarê deronasîya kevin de. Xwedîyê çend zanîstane di babetên cuda cuda de. Eflaton peymangehek zanîngehek mezin di sala 387 pz de li Esîna damezrand. Nivîsên wî di derbarê felsefeyê de hebû. Berhema wî a herî girîng jî ( Komara Eflaton ) bu"*(Şerîf, 2009: 22 - 23).

*lêkolîna şîroveyê pêktê”*(Kerîm, 2013: 26) , lêkolîn li cem Eflaon lêkolîna cîhanî xweza û tiştên rastin. Ji bo vê jî derûnîya xelkê têk nadin û bi rastî tiştan rabigihînin û bandorîya xirap li ser wan neke.

*" Zanîsta Zanyarî li cem Eflaton li ser bingeha zanîsta derûnî û xweza, peywendîya wan bi laş û derûnîyê re heye. Derûnî li cem wî nemirîye. Derûnî ji laş kevintire. Di cihanek din de dijî li gorî vê jî Eflaton navê wê kirîye ( Cîhana Beha )"*(Şerîf, 2009: 23) , di vir de li gorî Eflaton derûn û alîyên din ê jîyanê peywendîyekî baş di navbera wan de heye.

### 1.1.3.4 Horas [4]

Di derbarê çavlêkirinê de dibêje : *" Helbestvan pêwîste çav li helbestvanên din bi taybet yên demê burî bike "*(Birêslêr, 2007: 53),Da ku agahîya wan ji demê burî û derûnîya nivîskarên pêşîya xwe ,bi wê wateyê ku eger helbestvanên pêşîya wan rastî pirsgirêkên derûnî hatbin xwe ji wan pirsgirêkan dur bixin ew jî da ku xelk berhemên wan bi başî bizanin û tamê jê bigirin bêyî ku bandorê li ser derûnîya wan bike.

Li gorî Horas; *" Dawîya armanca wêjeyê ew ku ( Dulcote Utile ) bi tam û bi sud be. Li gorî fikrê Horas nivîsên herî baş hem fêr dike û hem jî tamê dibexşîne ji bo fêmkirina vê armancê. Pêwîste helbestvan ji wergirtina babetê fêm bike nas bike: Xwendekarên pispor dibe ku xweşa wan here û jê tiştan fêr bibe. Xwendekarê din ji yanî ê asayî jî li gorî wan jî xweş be sivik û sadetîya babetê bixwînin û serê xwe pêve mijol dikin "* (Birêslêr, 2007: 54) , Xwendekar balê dide ser alîyê derûnîya nivîskar û li gorî tama xwe berhemên herî baş yên nivîskaran hildibêjê re.

Di derbarê zanayên derûnîyê de em dibînîn ku beşekÎ gelek misogerî li ser peywendîya derûn û wêjeyê de kirîne. Ji ber vê jî *" Di vir de pêwîste pêşkêşî ji bo Froud û dibistana şîroveyîya derûnî bi taybet ( Yong û Adler ) bê kirin. Rolekî mezin dîtîne di anîna cûrekî nu yê rexneya wêjeyê û derûnîyê de,vekirina bingeha hêlînan dibe sedemê vekirinekî zêde ya alîyê pirojeya xolqandina wêje û tamgirtina hunerî. Belgeya vê jî ewe ku wêje di pileya yekem a bîyolojî derûnî yê deye. Pêktê ji wan heskirin û xwestekên tevlîhev yên ku têrnebûyîn û ne hatîn derketin "* (Qereçetanî, Saykolojyay Geşe, 2009 : 21), ji ber wê jî ya ku em di vir de herî zêde misogerîyê li

[4] Horas **:** di navbera salên 6-8 pz ji dayîk buye. Derûn misoger kirîye bi awayekî ne zindî.

ser dikîn, fikrê Froud û barê wêje û derûnîyê ye. Froud bi xwe jî herî zêde behsa wê kirîye.

*'' Li gorî Froud hunermend wekî kesekî rastî hesab hatibe ye. Ji ber pêwîstîyên xerîzîya bi hêz rastî xem û êşan dihatin. Ji ber vê jî giringîyê didin xeyalê ji rastîyê dur dikevin. Lê belê hunermend ji bo xeyal xwazên din, dizan çawe zindî bike , xwenên xwe perwerde bike. Şêweyên xweş pê bibexşîne û bi cûrekê bide qebulkirin ''*(Îgilton, 2004: 92) , eger wisan be nivîskar û hunermend ji ber hesabê piştgirîya xeyalan dike. Ew tiştên di nav singê wî de derbixe û wisan bike ku xelk berhema wî pesend bike.

Em wisan dibînin ku fikrên Froud herî zêde misogerîyê li ser hesabê hunermend yan jî nivîskaran dike,*''Ev mesele jî amadene û peywendî bi qalibê hunerî ve heye. Lê belê wêneyê hunermend wekî rupelekî kesekî nexweş aciz di asanîyê deye. Froud di berhema xwe a ( Xwen name ) de derbarê girîngîya xwenê de şîrove kirîye. Gelek îlham bi zanîsta wêjeyê û derûnîyê bexşîye''*(Îgilton, 2004: 93), Ji ber vê jî em dibînin ev kare herî zêde misogerîyê li ser hesabê nivîskar dike. Ev rê xweşkirine herî zêde wêjeya û derûnîyê destnîşan dike. Belku li gorî hesabê xwe hîn zêdetir berhemên xwe binivîse.

Froud dibêje : *'' Ew nivîskarê ku xwenê bi xweşîyê û pîrozîya deshilatdarî dewlemwendîyê ve dibîne , ew xwen û xwestek , hêvîya xwe di rêya nivîsînên wêjeyî ve derdixe holê. Di gehije wan tiştan ku carnan di xeyal de hebûn ''* (Bokanî, 2006: 22) ,armanca Froud ewe ku ew nivîskarê rojek ji rojan tiştên di xeyal di mejîyê wî de bigihîne desthilat dar. Ev armanc jî di rêya nivîsîna de derdikeve holê.

### 1.1.4 Rexneya Derûnî

Ji bo diyarkirina rexneya derûnî em dikarin bêjin; Rexneya derûnî sê meseleyan destnîşan dike.

*'' A-Lêkolîn di derbarê berhemên hunerî û eşkerekirina sedemên agahî û ne agahî. Bi van sedeman re jî berhemên hunerî pêktê.*

*B- Lêkolîna derûnîya Nivîskaran : Ji bo eşkerekirina peywendîya di navbera helwest û rewşa jîyanîya taybetmendîyê mijarê wêjeyî. Zanîna jîyannama nivîskar ji bo fêmkirina berhemê wî. Herwisa fêmkirina derûnîya nivîskar di alîyê berhema wî de.*

*C- Lêkolîna Peywendîya di navbera wêje û yên din : Eşkerekirina bandorîya wêjeyê li ser wergir. Zanîsta rexneyî a derûnî giringîyê bi '' Berhem û jîyana nivîskar, bandorîya barê derûnîya wergir dide''* (Qadir R. X., 2009: 19 - 20) , Ji bo şîrovekirina van hersê

xalên li jor me dayî diyarkirin, di xala yekemde armanc ewe ku pêwîste agahdarîya berhemê di alîyê agahî û ne agahîya derûnîya nivîskar de. Xala duwem jî armanca wê ew ku agahdarîya jîyana nivîskar û helwestên wî be. Ji ber ku helwest û jîyana wî reng dide berhemên wî. Xala sêyem jî armanca wê ewe ku wêje bandora wê heye li ser wergir û di derûnîya wî de derdikeve holê .

Eger em qala çêbuna rexneya derûnî bikîn, û çawe derûn dikeve alîyê rexneyê de. ? *'' Derûnasî bi du rêyan tê alîyê rexnesazîyê. Di vê tezê de balkêşî bi karê nivîskar tê dayîn, ew ji bi rêya lêkolîna derûnasîyê ve tê kirin ,berhemê wan di alîyê wêjeyê di alîyê babeta rexneya derûnî de jî giringîyekî taybet hatîye dayîn. Ji ber ku wêje bersivdayîna bilindbuyîna derûnîyê ye , peywendîya berhemê bi aqil û dweonîya mirovan ve heye''* (Qeredaxî, 2001: 38), em dikarin bêjin ji kirdeyekî aqilî û mejîye. Ev jî hêza berhem çêkirinê di mirovan de pêktîne.

*''  Afirandina tiştekî pêşîde ne çêbuyî be nu be. Ev heyîn gelek tevlîheve heya niha çi tiştek di derbarê wêjeyê û zanîsta derûnasîya civakî û lêkolînên cuda li ser çêbûye. Fikrên cuda li ser afirandinê heye ''* (Qadir R. X., 2009: 20)،di virde heyîna afirandinê girîngîyekî zêde bi hêza nivîskar dide da ku berhema wî serkeftîbe. Tiştekî ciwan pêşkêş bike.

Her ji ber vê jî di rexneya derûnî de rexnegir tê. *'' Li benda reftarê derûnîya xwedîyê mijarê ye. Di vî alî de pêwîste lêkolîn li ser kesayeta nivîskar bêkirin, pêşîya ku mijar bê lêhevdan ''*(Kerîm, 2013: 43) rexnegir dixwaze bi ciwanî temaşeyî mijarê bike. Ji ber vê jî berhema xwe bi serkeftî bi nivîsîne.

Rexnegir dema ku bi xwaze bi başî berhema kesekê şîrove bike pêwîste heya demekî gelek derûnîya helbestvan yan jî hunermend agahdar be. Wekî : *'' Hinek ji rexnegirina di rexneya wêjeyê de pişt bi xasyet û bingeha derûnasîyê ve girê dide. Rexnegir dixwaze barê derûnîya helbestvan a veşartî diyar bike. Hêza danîna pêkhateya zewqê di nirxîne. Hêza soz Û xeyalê diyar dike. Di wan barê derûnîyê de bêxin ber lêpirsînê, bi vî awayî rêya cûrê hizir û binyada zewqa helbestvan nîşan bike ''* (Husên, 2010:  25) , wek me destnîşan jî kir ew kesê karê rexneya derûnîyê dike, pêwîste bi başî ji derûnî û hizrê nivîskar fêm bike. Piştre dikare rexne bike, alîyê baş û xirap ê berhemê diyar bike. Eger wisan be ew rexnegir kesekî serkeftîye di alîyê rexneya derûnîyê de.

Di alîyek din de erkê rexnegirê derûnî ewe ku şarezabe di berhemek a helbestvanekê de û baş ji derûnîya wî fêm bike, weke tê dîtin *" Di helbesta helbestvanekê de dikare soz û fikarên wî diyar bike. Bizane ka wî di fikar û îlhama xwede çi kar kirîye ? Gelek demean dikare berjeng û alîyê derûnîya xwe û hevçerxan bi ser de diyar bike. Bi taybet helbestên her helbestvanekî bi nav û deng xasyet û taybetmendîyên xwe hene. Yan jî bi awayek din bi derûnasîya wî tê nivîsandin. Bi heman şêwe rexne jî û lêkolînvanek di alîyê derûnîya wî de lêkolîn dike. Bi derûnasîyê nirxandinê wî derdixe holê. Her ji ber vê xalê jî rexneya derûnasî ji hemu beşêndin û rexneyên cûr bi cûr giringtir tê zanîn "*(Husên, 2010: 26 - 27) , Ji ber vê jî rexnegir pêwîste ji soz û helwesta helbestvan fêm bike. Di heman demê de lêkolînek hur di derbarê derûnîya wan de kirîbe. Sedemê vê jî ewe ku rexneya derûnî cîyawaze ji rexneyên din ên wekî rexneyên dîrokî, sîyasî û civakî ji hemuyan jî girîngîya wê zêdetire. Ji ber ku ew berhema ku helbestvan yan jî nivîskar dinivîse bi derûnîya xwe dinivîse. Lê belê cûrên wê li gorî rewşê dinivîse.

*" Ew a ku em fêmdikin tenê tam girtine ji mijarên wêjeyî. Lê belê hemu ew mijarên ku derûn pê di sekine ne şertekû ciwan be. Ji ber ku ciwanîya mijarê bi wê diyar dibe. Yan jî ka çiqas ew babetên hunerî yan jî wêjeyî kar dikin ser aqil û wijdan "* (Hemed U. U., 2015: 66) , Ji ber vê jî emê di vir de ciwanîya mijarê destnîşan bikin ka heya kijan demî ciwanîya mijarê dikeve ber derûnîya rexneyî. Erê wê wekî berhemekî ciwan yan jî xirap be. Ji ber vê jî dikeve ber rexneya derûnî.

*" Ev tişt jî bibe ku cûrek yê berhemê bi vî awayî hebe taybetmendîyên ciwan hêsanî û serbixwe be. Ev kar jî ji cûrên din ê nivîsînê cuda dike. ( Ciwannasî ) beşek yê felsefêye ji wezna ciwan û ciwan derdikeve. Berxwe dide ji bo ciwanîyek bi berhema wêjeyê ava bike "* (Birêslêr, 2007: 37 ) , ev jî vê radigihîne ku tamê ji berhemên ciwan werbigire û li gorî derûnîya kesî nirxandin di berhema wî de bike û bibe ber rexneya derûnî. Ji ber vê jî *" Zanîstvanên wekî Eflaton û Arîsto li gorî wan çavkanîya ciwanîyê rêya nava mijara hunerîyê ye . Wekî mîrat di gehe wan "*(Birêslêr, 2007: 37 - 38) .

Di derbarê ciwanînasî de di pirtukên wêjeyî de derîyek ji bo rexneya wêjeyî a nu ya kurdî vedike. Bi vî awayî destnîşan dike *" Westan û hestê mirovan beramberî wê hemahengîyê ciwannasî jê dikeve. Her ev biryardayîne jî pirensîbê tam ji dîtîna hunera ciwanîyê û çavkanîyên rexneyî, hevsengîya hunerî û wêjeyî diyar dike. Bi vî awayî jî helbest û nivîskar her wekî hunerekî din diyar deyekî derûnîne "*(Husên, 2010:

26) , Ji ber vê jî pêwîste nivîskar di berhemên xwe de babeta ciwannasîyê bida ku berhemên wan berhemên tam bexşînê bin. Tamê bi gehîne xwendekar û wergr jî sudê jê bibînin.

Belku rexneya derûnî cîyawazîya wê ji cûrên din ê rexneyê zêdetire. Ev jî ji ber raste rast li ser berhem ciwannasî û taybetmendîyên helbestan û nivîskar lêkolînan dike. Ev jî wisan dike ku giringîya rexneya derûnî ji cûrên din ê rexneyê zêdetir be.

### 1.1.5 Dîroka Serheldana Dibistana Rexneya Derûnî

Pêwîste ji bo dîrokê çend govar û kesan destnîşan bikîn ku rolê wan jî hebûye. Ew ji wekî *" Vont ; Ewî jî govarekî salane derdixist û navê wê kirîbû ( Govara Dirasata Felsefê )govarekî giringî bi destan û tezên bi bandor dida. Her çiqas li pêşîya vê dîrokê jî govarekî bi navê ( Mind ) derdiket. Ew jî ji alîyê Aleksandir Bain 1818- 1903 ve dihat derxistin. Govarekî derûnî bû, lê belê ne govarekî ji bo derbarê ceribandinê de bû. Bingeha wê li ser têbînîyên govara Vont bû "*(Şerîf, 2009: 13) , di wî demî de evan govaran rolekî berçav ê wan hebû di pêşketina rexneya derûnî de.

Pêwîste em salekê destnîşan bikîn ku bandorekî mezin li ser derûn û pêşektina dîroka rexneya derûnîyê wekî *“ Sala 1860 salekî girînge di dîroka derûnasîyê de. Belku hinek jî wekî dîroka ji dayîkbûna derûnasîyê dizanin. Di vê salê de Gostaf Fechnet 1887- 1801derketîye. Gostaf jî beşekî bi navê Sayko Fîzîk damezirand. Di vî demî de beşadîyekî berfireh û girîng di alîyê derûnasîya ceribandinê de kir "*(Şerîf, 2009: 13) .

*" Şarl Moron di sala 1948 an de rêbazekî rexneyî afirand ku bi navê rexneya derûnî ( Psycho Critique ). Pişt bi rêbaz û ceribandina Froud û dibistana wî ve girê da. Girîngî bi karên wêjeyî dida ji bo rastî peywendîya nivîskar bi mijara wêjeyî çêbike "* (Resul, 2012: 86) , di virde Şaril misogerî li ser wê dike ku ka heya çi demî rexneya derûnî bandor wê heye li ser berhemên wêjeyî û mijarên wêjeyî. Ev dibe sedemê ku bikarin berhemekî xweşik pêşkêş bikin.

Derbarê dibistana rexneya derûnî ji bo berhemên wêjeyî eve *" Dibistana Cştaltyek, Kohlr, Kofka, Edler.... " dibêje ; babetên wêjyî yan jî geran û lêkolîn, diyarkirina wan hemu hestan hemu ji ber hestên bilind tê girtin. Heya wê demê jî ciwanî û ne ciwanî jî heye. Ji ber wê jî mijar ne xweşikin, ciwanî û laşê her yekek din di jî yan dine. Li ber hev sekinîne ji bo çêkirina tiştên ciwan. Helbestên behredar, mijarên serkeftî, pexşana bi soz, muzîka bi coş û tabloya ciwan "* (Hemed U. U., 2015:

66), Ji ber wê jî em dikarin di rêya rexne girtinê de berhemên wan xweşik bikin û durbe ji neşirînî û bê tamîye. Ji ber ku da xelk wekî berhemekî serkeftî da bîne.

Di vir de pêwîste em qala dibistana şîrovekirina Froud bikin. Dema ku em tiştek ji bîr dikin çaweye û çawe emê xwe jê rizgar bikin ji wê rewşê ,*" Bersiva dibistana şîrovekirina Froud bi vî awayîye. Ji ber wê jî em dixwazin xwe ji bîr bikin ji ber ku wê bibe sedemê êşan bêyî ku em pê bi hesin. Ev li alîyêkê li alîyê din jî pêwîste em nişanê bidin ser hejmara zêde a ser bîro bawerîya mirov ku dikare di jimareyê de neyê "* (Cebarî, 2000: 20) , ev jî ji bo ku em ji bîr nekin pêwîste bi temamî em hest bi tiştan bikin û li gel  bawerîya xwe bi guncînin. Ji ber vê jî pirtukxana Froud misogerîyê li ser bawerîya mirov dike.

Li piştî van jî em dibînin pirtûkxaneyên din jî hebun. Ew jî pitukxana Can Pîyace  *" Ev pirtukxane giringÎyê bi pirojeya aqil dide. Wekî agahdarîya me ji bo derdor hatina hizrê me. Çawe bazarê li gel zanyarîyan dikîn. "* (Ezîz, 2012: 34) ,giringîya vê pirtûkxanê di vê tiştê de derdikeve ku ka em heya kengê di rêya aqilde biryara tiştên dewruber didîn. Ji ber vê jî *" li gorî Pîyace eger mirov aqilê xwe çalak bike wê demê dikare biryarê bide. Hêza hizirînê bibe astekî bilind "* (Ezîz, 2012: 34) ,wekî ku me dayî destnîşankirin pirtûkxana Pîyace misogerîyê li ser alîyê hest, soz û hizrê mirov dike.

Bivê re pirtûkxaneya rexneya derûnîyê herî zêde misogerîyê li ser alîyê hizir û hestê mirovan dike. Ka heya çi demî dikare li ser hest û hizrê xwe hakîm be. Ji ber ku hest û sozê mirovan di jîyanê de rolekî berçav dibîne. Di biryardayînê de beramberî jîyanê û alîyên jîyana wan.

### 1.1.6 Asta Derûnîya Mirovan

Ji bo diyarkarina asta derûnîya mirovan emê sê astên derûnîya mirovan bidîn destnîşan kirin.

Ew ji evên li jêrin. ( Agahî, Ne agahî, Pêşîya Agahîyê )

A- Agahî : Astekî ya derûnîya mirovane. Ew tiştaku mirov têxe di nava malika agahîyê de, bi  temamî biryara xwe daye ku ew tişt wê çêbibe û pêwîste çêbibe.

B- Ne Agahî : Ew ji astekî ya derûnîya mirovane. Ew tişta ji destê mirov dikeve bê agahîya mirove. Ew tişta di mejîyê mirovde ji bo encam dayînê ye. Hê maye ku biçe malika agahîyê de belku hinek caran jÎ rastî vê xeletîyê bibe. Hêj zu di malika agahîya xwede biryara encam dayînê bide.

C- Pêşîya Agahîyê : Ji asta derûnîya mirovan pêktê. Bi wêre ku dixwaze karekî encam bide dimalika pêşîya agahîyê de. Ji bo encamdanê jî hewil dide bîne malika ahagîyê ne ya bê agahîyê. Ev jî ji bo wêye ku rastî xeletî û lêpirsînê neyê.

### 1.1.7 Beşa Derûnîya Şîrovekirina Kesayetî

Ji bo diyarkirina beşê derûnîyê mirov pêwîste sê alîyan destnîşan bike. Ew jî (Ew, Min, Mina Bilind),ev mijare ji alî Froud di tewera duwem me behs dikin .

Ewa di virde armanca meye, ev her du babet beşê serekî yê mirovan pêk tîne. Bandorê li ser jîyana dewruber û wan dike.

## 1.2 Kesayetî Li Cem Pêşengên Dibistana Rexneyê Derûnîyê

Di vir de pêwîste em bidîn destnîşankirin ku di pirtûkxaneya rexneya derûnîyê de gelek zanayên derûnîyê hene. Evan jî qala kesan kirîye. Her yek ji wan di alîyê xwede bi awayekî ciwan hewildayîne qala derûnîya kesan bike. Ji ber vê jî em di vir de baş dizanîn di destpêkê de qala Sîgmond Froud bikîn. Gelek zana wan wekî pêşengê derûnîyê dibînin. Di heman demê de yên ku destpêkê jî qala mijara derûnîya kesan jî kirîne. Gelek alîyên din jî di alîyê derûnîyê de girîngî bi Sîgmond Froud dayîne.

### 1.2.1 Sîgmond Froud [5]

Li gorî Froud derûnîya mirovan dabeşî bi ser sê beşan de dibe. Her beşek ji wan li gorî pêwîst girîngî pê daye.

#### 1.2.1.1 Ew (Id)

*Froud di derbarê (Ew) bi wî awayê dibêje'' Çavkanîya wê a serekî zaroke. di dayîbûnê de serî hildide. Gelek zanayên Fîsyolojî dayîne diyarkirin ku Zarok di temenê sê heyvî de daynamîka Ew destbi kar dike eger wisan be ( Ew ) sê beşên serekî ê kesayetî digire. Di cîhana rast a xwe de hewldide bi gehe tamê û ji êşan dur bikeve. Alîyê veşartî ne derketîye, kesayetî ew tiştin ku heya niha hatîne zanîn di rêya xwin û*

---

[5] Froud **:** *''Di 6- 5 1856 an de li ( Vrbrg ) a bajarê Morafya ji dayîk bûye. Di temenê 4 salî de berbi Vîyana kiçkirîye, her li wir jî xwendina xwe kirîye bi taybetî jî xwendina zanîsta mirovatîyê kirîye. Pirtûka pîroz jî bandorîyekî mezin li ser wî kirîbû. Min xwest jîyana xwe ji bo karubarê civakî karbikim. Rêbaza Darwîn gelek bala min kêşand wekî mizgînîyekê bu di gerdonê de ''* (Salih, 2002: 14).

*nîşanên damarî derketîne. Ew kesên gelek demê xwe bi xwenên zindî bibe ser kesekî din ( Ew, Nizme Min ) desthelata xwe bi ser wî de spandÎye. Ji ber ku ew na hizire "*(Hemed U. U., 2015: 46) ,belku ew gelek caran bi gehije armanca xwe. Ji ber ku di rêya xwin û xwyalê xwe ve hewil dide gelek tiştê di jÎyana xwe de bi destve bîne û belku dijî ( Nizme Nin ) be. Ji ber ku (Ew ) gelek caran na hizire belku di xwaze di demek nêzîk de bi gehije armanca xwe û dur be ji ( Min ).

Eger wisan be beşekî girîng yê mirovan li gel destpêkirina jîyanê wan buye *" Dema ku mirov ji dayîk dibe her bi tenê ji dayî dibe di dirêjîya jîyana xwede jî her bi tenê ji dayîk dibe, Ev jî dibe kevirê kesayetîya mirov û heyînekî derûnîye , ev jî bi kartîne ji bo têrkirina herdûyan ,beşê ( Mirin û Jîyan ) Froud vî beşî ji hemuyan girîngtir dibîne"*(Qereçetanî, Saykolojiyay Giştî, 2007:  303) , eger wisan be Froud di vir de îspat dike ku (Ew ) beşê herî girîng ê kesayetîyê ye. Belku gelek ji mirovan bikarin wekî beşê serekî yê jîyana xwe danin. (Ew ) wekî pêwîstîyek a jîyana xwe dibînin û pê têr dike.

Ji ber vê jî (Ew ) ji bo bidestxistina armanca jîyana xwe gelek caran guh nade civakê. Ew ji bi navê gehiştina armanca bepê mebdeî ( Tam  ) dure ji zagonên mantiqî. Wekî mirovan kar dike qet tiştek di derbarê reftar û rewşa civakê de nizane. guh nade kesî, her çiqas xwestekên xwe nabe cih jî mirov nikare têr bike. Xwe bi ser kargeha (Ew ) de di heşînin. Di wir de di demê taybet *de ( xwe dîtin, serxweş, nexweş, Ziman lalkirin, ji bîrkirin û tişt windakirin ) Hemu êrîş dikin ser baregeha ( Min ) û rastî êş û ser êşanê dibe. Armanca serkêşîya wan tenê xwestekên ajalî yê ne di cihdeye "* (Qereçetanî, Derwazey Derûnzanî, 1996: 28) , Ji ber wê jî di vê rewşê de belku reftarê wî wekî ê ajalekî be, guh nede çi tiştên civakê. Ew jî ji bo têrkirina heskirin û xwestekên xwe ê ne dicih dene. Ev jî gelek caran wisan dike ku li dijî (Min ) di sekine.

Di *" ( Ew ) de dijyek, nakokî û antî tezan di nav hevde bi aşitî berdewam dibin. Bêyî ku di nav hevde peywendîyên dijyekî çêbikin. Lê belê di (Ego ) de ne bivî awayîye. Her yek ji xwestekan awazekî di jenin û awazên din xilas dike. "* (Firoyid S. , 2015: 197) , Ji ber wê jî (Ew ) hewil dide di destpêkê de tiştên xwe û xwestekên xwe bi aramî li pey hev bi guncîne, di dema têrkirina xwestekan de rastî pirsgirêkan neyê. Lê belê (Min ) di xwaze piştî têrkirina xwestekên xwe dixwaze her tiştek azad bibe û cuda têr bibe.

Ji ber wêjî dibe ku (Ew hêzekî baş bi mirovan bi bexşîne*“ (Ew, Id ) çavkanîya hêza remekîye ( lîbdu ) û xwezayîye bi temamî nefsîye ( Pirensîbê Tam ). Kontrolê li ser dike û firmanê diditê. Hêlîn desthilatekî ber fireh heye di nava cîhana id de. Ji ber wê jî id pêktê ji têrkirina heskirina û xwestekan. Xwe dayîna paş ji êş exlaq û rastîyên civakî ”* (Nadir, 1999: 240) , *wate* Id ( Hêlîne ) di xwaze gelek tiştên xwe bi destbixe. Li benda reftar û alîyên girîng têrkirina heskirin û xwestekên xwe di mîne.

### 1.2.1.2 Ez , Min (Ego)

Di vir de Froud dibêje:(Min) *"Wekî çavkanîya hemu heskirin û xwestekên mirovan tê danîn. Li ser bingeha ( têrkirina xwestek û heskirinê diçe. Hêzekî derûnî bi kartîne ji bo têrkirina herdu remeka ( Mirin û Jîyan ) "*(Ezîz, 2012: 190)mînak ; Zarok ew tiştaku hîs pê dike wê demê dixwaze bi cihbîne û xwestekên wî têr bike.

Min *" Xwe di hiş û hişmendîyê de vedişêre. Ev alîyê keyasyetîyê hêdî hêdî li gel zarokan û jîyana dewruber peyda dibe. Zarok bi hestên xwe hinek tiştan fêr dibe, zîyanê dide wî jî ber wê jê dur dikeve. Herwisa fêr dibe ku hinek tişt binçîneyan bi desttîne û dubare dike. Gelek tiştan jî bi destura sezayê reftaran fêrdibe "* (Îbrahîm, Girîngtirîn Tiyorekanî Kesayetî, 2000: 232) ,tê bi vê wayê ku zarok di destpêka jîyana xwe de tiştên wisa di hişê wan de heye ku di hizire û dixwaze zu wan tiştan bidest bixîne, bi gehe armanca xwe. Dixwaze xwe dur bixe ji sezayan hewil dide ji bo bi destxistina padaşta.

*" Min (Ego) Alîyê reftar ji kesan digire û li ser agahîyê ye ,dikare hest bi pêkhateyên xwe bike. Hewil dide ji sinorê mejî dernekeve.Hewildane li ser bingeha xwezayî. Cîhana rast biryar li ser daye û dernakeve. Ji ber ku pêwîstî bi cîhana ji derve a raste ev jî hewla bi cihkirina heskirinên wî dide. Bi vî awayî ku guncane di demê nivistinê de hebûna wê nîne (Ez) derûnê di parêze "* (Qadir R. X., 2009: 21) , Ji ber wê jî mirov hewil dide di xwezaya xwe de bimîne û hesdike ku zu bicih bîne û sudê jê werbigire. Min li cem mirovan ewe ku derûnîya xwe pê bi parêze , dur be ji hemu xeletîyan û karê xwe pê encam bide.

Wan tiştan dixwaze hest bike ku bi wan *(Ew ) sê beşên kesayetîyê digire. Di cîhana heqîqeta xwede hewildide bi gehe tam û ji êşan dur bikeve. Alîyê veşartî bêjerê hestîye "* (Hemed U. U., 2015: 47) ,mirov hewildide ji tiştên ji derveyî jîyanê dur bikeve û pişt bi tiştên veşartî ve girê bide.

Dikarîn destnîşan bikîn ku ( Min ) beşê herî serekî ê mirove. Di xxwaze bi hêza xwe gozariştê li tiştên jîyanê bike. *" Beşê Min pênaseya di nava beramber û dewruberde memela rojane, guncana derûnî, hevsengîya civakî ji bo peydakirina cihên civakî, serkeftin, Ruxîna beramber, pirojeya jîyan, bidestxistina paşerojê "* (Hemed A. U., Rehendekanî Kesayetî Le Nêwan Firoyid û Eniştayîn, 1999: 246) , mirov dikare di vir de hevsengîya derûnîya xwe bi destbixe di rêya ( Min ) de. Tê wê wateyê ku di jîyanê de hewil dide tiştan bi destbixe. Bi gehe wê armancê ku di paşerjê de heye û bibe kesekî serkeftî.

Em dikarin bêjin ( Min ) hêza duweme. *" ( Mgo ) xwezayekî a hêvîya ( hest û nestê ) heye. Erkê wê ê serekî kontirolkirin û rêxistina xerîzeyên nestîne. Ji (Id ) çavkanîyê digirin cih guncav ji bo têrkirinê diyar dike "* (Nadir, 1999: 240 - 241) , Ji ber wê jî (Min ) hewildide ya ku dş ( Ew ) de heye bîne û dur bixe ji hemu xeletîyan.

( Min ) dixwaze xwe ji metirsîyan dur bixe. Ji ber wê jî xwe pê dihesîne.*" Xwe di parêze, dubere hewil dide xwe durbixe ji metirsîyan û hes û xwestkên vekirîne ji bo nest. Daku ji êrîşên ( Minî Bilind ) û alÎyek din jî ji metirsîyên edetên civakî rizgar bike "*(Qereçetanî, Hendêk Nexoşî û Giriftî Derûnî û Komelayetî, 2010: 35) , di vir de jî beramberî du alîyan bê ji bo xwe jî minî bilind rizgar bike.

### 1.2.1.3 Mina Bilind (Super Ego)

Di çavkanîyên landika mirovatîya Froud de, destnîşan dike ku Min Bilind,( Xuyekî Bilind ) ( Super Ego ) dibe du beş ew jî evên li jêrin.

*"A-Xuyekî bi Mînak ( Ego Edeal )* **:** *Ji wan fikran pêktê ku bav bi başî danîye ku bêçî bimêje. Bav bi pîvan û nirxên pakê rast rê vedike û bi wan nirx û pîvana di gehîne zarokan.*

*B- Wijdan* **:** *Ji hizrê zarokan pêktê , ser bi wan fikrane ku bav bi çepelî û bê aborî çêdike. Ev di encama sizadanê de danîye ( Sezadayîn ser bi zarokê xwe )"*(Ehmed H. U., 1977: 5 - 6) ,em dikarin ji bo her du beşan mînakan bînin. Ji bo ya yekem dema ku zarok li ser başîyê tê terbîyekirin. Ew başî ji di jîyana zarok de dibe wekî sembol. Ya duwem jî dema zarok li ser xirabîyê tê sezakirin, wê demê seza di jîyana wî de dibe karekî ne pesend.

*"Min ê Bilind li ser bingeha reftarê bilind diçe. geranê di wan hemu bihayê civakê de dike. Ji zarokatî ve fêr dibin û dibin beşek ji reftarên me "*(Ezîz, 2012: 191)

, ew zarokê ku di destpêkê de fêrî paqijîyê bûye, heya mezin ji dibe wisan dizaneku ew gelek başe li beramberî paqijîyê. Ji ber wê her dixwaze paqij be.

Ji ber wê jî di Mina Bilind de misogerî li ser hizir û karê mirovan tê kirin. Berhev tê kirin ku *" Mirov ji zindîyên din bilindtire. Ji ber ku bi gelek bihayên pîroz di nav sing de tê kolandin. Pêwîstîya wan bi rêxistina derve nine. Reftar rêk dixe ji ber wê jî di mercên pêwîst ê perwerdeya baş de ewe ku mirovek berhem bîne. Reftarê xwe zeft bike, her ev huye ( Froud ) destnîşan dike ku minî bilind mînaka wijdanîye "* (Îbrahîm, Girîngtirîn Tiyorekanî Kesayetî, 2000: 232) , Ji ber wê jî mirov di Mina Bilind de vî karî dike di hindirde baş hizir kirîye û dixwaze serkeftîbe û ji pirsgirêkên civakî dur bikeve.

Eger wisan be zarok heya mezinji dibe çav li reftarê dayîk û bavê xwe dike. Wekî ku dibêje ; Min Bilind hêza sêyeme li cem mirovan girîngîyqa wê heye ji ber wê çav li reftarê dayîk û bav dike. Eger reftarê dayî û bav baş be wê demê wê mirovekî reftar baş jî derbikeve. Eger çavlêkirina wan bi xirabîbe wê demê wê kesayetekî şer xwaz jê derkeve*"Nunerê wijdanî mirove ji bihayên bilind yê edetên civakî pêktê. Zarok ji dayîk û bavê xwe xeletîyan digire û fêr dibe. Super Ego di alîyê navê de sansorê têxe ser reftarê zarokan. Çavdêrîya wê dike, rexneyê lê dike, firmanê diditê û sezayê jî diditê "* (Nadir, 1999: 241) , armanca sezayê di vir de ewe ku eger xeletî kir di dema çavlêkirina dayî û bav edetên civakî de wê demê wê rastî sezayê hişk were. Wê demê neçar dimîneku hêzê bêxe ser hindirê xwe daku rastî çi xeletîyan neyê.

Min bilind wekî rêxistinekê ye. *" Wekî rêxistinekî a reftarê kesayetîye berbi pêşketinên mînak û rastîyan ve diçe. Hukmekî xedar bi serde da ( Xelete yan jî raste ) Ev hukme jî ji rastîya rewşenbîrî ya ku kesayetî tê de dijî hatîye girtin. Ew ji bi rêbazekî rast "*(Şerîf, 2009: 79),armanca rêbaza rast ewe ku key yan jî ew rastî xeletîyên berçav neyê. Berdewam bizane ku di astekî rewşenbîrî bilind deye.

Ji ber wêjî minî bilind wisan dibe ku beramber her du ( Ew û Min ) bêt Mina Bilind di alîyekê de dijî diyardeya ( Ew ) derketîye. Di alîyek din dejî dixwaze pîvanên exlaqî bêxe di cihê pîvanên mantiqî ê ( Min ) de. Bi awayek din *" Temam xwazan û pir xwazan zextê dikin ser rastîyê de "* (Şamlo, 2010: 44) , di vir de li dijî (Ew ) di sekine. Ji ber kubi xwe dixwaze bi alîkarîya (Ew) tiştên xwe bi dest bixe. Ji bo wê jî xwe têxe di pişt (Min) de û pişta wî digire da ku rastî çi xeletî û pirsgirêkan neyê ,da ku di hemu alîyên jîyana xwede serkeftî be.

*"Mina Bilind, biryardera yekem li ser başî, xirabî û çalekîya (Min ). Ew ji li gorî edet û pîvanên civakî a min bilind hewil dide xwesteka (Ew) bi taybet ewên ku sîmayê seksê û dijminkarîyê heye. Mina Bilind cîhana ji derve û ya hindir li ser nubun xwestek û hêîyên bi mînak rijandîye ku wekî tê xwestin. Min a bilind wekî ( Ew ) e. Ji ber ku mantiq nîne , di(Min )de wekî yeke"* (Qereçetanî, Saykolojiyay Giştî, 2007: 308) , Ji ber wê jî min a bilind dixwaze karê baş bike. Ne wekî (Ew) be. Heya demekî gelek jî dixwaze xwe nêzîkî (Min) bike. Ji ber ku gelek dixwaze di reftar û karde wekî (Min ) be. Rastî xeletîyan neyê û li cem karên baş piştgirîyê werbigire û berdewam be di karên baş de.

### 1.2.2 Karl Gostaf Young[6]

Xwendevanê Froud bû, heya demekî gelek li gel Froud nava wan baş bû. Lê belê dema ku Froud rêbazek taybet a xwe afirand piştî demekê di navbera wan de bu sedemê nexweşîyan. Ev ê jî wisan kir ku Yong jî rêbazek taybet a xwe bi afirîne.*"Rexneyên derûnî fikrên Froud rizgar kirin. Ji ber ku li gorî wan ev fikre kesên nivîskar û hunermend jî vedike.Ne berhemên wan . Ji ber wê jî li cem ne agahîya kes ku froud afirandîye girîngî pê daye Ew ne agahîye gelekî afirand"* (Qadir R. X., 2009: 23) , Ji ber wê jî em dibînin ku rêbaza Yong jî her ku diçu giringîya wê zêdetir dibu di derbarê derûnnasîyê de.

Eger bê em qala kesayetî bikîn ka Yong çiqas girîngî pê daye. *" Yong jî wisan diçe kesayetîyên wekî defro berhema wî wekî dîroka pêşîyan tê debe . Mirovên nu jî bi nasandina kesên nu û yên burî bi vî awayîyê niha darêjandîye. Dikare rêyek wisan dur biçin ku nediyare bingeha mirov wekî cûrekî serbixwe biçe. "* (Îbrahîm, Girîngtirîn Tiyorekanî Kesayetî Tiyorî Şîkaryetî , 2000: 219) , sedemê ku Yong girîngîyê bi kesan bide bi vî awayî bu. Ji ber ku hemu tiştek pêwîste li cem mirov çêbibe û dibin heyîna

---

[6] Karl Gostaf Young ***:"****Di 26 temoza sala 1875 an de li gundek biçuk ê Siwîsre ( Kêsîoîl ) ji dayîk bûye,navê bavê wî Pol Young bu û navê dayîka wî jî Imaîl Pêrsuêrk bû,malbata wan di astekî bilind a rewşenbîrîyê de bû. Bi taybet jî rewşenbîrîya ayînî. Hejmarek ayînzan û Endezyar di nav wan de derketîbûn. Bavê wî kesekÎ prostatekî naskirî bu di navçeya wan de.Girîngiyek taybet bi Fîlolojîyê daye û di alîyê wê de pisporekî baş bu, Young di temenê xwe ê şeş salî de fêrî zimanê latînî buye di heman demê de giringîyekî zêde bi ziman û wêjeyê daye,dikare zimanê sansikirîtî û zamanê ayîna hindî bixwîne.di temenekî zude giringî bi tekstên felsefê daye gelek zu felsefe xwendîye"*(Young, 2005: 7).

wî debe. Ji ber vê jî Yong bi vî awayî piştî Froud girîngi bi kesayetî daye. Bi taybetî reng daye alîyê derûnnasîya mirovan.

Ji ber wê jî em dibîn Yong hêz xistîye ser mirovan. Li gorî wî *" Mirov armanc û afrandinê xwe pêşkêş dike wekî bandorîyan "* (Yong, 2005: 33) , di vir de armanca Yong jî ew e ku mirov di jîyan xwe de gelek armanc û xwestekên wan hene, gelek dixwazin bi dest bixin, gelek dixwazin tiştên ne baş di jîyana xwe de bidin alîyekê, dema ku pêwîstîyên xwe bi dest xistin wê demê ji bo bandorîyê jî hewildanê çêdikin.

Yong di rêbaza xwede derûnîya mirovan dabeşî bi ser çend beşan de kirîye.

### 1.2.2.1 Min (Agahî)

Young *" Ev pêkhateye berhev dike bi (Min ) a Froud. Lê belê cîyawazîya ( Mina Hestî ) bi temamî hestîye, lê belê (Min ) a li cem Froud hem hestîye û hemjî nefsîye "*(Ezîz, 2012: 191) , eger wisan be armanca vê (Min ) li gorî Yong li cem mirovan bi temamî hestîye. Dema ku tiştek di malika hestê mirovan de û bi xwaze encam bide, wê demê bi temamî amadeye. Lê belê (Min) a froud hindek caran dikeve hestan bi temamî amadeye û hinek caran jî di keve malika nefsê wate zêdetir pêwîstî bi hizirînê heye ku ji bo encamdana karî.

Ji ber wê jî herî zêde qalkirina (Min ) a Yong, tê dîtin ku min *" ji wijdana agahî pêktê. Wekî çend pêkhateyên xwe bi agahîyê wekî ( Pey birin ) Agahî ji bîranîn, hizran û hestan pêkhatîye "* (Şamlo, 2010: 66),destpêka min ji agahîya mirovan pêktê. Dema ku karekî bike di malika agahîyê de biryarê dide. Ev jî bi birin û bîranîna hizrê mirovan dibe ji bo encamdayîna kar.

*" Awazê Agahî ji pêzanînên bîranîn, hiz û wijdanî pêktê. Yong ; Ji bo wê jî pêwîste (Min) ber pirsbe ji hestkirinê û berdewamîya xwe. "*(Îbrahîm, Girîngtirîn Tiyorekanî Kesayetî Tiyorî Şîkaryetî , 2000: 219) , armanca Yong ewe ku di rêya hizirê xwe re hest bi tiştan bike . Zu ji hestên kesê beramber fêmbike û bizane çi dixwaze daxwaza çi dike.

### 1.2.2.2 Nestê Kes (Ne Agahîya Kes)

Li cem Yonug *"Ev pêkhateye berhev têkirin Pêşîya nest. Li cem Froud ji pisporîya burî û pêş dîtina dahatuyê pêktê. Ji ber wê jî ji hestê mirov nabe. lê belê kesek piştî hewildanekê dikare zanyarîyan derbixîne holê. Pêş dîtin bi awayê xwenê dibîne. "*(Ezîz, 2012: 192) , dema ku mirov bi xwaze bigehe tiştekî destpêkê ji naskirina

demê burî destpê bike, gengaze ku ji hestê mirov bikeve nava nestê mirov de. Ji ber wê jî ji bo agahdarbuyîna pêş dîtina xwe dizane zu nagehe encamê ,di xwaze bi rêya xwen û xeyal ve bigehe pêşdîtina encama karê xwe.

*" Ev beşe gelek bandorê li ser xwenê mirovan dike, pirsgirêka derûnî jî di vir de çêdibe. Herwisa hemu wan bîranînên hest û sozên çespayî digire nava xwe. Ji bilî seksê jî Froud qala wê kirîye "* (Xerîb, 2011: 13) ,her weke me qalkir mirov dema bixwaze bi gehe armanca xwe di destpêkê de birêya xwen û xeyalê xwe dikare bi gehe bi wê encamê.

*" Navçeya Hevsê ya (Min ) Ji wan naskirinê burî hatî agahdarkirin pêktê. Lê belê hatîye ji bîrkirin û pişt guh hatîye xistin. Ew pisportîye jî yek car bêhêz bûye. Bi awayekî ıntîbakî agahî li cem wî kesî bi cih nehêle. Li cem Froud; Dikare bi agahîyêre bi gehe, li ber dest û şîyarîyê deye. Ji ber wê jî du rêbaza ( hatin û çûyîn ) li ber destê ne agahdarîya kes ya (Min ) deye"*(Îbrahîm, Girîngtirîn Tiyorekanî Kesayetî Tiyorî Şîkaryetî , 2000: 219) , mirov demekî tiştekî ne agahî deye. Hewil dide bikare wan tiştên xefkirî ûjibîr kirî wekî (Min) encam bide.Biwê wateyêku ew tiştên xef kirî dimejî de hebû xwe azad bike , da ku serkeftî be di armancên xwe de. Ji ber wê jî diserî de hat destnîşan kirin ku navçeya hevsê a ( Min ) daku bikare xwe nêzîkî navçeya hevsê a (Min) min bike û bi gehe armancên xwe.

#### 1.2.2.3 Ne Agahî (Civak Dest Ceme'î Gelek)

Derbarê vê de Yong dibêje; *" Em dikarin bêjin mîrasê derûnî yan jî ji bo mayîna derûnîyê "* (Yong, 2005: 14) ,yan jî di rêya ne agahîya civakê re ji bo dimîne. Ne agahîya civakê bi şêweyekê ji bab û bapîran ji demekê ji bo me hatîye.Her wekî xesleta zindîyên di rêya xwezayê re çêdibe.

Eger wisan ev cûr *" ji wan naskirina pêktê ku mirovatî tê deçûye. Demê burî piştî demekê awazê mirovan beş beş dike li gel xwe ji demekê dibe demekî din. Awaze ( Aqil ) ê bapîrê me ê kevin şêwazê hizirîna wan, hest û pê zanîna wan derbarê jîyanê û cîhana mirova di nivîne"*(Îbrahîm, Girîngtirîn Tiyorekanî Kesayetî Tiyorî Şîkaryetî , 2000: 220),mirov rolê serekî ê neagahîyê ye. Dema ku mirov fêrdibe ji demekê ji bo demekî din maye. Wisan kirîye ku bi gehe temenekî diyar û bêje. Ev jî di rêya bab û bapîran de maye .

Di vî cûrî de pêwîste em qala teyroka destpêkê bikin. Lê hur bibîn ku *" Xwe bi xwe beşekî zehemet dikare bazarê zanistî li gel bike. Hizrandin û jîrandina beş*

*karekî asan nîne. Ji ber ku peywendî bi ruh û pêkhateyên sozê ve heye. Di ramanên Yong û Yongan de teyroka destpêkê bi(Dna ) a derûnîya mirov ( Psyche) tê nivîsandin. Teyroka berîyan bişêweyekî ji şêwan çînan gehandîye mîrat û bihayê civakî û reftarê ruhî "* (Yong, 2005: 11) , tê wê wateyê ku ruh û sozê mirovan wê di xwaze ku tişt û reftar wekî yên pêşîya wan be. Wate çavlêkirina yên pêşîya xwe bikin. Ev jî buye derûnîya mirov. gelek mirov divî cûrî de hewil didin piştevanîya teyroka destpêkê dikin. Da ku serkeftî bin di karê xwede.

Bivê re jî ne agahîya civakê belku girînge li cem mirov da ku bikare gelek tiştan yan jîpêwîstîyan bê agahîya civakê bi dest bîne.Ji ber vê jî li gorî yong*" ( ne agahîya gelekî ) ji ne agahîya kesekî bi hêztire. Li gorî rêbazê ew mirov heya demekê zanyarîyên pêşîya dîrokê diparêze. Ew beşê zanyarîyên di mejî de ne agahîya gelekê ye"* (Qadir R. X., 2009: 23) ,Ji ber vê jî li gorî rêbaza yong di vî cûrî de herî zêde misogerîyê liser mayîna mirov dike. Ka ev çi di alîyê cinsî de be yan jî di alîyê dîrokî debe. Wek yek ji wan mînakane ku di çavkanîyan de daye diyarkirin. Di destpêkê de qala rêbaza Yong dike. Piştre jî qala zanîst û cinsî dike . Bi mînaka Yong û Froud dibêje: *" Destan di encama sekê û hewldanên bê agahîya di jîyana destpêkê de çêbûye û mayîne. Bêyî ku guhertin bi serde hatibe di demê nexweş de derdikeve holê.Çi li cem Froud û çi li cem Yong Zanist bi giştî mejî û heyînên civakî cûrekin ji xwesteka vekirî ya seksê a mirove. Çavdêrîya hêza ne aqilîye "* (Mehmmud, 2004: 70) , tê wê wateyê ku çi zanist be yan jî cins be her du jî girîngîyek tayber hene di jîyana mirovan de.

Eger temaşe bikîn em ê bibînin ku Yong cîyawaze li gel Froud tiştan bi hêsanî têxe ber destê mirovan. Derbarê derûnîyê de Yong dijî Froud sekinîye. Li cem wî (Min) pêwîstî bi heste lê li cem Froud hest û nest buye. Derbarê ne agahîya kesan Yong wiaha dibêje Mirov di rêya tiştên borî xwe rizgar dike Tiştên xefkirî ên jîyanê li gel mirov de nîne. Ne agahîya civakê li gorî wî mirov di rêya tiştwergirtina bab û bapîran di gehe gelek armancan. Ev jî wisan dike ku ji gazinda dur be.

### 1.2.3 Alfrêd Adler[7]

Derûnnasekî Vîyenaye xwendevanê Froud e .Gelek tişt bihevre kirîne û gelek tiştên ciwan beraberî kesayetî û derûnnasîyê kirîne. Adler ji bilî alîyê derûnnasî pisportî di alîyê zanîstî, tawansazî û dermansazî de jî hebû. Heya demekî dirêj jî peywendî li gel Froud hebu. Piştî ji Froud cuda bu di navbera salên ( 1902-1911 ) an de *"Cîyawazîyekî mezin ket di navbera Adler û Froud de. Heya gehiştin wê qunaxê ku her yekê bi xwe rêbazek a Derûnnasîyê damezirandin "* (Xerîb, 2011: 15) , Ji bo ku bi vî awayî be Adler ji bo ku cihê lingê xwe di alîyê derûnnasîyê de bi cih bike dike.Ji ber vê jî rêbazek taybet a xwe damezirandîye.

Adler di rêbaza xwe de herî zêde girîngî bi kes daye piştre jî bi vî awayî *"Adler misogerîyê li ser alîyê giştî ji bo kes dike. Peyva kit destnîşan dike ku misogerîyê li ser cîyawazîya her kesekî ji kesekî din. Nikare dabeşkirina kesê kit belku pêwîst dike wekî kesekî giştî temaşeyî her kesekî bike"*(Nûser, 2008: 111), Ji ber wê jî Adler herî zêde girîngîyê bi kes dide. Armanca wî ew bu ku bi awayekî berfireh qala kes bike. Armanca serekî ya wî ewe ku cîyawazîyê di navbera kesan de nehêle û bi yek çavî temaşeyî hemuyan bike.

Herî zêde diderbarê kes de dibêje*: " Hemu kesên civakê dema ku întîma ji bo civakê dike di xwaze di rêya kesên dinde pêwîstîyan têr bike. Cihê rêber dagir bike û ruhê karîzma ferz bike. Ji ber ku di binçînê de kes pêwîstî bi aramî û razîkirina civakê heye. Ji bo vê armancê jî rêya dijyekî û dagirkirinê bi kartîne ,diyarkirina hêza veşartî a kese "*(Hemed A. U., Zanay derûnzanî Alfrêd Adler, 1998: 181) hemu kesek di xwaze di rêya hêz, hest û hizrê xwe ve bi gehe tiştan. Ev jî ewe ku ew kese heyîyan xwe bi selmîne .

Di vî alîde Adler ji bokesan bi vîawayî bû . Ji ber ku xwe di derbarê kesayetîyê de têxe ru :

---

[7] Adler (1870- 1937 *):" 7 Şubata sala 1870 hatîye dinê.Di navbera 6 zarokan zarokê duwem bu. Li dewruberê vîyena pêşketîye û mezin bûye. Bavê Adler jî wekî bavê Froud bazirgan bû. Lê belê ew serkeftî bû. Froud li taxa Fileyan dîjîya Zêdetir alîgirê yahudîyan bû. Adler jibilî çend zarokên yahudî kesekî din nasnedikir. Ew ji wisan bi Adler kir ku ferheng û rewşenbîrîya vîyana bi bandortir be. Di serîde ferhenga Yahudî "* (Ehmed R. , 1999: 243) .

### 1.2.3.1 Hiskirin Bi Kêmî

Li gorî Adler*" Di derûnnasîyê û di zimanê îngîlîzî de xwe kêm zanîn yek ji wan diyarkirinane ku rojane bi kar tê.... Adler wekî afrênerê vê tezê tê danîn. Li gorî wî hîskirin bi kêmî di hemu mirovan de diyar dibe. Hêzekî bi bandore jî li ser reftarê mirov... Adler dibêje : Ji bo ku em hîs bikîn ku em mirovin dixwe de pêwîste hîs bi kêmîyê bikin "* (Ehmed R. , 1999: 243) ,di vir de ji bo hîn zêdetir şîrovekirina armanca Adler, dibêje; Mirov pêwîste di jîyanê de hest bi kêmîya xwe bike, Berdewam wisan bizane ku ne mirovekî tame.Dikare hêzê bişkîne li ser hemu jîyana xwe. Ev jî ji bo wêye ku heyîna xwe bi selmêne û bikare bi serkeftî be di hemu alîyên jîyanê de.

Herî zêde ji bo qalkirian hestkirina bi kêmî , li gorî *" Adler girêya hest kirinê bi kêmî, xwe bikêm zanîne. Bandorîya nefsê bi ser kes de zal dike pişt bi heyîna wî kesîve girê dide. Ji bo ku xwe jikêm hîskirinê derbaz bike. Adler ew hestên bihêz ji kesan şikbare biarmanca ku xwe jê rizgar bike. Eger hestê xwe bi kêmî zanî nikare kontrol bike. Kes rastî demar girtinê tê "*(Resul, 2012: 53 - 54) ,ev armanca Adler pêwîste her kes hestên xwe bi kêmî bizane û hêza wê hebe ku xwe xilas bike ji destê wan nerênîyan.Hestê xwe bi kêm zanîn li cem çêbibe. Ji bo vê jî divê xwe rizgar bike ji kêmasîyên jîyanê.

### 1.2.3.2 Şerangêz

Li gorî fikrê Adler *" Şerangêz rik rabuna mirov beramber şikestinê di têrkirina hes û xwestekên xwede. Dema ku kesek nikare şerangêzî pêşkêşî babetê bike rikê bunê dike. Piştê dide derkirina rikê di pirsgirêkên xwe yan jî kesekî din "*(Ezîz, 2012: 195) ,di vir de armanca wê ewe ku dema nikare xwestekên xwe têr bike, wisan dike ku rastî rik û kînê were. Ev jî wisan dike ku aciz bibe û rastî şerangêzê were. Di vî şêweyî de em dibînin ku rik û kînê derdixe da ku rastî şerangîzîyê neyê.

### 1.2.3.3 Şêwazê Jiyanê

Dema ku mirov berê xwe dide cihekê şêwazê jîyana *" Her kesek pêwîste bixwe bi temamê temenê xwe bi modêlî û reftarî piştre têcihkirin. Her yek ji van cûran hev demin li gel hestan. Cewherê jîyana her kesî diyar dike. Li gel vê jî armanca hemu mirovan ewe ku bi gehe vê armancê "* (Şamlo, 2010: 138) , reftar û hest wisan dike ku şêwazê jîyana kesan bi taybet diyar bike xwe rihet bike di şêwazê jîyanê de.

Dikare reftar û şêwzê jîyana xêzan û civakê sedemeke ji bo mezinbûna kesekî.Bi vê re *" Siroşt û şêwazê jîyanê pişt bi peywendîya di navbera zarok,dayîk û bav ve girêdide "* (Ehmed R. , 1999: 247) ,eger em mînakek li serşêwazê jîyanê bînîn, dibînin ku keçek hîs dike ku ne hatîye hesibandin ji alîyê dayîk û bavê xwe ve ev jî acîxîya wê zêdetir dike.Wisan dike ku hîs bi kêmbûna xwe dike , aciz be hi zagonên civakê. Lê belê dema ku piştgirîya wê hat kirin wêdemê hîs dike ku rihete û ji jîyanê hes dike.

Li gorî Adler cûrên jîyanê bi vî awayî diyar dibin.

*"Cûrê Yekem **:** Di pêşkêşkirina zalbuna kontirolkirina kesekî di hest de girîngî dayîna civakê re derdikeve. Ev cûrê kesan bêyî goh bide kesên din reftaran digire. Ji ber vê jî kesekî tond tîj derdikeve ( Virulent ) dibin kesekî sitemkar û êşê didin kesên din. Bi neheqî êrîşî kesên din dike.*

*Cûrê Duwem **:** Şêwazê jîyanê cûrê wergire ( The getting type ) Adler wisan datîne. Ji hemu cûran bilintire û li gorî wî : Mirov di vî cûrî de wan tiştan bi destîne ku di rêya kesên din deye. Bi yekcar pişt bi kesên din ve girêdide.*

*Cûrê Sêyem **:** Cûrê kenar girtîye ( The avoiding type) ev nave buye navê wê. Ji ber ku evcûrê mirovan biçi awayî rastî pirgrêkên jîyanê nayên. Ji hemu egerên şikestî dur dikevin.*

*Cûrê Çarem **:** Kêrhatin di alîyê civakî de. Ev cûre ji wan cûrane ku dikarin alîkarîya kesên din bike. Li gorî pêwîstîyên rojane karên xwe rêve dibin "*(Ehmed R. , 1999: 247 -248) , eger em bi xwazin qala her çar cûran bikîn û bizanîn armanca Adler di vê dabeşkirinê de çîye ? Bi vî awayî di bêjin: Di cûrê yekem de xwesteka wî ewe ku di jîyanê de her karêku dike guh nade çi kesan. Ev jî wisan dide diyarkirin ku di pêşerojê de kesekî xirap û reftar ne baş jê derbikeve. Yan jî rastî vexwarin û tiştên xirap dibin. Di derbarê armanca cûrê duwem dejî ewe ku,bi cihkirina karê rojane û berdewam hesdike. Pişt bi kesê din ve girêbide û jê tiştan wer bigire. Da ku di jîyanê de alîkarîya kesên dib bike û serkeftî be. Cûrê sêyem jî armanca wê ew ku, kesên bi vî awayî ji xwe dur digirin û dur dibin ji pirsgirêkên jîyanê. Ev jî ewe ku durbin ji pirsgirêkan û serkeftîbin di jîyanê de. Cûrê çarem jî armanca wan ewe ku çêkirina peywendîya civakî li gel kesên dewruber , ev jî da rastî pirsgirêkan neyên û serkeftîbin.

### 1.2.3.4 Pêwîstîya Hiskirinê

Hiskirin" *Li gel vêjî Adler şerangêzê wekî pîlanekî xwezayî dide jimartin ji bo ku mirov bixwe derbixe. Lê belê mirov ji bo ku kesayeta xwe derbixîne pêwîstî bi heskirinê heye* '(Ezîz, 2012: 195) , Dema ku mirov şerengîzî piştevanîyekê hebe di nava civakê de şerengîzî ji bo heskirina mirovan pêwîste. Ji bo ku hest û sozê xwe baş bike û derbixîne holê.

### 1.2.3.5 Armancdar

Her mirovek di jîyanê de ji bo her tiştekê hewil bide pêwîste armancek ya wî hebe. Ji ber vê jî Adler di vê derbarê de dibêje: *" Hemu mirovek di hewildanê de xwedîyê çend armancekê ye. Belku ji bo derxistina kesayetîya xwe û mirovekî temam jê çêbibe. Heyînekî pozîtîfî jê derdikeve. Ew jî dirêya hewildanê deye "* (Ezîz, 2012: 195) , her kesek ji me di jîyanê de ji ber sedemên jîyanê dixwazin bi gehin armanca xwe.Mirovekî temam be û bê pirsgirêk be dur be ji hemu pirsgirêkên di jîyana rojane de.

Ji ber vê jî Adler hev milê Froud û yong gavekî baş di derbarê derûnnasî û kesayetîyê de daye diyarkirin. Alîyê jîyana kes ev bixwe rêbazekî girînge di alîyê derûnnasîya dahatûya mirov .

### 1.2.4 Can Pîyace

Di rêbaza xwede herî zêde qala pêşketina jîrî kirîye. Di derbarê derûnnasîyê de jî girîngîyekî zêde hebuye. Ji ber vê jî em dibînin Pîyace di destpêkê de *" Rêketina zanîstî û akademî bi bandor bu li ser('Emanoîl Kant[8]). Pîyac girîngîyekî zêde bi destnîşankirina hêza mirovan a ji bo zanînê daye. Yan jî em bi baştir bêjin rêbaza zanayî . ( Rêbaza Epîstomolojî apistmology ). Ferbuna her tiştekî di derbarê cîhanê de zêdetir misogerî li ser pêşketina jîrî kirîye"*(Şerîf, 2009: 105-106) , Zêdetir girîngî bi zîrekîya zarokan daye. Hewil daye destekî bilind hebe di nîşakirina pêşketina zarok û jîrîyê de.

Herî zêde pîyace hewildaye pişt bi fikrên Kant ve girê bide. Ji ber vê jî em dibînin : *" Bi vî awayî fikrên Kant bun bingeh yan jî hêvênê rêbaza Pîyace bi*

---

[8] Kant **:** Fîlozofekî Elmanîye di sala 1724 an de ji dayîk buye, di sala 1804 an de koça dawî kirîye. Kant girîngîyê bi zanîsta ciwannasîyê daye destekî bilind hebu di alîyê wêjeyê de.

*pêçewana Conlok di vê bawerîyê de bu aqilê zarokan dema ji dayîk dibe ne sipîye , Belku hêzekî bi bandore û hemu wan zanyarîyan di rêya hestwerê de werdigire û têxe jêr kontrola xwe de, bi awayekî guncav û rast rêktêxe ''* (Qereçetanî, Saykolojyay Geşe, 2009: 91-92) , armanca wî di vê rêbazê de ew bu ku zarok ji dayîk dibe û dikare aqlê wî temam be.Qet kêmasîyek nebe piştî temamî zanînan. Alîyên jîyanê bi temamî bicih bike.

Can Pîyace[9] bi vî awayî qonaxên pêşketina jîrî destnîşan dike ew jî pêktên ji

### 1.2.4.1 Qonaxa Hest Tevgerîyê (Sensorio Motor Period)

*'' Ev qonaxe di dema ji dayîkbunê re destpê dike. Nêzîkî du salên yekem jîyana zarok dixwîne. Pîyac, navê vê qonaxê kirîye (Hest Tevgerî ) Ev jî ji ber wê bu ku zarok di vê qonaxê de bi pileya yekem pişt bi hîs tevgerîya endamên leş ve girê dide. Zarokê şîr vexwar bi kêmî di vê qonaxê de piştevanîya bikar anîna ziman û hêmayan dike. Ji ber ku çalekîyên vê qonaxê pêwîstîyawê bi karanîna ziman û hêmayan nîne ''* (Qereçetanî, Saykolojyay Geşe, 2009: 96) , qonaxa hestên tevgerîyê diyare armanca wê çîye ? Zarokê nu ji dayîk dibe di rêya hest û tevgerîyê hewil dide bigehepêwîstîyên ku dixwaze. Wekî daxwazkirina şîr av û pêwîstîyên wî/wê. Di temenê 2 salî de dikare bi temamî pêwîstîyên xwe bicih bîne.

*'' Her zu zarok fêrî wê tiştê dibe ya ku guh diditê ''* (W. B, 1983: 40) , bi wê wateyê her di demê ji dayîk buyî heya du salî ew ji bo wê hewil dide di rêya tevgera dest û ser badanê daku bizane xwarinê dixwaze û ji bo wî çêbike.

---

[9] Can Pîyace **:”** *Di sala 1896 an de li bajarê Nîwtşatl ( Newchatel ) ê Sîwîsre ji dayîk buye. Zîrekîya Pîyace ( Piaget ) ji zarokatîve derketîbû holê. Hîna di temenê 10 salî de karîye yekem car berhema xwe belav bike. Her di temenê 15 salî de babeta zîndewarîyê ket di bejÎyê wî de dest bi lêkolîn û heyînên biçuk kir. Alkanat Almaye di sala 1915 an de ku hîna di temenê 18 salî de bawernameya baklorusî di zanîngeha nîwtştal wergirt. Piştî Sê sal ji temenê wî di 21 salîya xwe de karî bawernameya dokturatî li ser zindî zanînê werbigire. Her di temenê 21 salîde karîye 15 raportên zanîstî di derbarê hinek zindîyên biçuk de belav bike. Ev kare jî buye navudengîya wî li gelek welatên pêşketîyên cîhanê de ''* (Cemîl, 2010: 89).

### 1.2.4.2 Qonaxa Kirdaran (Priconcpetual Period)

*'' Ji du heya heft salî digire... Di zarokan de fêmkirin çêdibe. Zimanê pêşkêş dike. Yekem car şêweyê cîhanî a ji derve di singê xwe de di veşêre. Bi vî awayî bi alozê tê li ber çavan, zanyarîyan di girtinekî kal de nagire. Xelete ger bi girtinekî fotografî dayne. Ji ber ku bîranîn ne wêneyên buyerên hatî girtîne. Belku peywendîya di navbera cihan û rastîyan de dirazîne ''*(W. B, 1983: 41) , bi vê wateyê re dikarîn bêjîn zarok di vê qonaxê de bi temamî hest dike ku zarokekî temam jê derketîye. Dikare di rêya fêmkrina xwe de temamê maf û tiştan bi destbixe , dikare di rêya fêmkirinê de wekî kesekî çalak be yan jî nebe. Ji ber ku *'' Wisan dayne ku zarokekî yê vê qonaxê me anî du berdax av me danî ber devê wî/wê, yek ji wan zirav û dirêj ew ê din jî kurt û pehn. Hinek ava berdaxê pehin û kurt me xist di yê dinde. Asta ava di nava berdaxê zirav û dirêj de bilindtir dibe. Eger em ji zarok bi pirsîn ( Belê asta avê wekî ya caradine yan na? ) Wê bêje ne wek ya cara dine''*(W. B, 1983: 41) , ev jî wê dide diyarkirin ku dikare di vî temenî de ta demekî baş hest bi tiştên dewruber bike. Yan jî ew tişta li ber destê wîye hest bike ku heye.

### 1.2.4.3 Qonaxa kirdara Madîyan (Period Of Concerete Operation)

**“** *Di vir de Pîyac zarevayê wî bi kar tine ji bo destnîşan kirina vekirina mantiqê û pêktê ji çend sitatejîyên nuu.Bi navê girkirina vekirinê de zarok bi kartine. Ev jî di destpêkê de hizirkirinekî a mantiqî ya zarokan nışam dide. Belku ev rewşe jî pişt bi fîlozof û zanayan ve girêdaye. Destpêkê kirdar zehmetîya Pîyac yeksan bike li gel wan zaraveyên ku di sedsalêpêşî de bivê ( Temenê Eqil )”*(Nadir, 1999: 243) , ev qonax wekî destpêka hizrê zarokan tê danîn. Wisan be ku zarokek temam be yê din jî ne temam be. Ev jî di rêya hizir de dizane û hest dike ku kîjan temam nîne. Hizrê mirovan dewrekî girîng dibîne.

### 1.2.4.4 Qonaxa kirdarê Ruwaletan (Period Of Formal Operation)

“*Ev qonaxa dawîya qonaxa bîrdozîya pêşketina pîyace. Zarok hinekê bi hêz dibe ligel girîman û kirdeyakan deKêmtir ber bi tiştên rast ve dibe. Di çareserkirina pirsgirêkan de dikare hemu armancên veşartî derbixe. Hêza derxistina armancên veşartî ê buyerê û durxistina armanca ne veşartîya heman buyerê li cem peyda dibe. Dikare misogerîyê bixê ser armancê hestyar jî bi peydakirina wê rêyê ya ku jêre tê*

*gotin rêya zir derewîn di lêkolîn û çareserkirna pirsgirêkan de "*(Nadir, 1999: 243) ,bi vî awayî jî em bi dibînin di vê qonaxê de bi temamî hatîye fêmkirin ku di jiyande tiştên veşartî û ne veşartî temamî bide diyarkirin. Bi temamî hewil dide di jîyanê de armaca xwe bi dest bixe. Ev jî tê wê wateyê ku zarok di vê qonaxê de di jîyana xwe de bi temamî hest bi tiştên baş û xirap dike.

**Brwane :** ewa ku di rêbaza Pîyace de mayî pêwîste wan tiştan destnîşan bike ku di qonaxa yekem, duwem û sêyem de zarevayê cuda cuda bi kar anîye. Ji ber vê jî ev armance çavkanîya derûnnas ( Hîwa Emer Ehmed ) li cihê zarevayê peyva ( Ne xwestek ) bi kar naîye. *Di cihê kirdarên madî de jî peyva ( Kirdewe Hestîyekan ) bi kar anîye. Di cihê ( Kirdare Ruweletîyekan ) de jî ( Kirdarê Wêneyî ) bi kar anîye. Ji ber vê jî ev armanc bawerîye rupelên wekî ( 41-42-43 ).*

### 1.2.5 Eric From[10]

yek ji hemwelatîyê Elmanyaye. Ew jî hewildaye wekî yên pêşîya xwe qala derûnnasîya mirovan bike û wî jî rêbazek afirandîye. *" Eric From dibin bandora fikrê Marks û Froud de bû. Di rastîyê de dikare wekî rêbaz zanelî di marksîzmê de bê hêjmartin . Ewî fikrên Marks û Froud yên ku derbarê kesayetîyê de berhevkir û cîyawazîya wan herduyan jî qal kir. Piştre hewilda ji wan herduyan rêbazekê derbixîne "*(Şamlo, 2010: 144) , eger wisan be from jî wekî yên din ji ber Froud karîye bibe xwedîyê rêbzekê.Tiştên Froud bandorîya wê kiser rêbaza wî hebû.

*" Bingeha rêbaza From a di derbarê mirovên vê serdemê de ku hest bi tenêbûnê dike. Ji ber ku ji xweza û tevlîbûna mirovên din dur maye , ev pirsgirêk taybet di mirovan de ye ,qet di heywanan de nayên dîtîn ,her çiqas mirov di dîrokê de nezan, kole, û hejar jî bû hîna jî rizgar nebûye. Lê belê bi cudabuna xwezayê û şêweyên xwe ne berbesta sîyasî û aborî hunerî de qebz bun xwarîye "*(Şamlo, 2010: 144) ,di vir de From herî zêdeqala tundî û bêzarîya mirov dike. Dixwaze rêbazek wisan dayne ku mirov ji van pirsgirêk û nexweşîyan rizgar bibe.

Ji ber vê jî em dibînin ku From dibin badora Froud de rêbaza xwe çêkir. Piştî wê jê cuda bu û di derbarê (Min) de fikrê ciyawaz heye. *" Eric From (Min ) cuda dike*

---

[10] Eric From**:** “*From di sala 1900 an de li Elmanya ji dayîk bûye. Xwendina derûnnasî û sosyolojîyê di zanîngeha ( Haydlbrg ) Elmanî temam kirîye. Derûn Şîkar di peymangeha derûn şîkara Berlînê de xwendîye. Di sala 1980 an de jî koça dawî kirîye”*(Şamlo, 2010: 144).

*ji kesayetîya bi xcewher û ne kesayetî "* (Xerîb, 2011: 28) , bi vê wateyê From (Min ) cuda dike ji kesayetî û dure ji mirov bi xwe.

From pênc cûran di pêwîstîya jîyana mirovan de diyar dike. Ew jî evin: *" PêwîstîyaPeywendî, Pêwîstîya Bilindbûnê , Pêwîstîya reg û beşê darî,Pêwîstîya Hest şunas,Pêwîstîya hebuna qaliba derûnî "* (Şamlo, 2010: 145) ,di vir de From îspatê li ser vê dike ku mirov dikare di rêya van pêwîstîyan re jîyana xwe misoger bike.

## 2 Jiyan û Berhmên Ya Bextiyar Elî

Di derbarê jiyana Bextiyar Elî  me hewl dideyn ku bi awayeke berçav û zilal despêkirin û berdewamkirina jiyana wî bideyn nasîn ku *“Nivîskar û roman nivîsê kur , di 8,8 1966 an de li taxa Ibrahîm Paşa a bajarê Silêmanîyê ji dayîk buye. Xwendina seretayî li dibistana Şêx Selam temam kirîye. Piştre xwendina navîn li navîna Esmer û xwendina amadeyî jî li amadeyî helkewtî kuran temam kirîye. Piştre li her du zanîngehên Silêmanî û Sellahedîn buye xwendevanê beşê Zevînasîyê. Piştî xwepêşandana sala 1983 ya xwendevanan li zanîngeha Sellahedîn a Hewlêrê destê wî birîndar dibe. Bi yekcarî dest jî xwendina zanîngehê berdide û dizivire silêmanîyê. Bi temamî xwe ji bo karê nivîsînê amade dike. Di heman salê de yanî sala 1983 an de Qesîdeya Niştîmanî di nivîse ku kevintirîn berhema ku belavkirîye.... ”* (Nawdar, 2017, Tenha Kitêbekan : 1).

*”Di sala 1985 an de Ji ber rewşa ne armîya kurdistanê bi du hevalên xwe re yên wekî Faroq Refîq û Rêbuwar  Siweylî berbi kurdistana Rojhelat ve rêdikevib. Heya demekÎ li navçeya Çempar bu piştî wê bi herdu nivîskarên hevalê xwe re diçin bajarê Banê û li wir niştecih dibin. Ji ber rewşa şerê Îran û İraqê zextek zêde a komara îslamîya îranê li ser wî çêdibe bi neçarî disan berê xwe dide başurê Kurdistanê ,di dawîya salên notî de kurdistanê bi cih dihêle û berê xwe dide Tarawge”* (Nawdar , 2017, Tenha Kitêbekan  : 1-2).

Diyartirîn berhemên nivîskar pêkhatiye ji wan ku em li jêr de qala wan dikin weke . Êwarewy Perwane, Mercî Taqaney Dûwem, Koşkî Balindey Xemgînekan , Şarî mosîqare Sipîyekan û Diwahemîn Henerî Dûnya ,Li gel çend helbestan. Eşkereye di romana Diwahemîn Henarî Dûnya piranîya bûyer û karekterekan  qala jiyana xwe a çaxê 1990 an de dike. Ku bişkeka baş a romanê qala çaxê Serheldan û Şerê Navxwe dike.

Vê romanê bêhyir ji yek çapa hatiye çapkirin ku di dawîyê ji bo ser zimana Elmanî hatiye wergerandin ku vî romanê nivîskar bûye sedema bi dest anîna pileka bilind û pir bayexdar nivîskar bi vê cûrê xwe daye naskirin ji bo gelên Ewrupayê . Di kurdistanê jî heta niha heşt car hatiye çapkirin .

## 2.1 Ew Sedem Û Pirsgirêkane Bandorîya Wan Li Ser Avahîya Derûnîya Kareter Di Romana (Diwahemîn Henarî Dunyayî) Bextiyar Eli De

Bêguman di her romanekê de em dibînin ku gelek sedem û pirsgirêk bandor dibin ser derûnîya karekter. Ev jî çi bi awayekî zindî be yan ne zindî be, kêm yan jî zêde be ew bandorîya xwe li ser derûnîyê bi cih dihêle. Ji ber vê jî eger em temaşebikîn emê bibînin ku di Romana ( Duwemîn Henarî Dunyayî ) Bextîyar Elî de çend pirsgirêk û sedem reng daye li ser derûnîya karekterên nav romanê de. Bextîyar Elî di nava romana xwe de karekterekî gelek anîye , Bi awayekî gelek baş û ciwan hewil daye karekterên wan destnîşan bike ku sekna wan beramberî pirsgirêk û rêgirî û sedemên jîyanê. Ewa ku me girîngî dayîyê ew ku qalkirina pirsgirêkên civakî û desthilata sîyasî û bandorîya aborîye. Ev ji ji bo zêdetir derxistina alÎyan û sedemê giringîya jîyanê li ser derûnîya karekter.

### 2.1.1 Sedemên Pirisgirêkin Jivakî Li Ser Avahîya Derûnîya Karekterên Di Romana (Diwahemîn Henarî Dunyayî) Bextiyar Elî De

Bêguman kêm yan jî zêdebe jî pirsgirêkên civakî bandorekî zêde a wan hebu li ser derûnîya karekteran. Sedemê vê jî ji bo wê dizivire ku kesên di nava civakê de her kesek bi awayekî cuda pêşketinê di edetên pêwîstîyên di nava civakê de dike. Eger li gorî vê be di kevin de yan jî di demê nihada derûnîya kesan berdewam cêgir nebûye.Her wekî ku Bextîyar Elî çend alîyên civakê daye destnîşan kirin. Ji ber vê jî pirsgirêkên civakî *" Buyerên dîrokî neynîka hest û nestê giştî çîn xelkêye. Kar li ser xwestekên nivîskar dike. Dîmenekî din bi nivîskar dibexşîne û cîyawaz dike ji ya ku xelk dixwaze "* (Bokanî, 2006: 39) ,bi awayekî nivîskar tê şirovê li ser pirsgirêkên civakê dike. Ji ber vê jî nivîskar tê şîrovê li ser buyerên nu yên civakê dike.

Pêwîste em peywendîya di navbera nivîskar û civakê de bidîn diyarkirin. *" Her çiqas civak ji berhemê nivîskar kevintire, ji ber wêjî nivîskar bi civakê ve girêdayîye û xeletîyên wêjî şîrove dike û hewil dide bi goherîne. Civak di hemu alîyan de di nava berhemê nivîskar deye "* (Xwrşîd, 2015: 9) ,civakî li gorî fikrê xwe hizra berheman dike û bandorê li ser derûnîyê jî dike.

Armanca sedemên civakî yan jî pirsgirêkên *civakî " Ewe ku bingeha derûnîyê ku nîşa xelkê dike bazarê li gel mijarê bike.Bi vê re jî babetê werbigire yan jî ret bike.*

*Ne gengaze ku ew mijara ku xwendekar wer digire di alîyê teknîkî de baş be yan jî xirap be. Hine caran komek mijar xweşa wan diçe û di nava civakê de belav dibe. Belku di alîyê teknîkî de gelek lewaz jî be "* (Kerîm, 2013: 35) , di vir de kes bi vê re mijar û romana pesend dike ku li gel hizir û derûnîya wan bi guncêç tam û jê bigirin. Ev jî wisan dike ku reng bide li ser derûnîya kesan.

Pêwîste em vê jî destnîşan bikîn ku ka dab û nerêt çiqas bandorîya wan heye li ser derûnîya civakê. *" Rê û resmên peywendîya civakî a di navbera kes û civakê de ewe ku bi hayê reftarê ye bawerîya wan pêtê. Cûrê rejîma fermanberan jî cudahÎyekÎ taybet a xwe li ser reftarê kesayetîya mirovan de heye "* (Qereçetanî, Saykolojiyay Giştî, 2007: 46) , rê û resmên kurdî cudane li gel welatê bêrîtanya. Ev jî bi vî awayîye ku rê resmên kesên kurd bi şêweyekî dibin yê gişt xelkê , lê belê welatê Bêrîtanya cîyawazîya wan a li gel ya me yasayên wane.

Ji bo hîn zêdetir balkişandina ser alîyê civakî *" Wergirtin û retkirina civakîye ku her yek ji me pê tê naskirin. Demê ku ev hêvî û karkirina kes li gel mirovên xwe beşdarî kirina wan di xweşî û nexweşîya xelkê xwe ê dewruberde. Civak jî pîvana bingehîne daku bi kare bi başî yan jî xirabî hukum li ser her kesekê bike "*(Cebarî, 2000: 28) ,kes bi vî awayî fikirdike ka berhema wî çiqas başe yan jî xirabe. Ew jî rengê dide ser hizir û derûnîya kesan.

Li gorî fikrê Adler jî *" Qet kesek nikare ji dewruberê xwe bibire û peywendîyê li gel kesên din de neke. Di kevin de mirov bi xêzan, xêl û netewêre li cem hev kombune. Armanca wan civakan jî mayîna parastina hevduye "*(Ehmed R. , 1999: 248) , bi vî awayî em dibînin ku ya ku dibe sedem mirov li cem hev kom bibe rêwresmên wanin. Daku bi karin tiştên dewruberê xwe jî nasbikin.

*" Sedemên ku dibin gunehê bazara pîvana civakê, guherînên bi lez yên civakê koçkirina wa ji gunda berbi bajaran ve , ev jî şerekî di navbera niviskaran de çêdike. Xêzan jî bandorîya xwe heye ji bo cih birina gunehê di rêya çavlêkirin û hilweşandina xêzanê de. Şaristanyet jî bandora xwe heye li ser reftarê tund û tîj , ew civakên ku reftarê ne şaristanî jî hene tund û tîjtirin , gunehên tund û tîjîyê zêdetir çêdibe "* (Nesreddîn, 2013: 103-104 ) , hinek sedem hene ku wisan bi derûnîya kesên civakê bikin dibin sedemê têkçuna nexweşîya nav malê. Dewruber jî wisan li wan dike ku koçî nav bajaran bike. Belku di derûnîyan wan de wisan be ku xweşîya bajar hinek nexweşî û birînê derûnîya wan kêm dike. Her di alîyê xêzanî de jî kes rastî tewn û

sezayê dibin. Ev dibe ku wisan bi wan bike bibe sedemê hilweşandina xêzana wan. Bi heman şêwe şaristanîya ku kesên civakê tê dijîn belku alîyê civakî de jî bandorîya derûnî li ser wan hebe.

Gelek caran jî pirsgirêkên civakî dibe sedemekî girîng ji bo derûnîya kesan. *" Na be ku milkdarekî taybet bibe sedemê çêkirina pirsgirêkan di navbera kesên civaka xwe û yên din de"*(Qadir E. M., 2014: 31) , gelek caran me bihîstîye ku ev pirsgirêkên biçûk bune sedemê nerazîbûna di nav bera du civakan de. Sedemê vê jî ew bu ku bandorîyek xirap li ser derûnîya kesên wê civakê kirîye. Wisan kirîye ku kesekî aciz derbikeve di alîyê derûnîya xwe de.

Pêwîste em qala sîstema şaristanyetê bikîn. Belku bandora wê hebe li ser derûnîya civakê. *" Her di destpêkê de civak di civakê de ji pileyên şaristanîyê çêbûne. Reftarê mirovan jî tê de rast dike. Zanîsta gelan ( Mirovnasî Şaristanî ) girîngîyê dide lêkolîna sîstema şaristanyetê. Ji ber wêjî yekem car wisan derdikeve ku ev her du zanîste ji hevdu cudane û peywendîya wan bi hevre nîne. Li gel wê jî wisan nîne ji ber ku mirovnasîya şaristanî giringîyê dide şaristanîyan û taybet civakan "*(Pispor, 2004: 45) , wekî me di destpêkê de jî qalkir pêwîste sistema şaristanî bandora wê hebe li ser derûnîya kesên civakê. Ji ber ku her alîyê şaristanîyan di nava civakê dene ku biryarê li ser derûnî û hizrê kesên di nava civakê de didin. Belku dahatuya her kesê di nava civakê de diyar bike.

Di pirsgirêkên civakî de ya ku mayî em qalbikîn, bandora derûnîyê li ser karektere , ew *" Şideta xêzanî jî bi taybetî dijî zarok û jinê nexweşîya di navbera jin û zilamde sedemekî din a encamdana tawanê civakîye , ev jî zarokan neçar dike ku ji malê durbikeve , di encamê de rastî pirsgirêkan tê , bi taybetî jî di jîngehekê de hişyarîya civakî û rewşenbîrî di astekî nizim deye. Şer û bê bavkirina zarokan û seqetbuna yek jiwan bi şêweyekî ne zindî diyardeya tund û tîjîyê zêde dike "*(Nesreddîn, 2013: 105) ,Ji ber vê jî em dibînin ku şideta di nava xêzanê de dibe sedemê xirap zanînê û wisan dike ku her yek ji xwere reftarekê bi gire , bi xwe dibîne ku kesek di nava civakê de mezine. Ev jî wisan dike ku bibe sedemê paşketina kes. Bi taybetî eger asta rewşenbîrîya civakê di astekî xirap debe. Her ji ber van sedemane bandorîyên xirap li ser derûnîya kesan dike.

*" Ew wekî du keçên goşegir mezin dibin. Du keç zilamên cuda wan diparêze,ne ji ber wêyeku ne xweşikin. Belku ji ber wêye ku hêzek di çavên wan de heye ku zilam ji*

*wan ditirsin û xwe ji wan winda dikin... Her du ji hevdu bihêztir bun û zilam bi asanî nîgarîya wan bikin. Tiştekî kur û dengekî dur li cem wan bu li gel xwesta wan zilaman ne di gunca tenê derveyîya jina dagîr dikirn. Vê lewazîyê wisan kir ku derketina Mihemedê dilşuşe ne hêle zilamek jî nêzîkÎ her du xuşkan bibe "* (Elî, 2015: 40) , di vir de Lawlawî sipî û veşartîya sipîye. Ew her du xuşk xweşikîya wan wisan bu ku bala gelek kesan dikêşa ser xwe. Wisan diyare ku di nava wê civakê de wisa buye ku kesekû bi wî awayî balkêş buye. Balkêşîya xweşik bêyî diyar bibe balkêşîyek wisa ji xwe re rakêşan bû. Ew ji wisan fêrbibûn ku ru nedin kesekî. Ji ber ku li gorî wan di nava civaka wan de tiştên bi vî awayî ne pesendin. Lê belê piştî derketina Mihemedê Dil şuşe bi awayekî din gohertin bi ser wan de hat.....!

*" Ji berî ku roj derkeve, di fasîleyekî kurt a di nava banga siharê de ivistina bang bêjde. Silêmanê bab û Îkramê kêw di tirimpêlek şîn a biçuk de çun xwestina wê keçê. Ew zutir xwazgînîyê dunyayê bû. Qet keçekî wekî wê di 5 serê siharê de ne hatî bu xwestin. Sibehê dayîka wan derî vekir,, Jinekî kiçik û tirsunek bu bi temamî dibin rikêfa keçên xwe de jîyabû. Silêmanê mezin û hevalê xwe hêdî hêdî çun nava malê û li ser du kursîyên biçuk runiştin. Diyar bu yekê pêşîya çend çirkeyan subeyek pêxistibun. Duyê agir hîna di hundir debû. Her du keç bi cavekî westayî hatin çun odeyek din de. Her du jî du dest cilê sipî li ber wan bû wisan bu ku di gotin niha ji dawetê hatine. Du şalên sipî û dirêj danûbun ser milê xwe bi dengekî sar û hişk xêrhatina mêvanan kirin "*(Elî, 2015: 48) , Silêmanê mezin bavê Mihemedê dil şuşe bu. Dema ku mihemedê dil şuşe Lawlawa sipî dibîne digehe wê qenaetê ku mihemed gelek aciz be ji jîyana xwe Piştî wê Lawlawê dikin ew jî nizane her du keç qet şu bi kesekê nakin. Babê mihemed jî wê siharê zu ji ber dilê mihemed çu bu xwastina keçê. Ew jî ji bo bicih anîna edeta civakê ji bo wê wisan diçe. Piştî wê dayîka keçikan derî vedike û mêvandarîya wan dike her du xuşk jî tên bihatina wan re tirs dikeve dilê wan. Ji wan re balkêş di hat serê vê sibehê hatîne xwastina wan. Lê belê di encamê de ne xwastin şu bi mihemed jî bikin. Bavê mihemed bi dilekî xemgîn di zivire malê û kurê Silêmanyê mezin jî rastî xemgînîyek zêde tê...

*Wa çiqas rojekî balkêşe, tifal wekî bavên xwe naçin... Di tuvê gulekê de gulek din derdikeve. Di hêlîna balindeyekê de teyrek din derdikeve. Ez ji we na veşêrim, ez zilam kuj bum. mamosteyê merg bum. Min ne di zanî di saya min de zarokek mezin dibe"* (Elî, 2015: 69) , bêguman hinek caran zarok bi bavê xwe ve naçe bi şêweyek

din derdikeve. Ev wesifdayîna bavê mihemed jî wisa der dikeve ku Lawlaw razî nebu ku pevjînîyê pêre bikin. Ew jî wisan lê hat ku dil tejî xem bibe.

*" Niha ez naxwazim qala wan dîtina ji were bikim. Ew roj gelek zu çu ava. Her du xuşk di tirsa wê de bun ku çîrokek din ya wekî a mihemdê dil şuşe dubare bibe. Bêyî ku xêrhatinê li wî kurî bikin bi lez ji girik hatin xwarê û winda bûn... Her du xuşk ji tiştekî direvîn ku derbazîya wê nÎne. Çîrokek ku qeder diçe navê. Çend berg bigire di şêweyê rêkeftinê din de dubare dibe , kîlekenda sekinî û bi zerdexaneya xwe temaşeyî her du xuşkan kir. Wekî ji tiştekî birevin bazdam "* (Elî, 2015: 72 -73) , ev jî piştî wê tê ku hevalê wî nêzîkî mihemed bu, û xwest here ser gora mihemed. Dît ku ev her du xuşk li ser gura mihemed sitiranan di bêjin. Ji ber wê jî diçe cem wan xwe bi wan dide nasandin. Xuşkên hev wisan di hizirin ku Seryas wekî birayê wane, da ku hevserîyî li gel her du xuşkan neke.

*" Ev her du xuşk her çawe bejî xweşik bun. Lê belê kesekê ji wan hes nedikir. Sedemên vê kînê gelek hebûn. Xuşkên sipî ne du kesên asayî bûn , ew çîroka seyranê li ser wan belav bibû. Ne wekî çîroka çi jinek din bû ev hemû tiştane piştî mirina mihemd çêbû. Bi cûrek ji cûran wêneyekî balkêş li ser wî çêkirin û ev sitiran jî carekê li ser gora mihemedê dil şuşe jî gotin. Roja din jî bi dengekî bilind dubare kirin. Lê belê her ew jî nebun li ser gora wî sitiranan bêjin. Belku li cihekî din di demek dinde sitran gotinen û ne dibu bêjin "*(Elî, 2015: 89) ,sedemê jê hesnekirina van her du xuşkên sipî ev bu. Wisan dizanîn ku xîyanet li mihemed kirîne. Ji ber wan ew mirîye. Xuşkên sipî di nava civaka xwe de wisan xwe perwerde kirîbun êdî peywendîyê li gel kurek din çêbikin û wekî birayê xwe temaşe bikin ne wekî jê heskirinê. Her ji ber wê jî Seryas jî wekî birayê xwe qebul kirin.

*" Seryas jî bi wêjeyekî matmayî qala jinan dikir. Wekî yek ji cadi lê hatibe kirin deng û qêrîna her du xuşkên sipî dibîhist. Li ser goristanê hatin û xwe kirin di odeya min de Şerefa pelpelîstan kê dan. Bi dengê bilind qesî dekir û pê dikenî. Tişt ji bo Şerîf pelpelîstankê digotin da ku ez jî bi bihîsim. Ez wekî dîna lê dihatimû min got : Tu ne ji Seryas mezintirô, ne Pirofesorê şevên meyî... Ne gulika çêleka kolananî... Tu ne tiştekî ne, Ji bîra te çûye ku van xuşkan hevalê te kuştine. Ez na xwazim guh bidim van gotinan... Min navê di mala min de hun van gotinan bikin "* (Elî, 2015: 244 -245) di civaka me de wisan bûy ku nabe gotinên ne baş ji bo jinan bêjî. Pêwîste bi çavekî bilind temaşêy bikî û dengê xwe li ser wê bilind nekî. Lê belê Seryas jî wisan dizanîn

ku her du xuşkên sipî bune sedemê mirina Mihemed. Ji ber wê jî bi çavekî kêm temaşeyî wan dikir. Ew sedemên serekî yê vê rewşê bûn.

*" Evarê jî Seryas li gel her du xuşkan di demekî kurt de rêve çûn. Di vî demî de Seryas derfetê wî hebu ku bersiva wan pirsên sade bide ,wekî wê ka çend xuşk hene, Çend bira hene, di refa çend, Bavê wî îşê wî çîye ? Seryas jî got min ne xuşk heye ne jî bira ne jî dayîk heye û ne jî bav heye. Min dibistan jî ne xwendîye. Piştre Seryas ew hemu pirs jê kirin. Ewan jî gotina mirina bavê xwe û bê birayên xwe kir. Bi cûrekî bi şanazî gotin ( Em ji malbata mamostaya ne )"*(Elî, 2015: 94) , di dema hevdu nasînê de ev pirsyarane hemu asayîne û sadene di nava civakê de. Ev jî piştî wê tê ku wan wekî xuşku bira hev qebul kirin. Bi hevre li hev hatin ku heya roja mirinê bi hevre bin.

*" Êvarê herdu xuşkên sipî li gel Seryas hatin ji derve. Cara destpêkê her duyan destê xwe xist di nava destê wî û jêre gotin: ( Em wekî xuşka tene... Ji îro pêde heta heta tu birayê meyî. êdî tu jî fêr bibe... Bira eger pirsgirêkên wî hebe diçe kur? Pêwîste biçe cem xuşkên xwe Tu jî pêwîste bêyî cemme... Pêşîyê de Seryas xwa bi rojên wisa balkêş ne dîti bu. Ew bi kurnasî fêr bibû. Tê diyar kirin ku Seryas jî rojek ji rojan pirsîye çima dayîka min nîne. Babê min li kure eger min xuşk hene navê wan çîye ? Eger min bira hene çima nayên min bibînin ? Lê belê ne gehiştîye yek ji wan jî "* (Elî, 2015: 120) , bêguman eger kesek bêyî dayî û bav mezin bibe wê ev pirsyarane tim li cem wî çêbibin. Heya derxistina bersiva wan wê di derûnîya wî de bi cih bibe. Piştî xuşkên sipî destê xwe xistin di nava destê wî de wan jî wisan kir ku derûnîya wî rihet bibe , di demê xweşî û nexweşîyan de jî pişt bi xuşkên sipî ve girê bide.

*" Du xuşk yek kirîbun birayê xwe ku kesek yê wî tuneye. Di direngîya şevê de wextê şaderyaya sipî qala jîyana xwe ji Seryas re gotin. Ew heta heta şu nakin. Pirça xwe nabirin û bêyî hevdu sitiranan jî nabêjin. Ji rengê sipî cudatir rengekî din li xwe nakin. Her wê şevê hersêyan peymanek nivîsîn bi xwîna xwe û mirîyên xwe "* (Elî, 2015: 121) , wisan diyar bu her rêkeftinekî civakî wisan bûye û her bi wî awayî derûnîya wan jî asude rihet dibe. Nebin sedemê xem û êşan ji kesan. Wan wisan di xwest ku Seryas wan wekî xuşkên xwe qebul bike. Daku xîyanetekî civakî di navbera wan de çênebe.

*" Ew roja ku Seryas mirî çend caran wan agahdar dike. Lê belê bê sud bû peywendîya wan li gel şeytan nebû. Lê belê hîs dikim ku peywendîya wan li gel hêxekî nediyar û xwezayî hebû. Bê endaze azad bûn, Di dema azadîya xwe de laşê xwe ji bo*

*hemu zilamên di cîhanê de heram kirin. Ev şêwazê jîyanê jî cûreke ji rastîya ku ji hebuna wan cuda ne dikirin. Du jin bun qet xwestekek nebun ji bilî xwesteka sebestîyanê biçukê xwe. Xwesteka wan ew bu şev bi gerin û ne tirsin şermê ji sitiranên xwe nekin "* (Elî, 2015: 147), piştî demekî Seryas jî di şerê di nava taxê de mir. Pêşî jî wan Seryas agahdar kirî bu ku rewş ne gelek başe hay ji xwe hebe , lê belê piştî guhdana gotinê wan wê rojê bi giranî birîndar dibe û piştre jî di mire. Ewa ku di vir de girînge em qal bikîn. Li gorî li hevkirina wan û peymana ku di nav xwe de danî qet nebin hevalê tu kesî. Ew jî bi şertên civaka xwe re bun yek û ji ber wê wekî du jinên jîr rêve diçun û xwe dur dixistin ji kesên din.

*" Hest dikirin ku kesên di dibistana bazarê de rik û nefret ji wan dibirin. rabun tif liwê kirin hêdî hêdî li dıkandaran didan. Armanca wan ew bu ku ciwan ji wan dur dixistin. Piştî mirina marşale ji bilî wî jî zarokên bêhude şer ji bo împeretorîya Ereban re dikirin û ji kesek din jî hesne dikirin. Di wê havîna tarî de Seryas hat kuştin ew jî bi şev diçun meydana erebên şev "* (Elî, 2015: 149-150) , bi vê re jî xelkê gelek kîn ji her du xuşkên sipî dikir. Ji ber ku li gorî wan ew bun sedemê kuştina mihemedê dil şuşe. Ewên ku pişt marşal Seryas jê hes dikirin ew bun hevalên Seryas. Hemu xeletîyên bi wê fêmkirinê re civak jî xeletîya wê je heye beramberî her du xuşkan.

*" Wê şevê Seryas destpêka serpêhatîya xwe heya dawî ji wan re got. Wan jî got : Me jî yek bira heye ew jî tuyî... Qet kesek jî cihê te nagire. Li cem me yek kes heye navê wî jî Seryase û sibeh deme. Me navê em kesek din bibînîn ku navê wî Seryas û sibeh dem be. Kesekdin navê te û bîranînê te bidize ji bo xwe. Seryas pê dikenî û got : Min ji bilî bêbextekî di nav erebande qet tiştekî din nîne. Kes naxwaze jîyana min bidize ,ew jî bêşanseke ku bi xwaze jîyana min bidize "*(Elî, 2015: 195),di vir de zivirî wî demî ku xuşkên sipî derûnîya wan asude bû bi wan fikrên civakî yên heyî. Wisan fêmkirî bun ku êdî birayek yê wan heye nabe kes tiştekî xirap bi ser wî de bîne.

*" Li cem min gelek balkêş bu ku du keçan biryar dabun heya dawîya jîyana xwe mêr nekin. Pîşeya wan jî amadekirina kirasê bukanîyê bu ji bo keçên din. Jê re şaderyayî sipî di gotin : Her kes bi destê xwe şadî û bextê xwe çêdike. Ewên ku şeydayê wî cûrê kirasan dikirin belku sipîyê wan bû. Her kirasê ku xilas bikirina, berîya ku bi pêçin dixistin li ber xwe. Di serê sibehê zude min dît ku herduyan kirasê sipî yê bukanîyê xistine ber xwe û ji deştê tên "* (Elî, 2015: 208) , di vir de armanc ewe ku sibeh dem di wî demî de ji zîndanê rizgar bûn. Li pey Seryas di zivirîn. Piştî ku ew

xuşkên sipî naskirî bu. Ewan jî biryar dabun wekî bavê wan li gel wan bijî. Wê demê ew li gund bûn. Jîyana wan a burî wisan li wan kirîbûn ku di cîhanê de pêşketinê di jîyana xwe de bikin. Ji bo berjewendîya jîyana xwe bi durîna cilên sipî ê bukanîyê ve xerîk dibûn. Bi vê re jîyana xwe ava bikin û bi vê destkeftîya madî jîyana xwe misoger bikin.

*" Muzefer qala wan keçikên sipî ji min re neke. Dema ku min ji te re kasêt şand behsa wan her du xuşkên sipî ji min re neke. Heya min têxin di nava gorê de wê wekî cinsê şeytan temaşeyî min bikin. Ewan dil şuşe kuşt. Ew bu sedemê têkçuna peywendîya di navbera min û marşal de. Ez ji wan hesnakim... Muzefer subeh dem... Ez nefretê ji wan du xuşkên sipî dikim. Ewan Mihemedê dilşuşe kuştin "*(Elî, 2015: 240- 241) ,*e*v jî di wî demî deye ku sibeh dem kasêt ji bo Seryas di şand ew jî wisan fêmkirî bu ku xuşkên sipî bibun sedemê kuştina Mihemed dilşuşe.

*" Rojekê bi vê birîndarîyê ve min kaxezek şand sozanekî li bajêr. Piştre wan bersiva min neda. Rojekî xirap bu. Deng hebu şer destpêdike û masulkeyê min rêne dida herim nav bajar. Kesek ji min bêdengtir bi destê wan nediket. Destpêkê de got ev ji bo xuşka mine. Piştre sekinî û disa got ne ji bo xuşka mine ji bo leş firoşekêye. Leş firoşê îmana min derxist min beraberî sed milyaketa ji wê hesdikir. Min name ji bo wê bir. Keçekî gelek xweşik û paqij bu di daîreyek paqij de kar dikir... "* (Elî, 2015: 278) , ew kare jî karekî wisan bu ku dijî reftara bû. Ewê jî di nava civakê de bi çavekî kêm û pîs xwe didît. Guman di wê de nîne ku ev cûrê jinan ji bo tam yan jî destkeftîyê peran vî karê firotinê dikin. Civak jî vikarî qebul nake û ji xelkê re pêşnîyar dikin ku vî karê firotinê nekin.

*" Ji ber wê jî ez bi tenê di tarîya şevê de dikarim biçim bazarê wan koçê reş bibînim... Dizanî ez çaweşewtîm ? Bizane, ez di dexlekî şîn de şewitîm. Li gel keçek ya şêxekê li bin asîmanê şînde razayî bum. Kesu karên wê agir berda dora me. Min bi agirîve xwe gihand avê. Ew ê nekarî derkeve ji nava genîmî de şewitî "* (Elî, 2015: 328) , eşkere ye ku xîyanet di nava civaka me de kuştin yan jî şewat lê dikeve. Ev ne karekî raste pêwîste ji vê re çareserîyekê bi gerin. Pirsgirêk ne ewe ku bi kuştin yan jî şewatê dawî lê were. Ev jî di zivire ser rêresmên wê civakê beramberî wê pirsgirêkê û çareserkirina wê. Ew Seryasê ku di vir de behsa wî hatîye kirin. Ew Seryasê sêyeme ew jî piştî şewatê jîyanê di cihê şewatê de berdewam dike.

### 2.1.2 Rolê Desethelata Sîyasî Li Ser Avahîya Derûnîya Karekterên Di Romana (Diwahemîn  Henarî Dunyayî) Bextiyar Elî De

Bêguman desthilata sîyasî çi di nava civaka kurdî de bê çi jî di nava civakek bîyanî de be, em dibînin ku sîyaset gelek caran dibe sedemê ji hev fêmkirina du civak yan jî du welatan. MÎnak dema şer çêdibe alîyê sîyasî yê kijan welatî bilintirbe wê demê zere û zîyan bi civaka din dikeve. Ev rewş jî bandorek xirap li ser derûnîya kesan çêdike.

Ji ber wê jî *" Civaknas dibêjn reftarê sîyasî cûreke ji reftarê civakî. Bi vê re jî kar û şerê sîyasî û rêxistinan rengdayîna barê derûnîya kesane. Reftarê demokurasî jî wekî her cûrê reftarê sayko sîyasî li cem her hizb û rêxrawekê wekî her beşek din ê sîyasî û ayîdolojî du qunax yan jî du alî heye. Alîyekî rêbazîye ku diyarkirina pirensîb û rewşenbîrîya û piropaxandaya demokurasîye. Her rêxistinek bi şêweyekê belva dikin. Alîyê duwem jî piraktîzekirine. Dema ku zêde pêwîstîya wan bi bi destxistina naverok bîrdozîyê ye "* (Nesreddîn, 2013:  35), her weke me di destpêkê de behsa wê kir Pirsgirêkên sîyasî bandora wê heye li ser derûnîya kesan. Armanca van her du alîyan jî eve. alîyê yekem diyarkirina piropaxandaya rêxistina û alîyê asta rewşenbîrîya wan. Alîyê duwem jî ew ku bi destxistina di nav bera du welatan de ji bo demekê tê gohertin. Ev jî wisan dikin ku bandorê li ser derûnîya kesên di nava civakê de bike.

*" Tund û tîjî yan jî ceng di vê astê de berhema karkirina xerîzeya mirinê ye. Ev xerîze jî di vî demî de dibe sedemê wêranîya mirov ji bo roxandina tiştekî ku dikeve dewruberê xwe de bi kar tîne. Xalekî girînge ku Froud behsdike Hem xerîzeya jîyana û hem jî ya mirinê dikeve nava sîyasetê de. Jîyana  sîyasî dikar ji bo mezinkirina heskirinê û parastina jîyanê kar bike "*(Firoyid E. û., 2007:  20-21) ,bi vê armancê re Froud wê sîyaseta ne xweş bi gehîne di nava civakê de. Eger her du alîyê civakî di alîyê sîyasî de bê pirsgirêk bûn, Zu hewildan pirsgirêkên sîyasî çares bikin ew dibe sedemê keyfxweşîyê. Her sîyaset jî dibe sedemê mirin û jîyana kesên di nava civakê de. Da ku bi karin bi xweşî û şadî bijîn.

Ew xwezaya ku mirov tê de dijî  yan jî jîyanê tê de peyda dike. Dibe bandora wê hebe li ser derûnîya kesan. Ew kesê ku *“ Di jîngeyekî hizbayetî de dijî wÎ di gehîne alîyekî koranî û fikrê kesekî sîyasî yan hizbekî bêyî ku li hev bide. Ev jî dibe ji bo çespandina rihê demarê rêxistina û pesendkirina hizrê wan ê hestkare, belku dijî kirine. Ev jî ya netewane hêdî hêdî di çirmisin bêyî ku hest pê bikin "*(Nesreddîn, 2013:

38) ,tê wê wateyê ku ew mirov di wê jîngehê de dijîya . Bi heskirina rêxistin û alîyekê wisan li wan dike ku hest û sozê xwe bi guncîne , bi ser derûnîya xwe de zalbin. Ev jî wisan dike ku hinek caran encamên baş jê bikeve û hinek caran jî encamên xirap jê derkeve.

Pêwîste em behsa kesayeta kurd jî bikîn di alîyê rêxistin û desthilatîyê de. Bi vê wateyê *" Mirovê kurd jî pêşî ku beşdarî di grupek, desteye, yan jî rêxistinekê de bike.Pêwîste xwe wekî mirovê serdemê pênase bike. Ev bi biryara sîyasî çênabe. Ev xebatekî mezin a civakê ye pêwîste rêxistin û desthilatdar jî ji bo vê armancê kar bike ne ji bo berjewendîyê xwe "*(Cengawî, 2011: 13),Pêwîste kes li jêr navê sîyaseta xwe de derbixîne. Di vir de jî pêwîste di alîyê civakî de hewildanekî ji bo jîyana xwe bike , da ku bi gehe armanca sîyaseta xwe.

Pêwîste em behsa namoya sîyasî jî bikîn. Dikare bandora wê li ser kesên ku di nava civakê de dijîn hebe. *" Xerîbîya mirovê kurd jî Sedemê wê ew namoye û ew jêr destîye.Berdewam netewa kurd di destê hêzên Emperyalîst de ye. Êdî mirovê kurd jî wisan ne hatîye ku azad bijî. Jîyana wan hemu di destên wan hêzên emperyalîst de li sernexşeyê hatîye kêşan. Carna şerê ziman kirîne carna jî şerê çanda xwe û carna jî şerê dîrokî kirîne. Van tiştan hemuya wisan bi kesê kurd kirîye êdî bi goman jîyana xwe dibe serê "* (Hemed K. R., 2015: 115) ,ev sedem hemu bandora wan heye li ser alîyê jîyana sîyasî ya kesên di nava civakê de, dema ku kesek bi zimanê namoyî di axive û ji çanda xwe û cilû bergê xwe yê resen dur ketîye , gelek caran jî dîroka wan bi awayekî ne rast li gorî desthilat daran nîşa wan hatîye dayîn , di heman demê de coxrafya wan jî bi awayekî din hatîye nîşandan , ev hemu gumanê di wan de winda dike û dibe sedemê ku di alîyê derûnî de jî aram bibin lê ew nizanin ku evhemu bi awayekî xelet hatîye nîşan dan.

Ji bo hîn zêdetir em balê bikişînin li ser namoyîya sîyasî yan jî bîyanîya sîyasî, li gorî vê lêkolînê hîn zêdetir armanca wan ewe ku alî di jîyana xwe de zêde beşdarîya sîyasî nekin. Ev jî guman tê de nîne ku bandorekî xirap dibe wekî di *" Lêkolîna ( Makdî ) û (Rîdlî ) 1962 de derketîye. Ew hest bi namoyîya sîyasî dikin. Kêmtir beşdarîya sîyasî heye "* (Hemed K. R., 2015: 116), wekî ku me dayî destnîşan kirin kesê ku beşdarîya wî a sîyasî ne be ew di alîyê derûnîyê xwe de jî ne rihete yan jî ne arame ,ev jî wisan bi kes û civakê dike ku bandore kî baş ne be li ser derûnî û hestên wan.

Pêwîste em qala şer û kuştinê jî bikîn. Bi wê wateyê ku şer û kuştin çend cûran di nava xwe de digire. Wekî: *" Kavilkirin, Kuştin, dîlgirtin, sivik girtin, talan, dest dirêjkirina ser şerefê, namusa jinê, zirmîna topê, naleya hewanê, girmîna firokeyan û çendîn reftarên din ê ne mirovî di gehîne "* Karesatan ji bo hemwelatîyan bi cih dihêle. Ew diyardeyên serê dibin buyer di alîyê jîyana rojane a mirovan de û jîyana wan dike dojeh. Reşa tirsê li ser barê derûnîya mirov û bi giştî zarokan çêdike "(Qereçetanî, Nixoşî û Girifte Derûniye Komelayetiyekan, 2010: 283), bêguman ev sedem hemu jî bandorekî xirap li ser derûnîya mirovan çê dike , ev sedem jî dibe bi awayê sîyasî jî çêbibe. Bandora wê li ser derûnîya mirovan jî hebe. Ev sedem hemu jî bandor dibin ser derûnîya mirovan ji ber ku derûnîya zarokan gelek di cihde nîne zu rastî tirsê tên.

Ya ku maye em bidin destnîşan kirin û balê bidîn ser, şerê navxweyî yan jî bira kujî bandorekî zêde xirap heye li ser derûnîya mirovan. *" Eger em balê bidîn ser giştî xelkê kurdistanê û behsa gendelî û bermayên şerê bira kujî dike wê fikrên cuda cuda derkevin holê. Ecêbîya xwe di demokurasîyê de derdixin. Ji ber ku abluqeya aborî û propaxandaya demokurasîyê bi hevere derketin holê. Xwezaya mirov jî ewe ku dema rastî du tiştan bi hevre tê. Di paşerojê de jî yek jiwan tê bîra wan "* (Nesreddîn, 2013: 36) , dema ku şerê bira kujî yan jî navxweyî çêbû, wê demê wisan dike ku alîyê sîyasî yê mirovan bandorek ya wê hebe li ser azadîya kesan. Ji ber vê jî rewşên bi vî awayî bandorekî xirap li ser derûnîya kesan dike.

*“Min di sihara yekê de zanî ku ez dîl girtîme di kuşkekê de ddi nava çengelê daristanekî nediyar de. Wî ji min re got ji der ve kuşindeyê taon belav buye. Ne rast di got balinde hemu difirîyan. Ji zarokatî ve wisan bû, her dema ku virek bikira tiştek din çêdibû. Yan baran dibarî yan jî tiştek din diket. Yan jî balinde wekî refan bi ser mede difirîn. Ez di kuşkekî mezin de dîlgirtî bûm. Gelek pirtûk ji min re anîn û got bi xwîne. Min jêre got : Ji min bigere ez herim ji derve. Got : Seranserê cîhanê ne xweşîye Muzefer subeh dem , di vir de di vê cîhana xweşik de runê. Ev ew kuşke ku min ji xwere daye avakirin... Ji bo xwe û Firîşteyên xwe... "*(Elî, 2015: 5) ,behsa wê demê dike ku Muzeferê subeh dem wisan bi hevalê xwe kir bikeve di benzîn xaneyê de. Ev jî wisan bi Muzefer kir gelek xeman ji ber vê rewşê bixwe. Ji der ve şere çêbûye, piştî 21 salan Muzefer nu ji zîndanê azad bû. Hevalê wî pesnê wî cihî didaku cihekî aram bu.

*" Ji bo ku dilê min bibe çixarê, çixareyek derxist û berdayê bêyî ku mêjekê lê bide li ser teblîka zîv danî û got : Em her du jî bi cûrekê ji mirinê tên... Serban û sîyaset herdu yek tişte. Du zevîne yek ji wan naçe, Dema axaftin dikir diçu li ber pencerê. Min hest kir ku axaftin li gel tiştekî ji min durtir dikir "*(Elî, 2015: 34) ,behsa wî cihî dike ku Muzefer nu ji wir hatî bu ji derve ku diket deştekî û hevalê wî ji bo dilê wî razî bike digot deşt û sîyaset yek tişte qet kesek nikare jîyanê tê de bike...!

*" Min gotinê xwe tejî kir û got : Yakub dost, Ez 21 salan di bêdengîyê de jîyam... Na ji min re nebêje tu şahane dijî. Heya bêdengî hebe ez dîl girtîme. Heya ku ev aramîya bê sinor û cîhana bê sinor li derdora min be ez dîl girtîme. Yakub snubeî... Ewan ez di bêdengîyê de zîndanî kirim... Ez gelek di hizirîm wan îskence li min dikirin. Min ji wan pirsî... Sezayê wan ew bu ku heya mirinê di bêdengîyê de bijî. Heya bêdengî hebe ez dîlîm. Hinek dengê xwe bilind kir û got : Belê tu dîlê çi bûyî...Dîlê şev bûyî...girtîyê gerdunê girtîyê siêrkan her dem wextê te hebu tu temaşeyî wan bikî... Muzefer Subehdem, ez şevekê di şerê germ de ji germîya xwînrêjînê de min hêza xwe berbi bilindahîyekêve bir. Di wî demî de min serê xwe rakir û asîman dît... "*(Elî, 2015: 60- 61) ,di wî demî de Muzefer hevalê xwe dîtîye. Jêre behsa çolê dikir , ev jî di encama şer û sîyasetê de ket nava zîndanê. Yakub dema qala vî şerî dike di encamê de serkeftî dibe.

*" Cara yekê bu min peyva dijmin bihîst. Dijmin jî ew nave bu ku hêzekî şerker bû ku li hev dixistin. Wî demî min fêmkir ku şerê nav xweyî çiqas mezin û tirsunake. Îkramê kwê digot: Muzeferê Subehdem li min bibore. Gelek pirsgirêk hene ez nikarim li ser wan bêjim. Heya cihê ku ez dizanim ew kurê runiştî bizivirîne vî alî. Ji ber ya li vir jî gelek armancê mezin li sere "* (Elî, 2015: 204-205) , wisan diyare di wî serdemî de peyva dijmin bîyanî bu li cem Muzefer , ew jî sedemê ew bu di wan 21 salande ji gelek tiştan bê agahî bu. Her di wî serdemî de jî şerê navxwyî çê bu ew jî her di alîyê sîyasî de bu...

*" Îkram hinek din dengê xwe bilind kir û got : Piştî bêdengbuna raperînê û destpêkirina şer min gelek hizra wê dikir... Gelek pirtûk min li ser dixwend.Hinek caran min rih û simbêlên xwe berdida. Wekî fîlekî mezin diketim deştê. Bi hemu hêza xwe min lingê xwe di avêt nav zevîyê de û temaşeyî asîman dikir û min di pirsî mirov çima wisan dikin. Ev gel çi dixwaze ... Çi ? Qonaxa yekem a şer jî destpêkir... Ez ruxam... Min fêmkir ku gîyandarek birsî di nava xwîna her du miletan deye... Di şer*

*de du gel, du dîn, du şêweyê sîyasetê li beramberî yek nebûn... Du mirovên rut beramberî yek bûn... Du mirov wekî du cenawiran bêyî ku peywendîyek ya wan bi mivovatî ve hebe hevdu dixwarin... "* (Elî, 2015: 213-214) , bêguman pêşîya şerê navxweyî raperîn hebû , ew jî dijî şerê rejîmê bû Îkram jî gelek hizra vê dikir ax xelk ji bo çi li jêr navê sîyasetê de desthilatîyê dike.

*" Vê êvarê şer bazar hemu vale kir. Dîmenekî bi tirs di pişt xwe de hişt. Şeqam û kolan pir bu ji tirêmpêlan. Di sepet û sindoqan de fêkî di rêja. Ar û duşav tevli hev bibu. Xwîna miriş û kevokên mirî dirêja. Wekî kevroşekî berdayî di nava silk û ispinakê de. Hinek zarokên giryayî li pişt kepengan bûn. Lê belê derketina her du xuşkên sipî dîmenekî din da kavilbuna. Di cihê xwe de temaşeyî wê kavilbûnê dikirin "*(Elî, 2015: 119-120) ,ew jî ji ber wê sîyaseta çewt bi şêweyekî ne şirîn diçin nava bazarê daxwaza pereyan dikirin. yê ku pere nedidan xel di kuştin , di encamê de Seryas birînda dibe. Daxwaz dikin bibin li cem xuşkên sipî nebin nexweşxanê. Ev jî piştî wê tê wekî birayê xwe qebul kirîbûn...

*" Kuştina Marşal peywendîya wê bi ceng û pêdebûna berdewamîya rojaneyê hebu di meydana ereban de çêbibu. Kuştinekî bê îman û bê tefsîr bû , wekî hemu kuştin û girtîyan êşên welatê me pîçbûn. Seryas Subehdem di vî temenê xwe ê nazik û biçûk de ne dihişt wisan bi hêsanî bimire. Mirin jî peywendî bişer ve hebû. Peywendîya wê bi wê xwenê ve hebu ku buye mirovekî mezim "* (Elî, 2015: 153-154) , temamkerê vê behsê te ku Seryas ji ber vî şerî mir. Ev di encama sîyasetê de çêbû bi sedemê kavilkirina baz û kolanê dewrubera wê de.

*" Ez wisan hîs dikim ku mevlana yek bi yek hemu fîşekên min dîtîye , cîhan di alîyê çepê û yek jî di alîyê rastê û yek jî di nava hinav û sing deye , destgirê wan dibêje yek ji polîsan fîşek berdaye. Lê belê kîjan polîse kes nizane. Ket û bi dengekî bilind hewar kir. Xudayê mezin ez mirim. Ez yekem kes bum ku çum serê û min serê wî danî li ser milê xwe. Di wî demî de polîsan jî fîşek di avêtin asîman û di xwastin xwe ji ereban rizgar bikin henar"*(Elî, 2015: 159-160) , ev jî qala wî demî dike ku gole bi xirapî li Seryas ketine û bune sedemê birîndarîya wî.Hewar dikirin kesekê jê bawer nedikir ev şere ji ber sedemê sîyasî û peydakirina pereyan çêbûye.

*" Îdrîs digot : Kurê we di vê zîndanê deye ku dimîne... Salek deh sal pêncî sal nizanim. Belku tiştek çêdibe wî berbidin. Belku tiştek din jî bi qewime li gel dilên din hemu bi hevre tîr baran bike... Ev welatê min û teye. Tiştên wisa zuzu çê dibe. Di pirekê*

*de biryarek tê hemu azad dibin. Di pirek din de jî emrek tê hemuyan dibin li dora qelê bi wan kolanê dikin yan jî di kujin. "*(Elî, 2015:  220) ,di vir de armanca Seryas ewe ku di encama şerekê de bi dîl tê girtin , ev jî ew demeye ku Muzefer  li pey kurên xwe di gera. Di rêya vî pasewanî re karî zanyarîyekê li ser kurên xwe bigire , eşkereye ku di wî serdemî de eger kes bi dîl bi hataya girtin.

*"Her du ji gelek ji şer acizbûn her dema behsa şer bi hataya kirin behsa ruyê wan kuştîyan jî dikir. Rojek ji rojan bi hevre li çîyayekî bur bun. Ez ne wisan bu ez zarokekî cengawe bûm. Şer di nava xwîna min de bû. aşiqê barot, fîşek û agir bûm "* (Elî, 2015: 238) , di vir de qala Seryas û hevalê wî dike , behsa wê dike ka çawe li çîyan jîyan dikirin. Mirov gelek caran di jîyanê de rastî westan û bêhêzîyê hatîye.

*"Ez ê di wî cihîde ji te re behs bikim, ku em di gundê biçûk de bum. Rojekê ew gunde valekir. Ji ber ku leşker û cahşan bi hevre êrîş kirin. Ji bîr neke hemu gund valekir. Mela ebas û xerman xanê ku dibin dayî û bavê min di wê rojê de hatin kuştin. Yanî ewan ez mezin kirim. Min jiwan re di got dayê bavo hemu tişt ne maye li bîra min. Wisan diyare ku xerman xan pêşî ku bê kuştin ji hemu kesekê re gotî bû: Ez qurbana we bim ew ne zarokê meye. Ew kurê şehîdaye em mezin dikin... Ji bo kurdan siqer buye ji bo kurdan agir girtîyê "* (Elî, 2015: 250) , di vir de qala Seryasê duwem dikim , di wî demê di zîndanê de bi kasetê li gel Muzefer  di axivî , ew jî behsa wê dikir ku şerekî pîs bû. Ev jî ji ber sedemê sîyasî ev şer çêbû , ev şere bu sedemê kuştima dayîk û bavê wî ku di rastîyê de ne dayîk û bavê wî bû. Tenê ji ber hestê kurdîtîyê ew zarok xwedî dikirin. Xermanşe jî di wî demî de di got agir ji ber kudîtîyê berdayê. Tê diyar kirin ku sîyaseta wî demî de ji ber tiştên gelek balkêş şer dikirin.

*" Wê rojê şerê navxweyî destpêkir. Min xwe ji bo şer amadekir. Min xwe wekî şêrê hindistanê didît. Bêhna barota roketê... Wisan bi min hat ku min teqandî bû. Di vî alî de çîrokên şer min ji bo hemuyan got. Dil şuşe bi bê bawerîyekê temaşeyî min kir ku ji bîra minçû "* (Elî, 2015: 265) , Seryasê duwem behsa xwe ji Muzefer  re dike. Wisan eşkereye ku bi destpêkirina şerê navxweyî yê kesan, xwe baş ji bo şer amade kirîne.

*" Dema min ew şer dikir ez pîs dibum. Ax Muzefer ê subehdem... Ax ew zilame bawer nakim hevdu bibînin... Hinek şevan ne peşîmanim... Min ne dikarî nebim xizmetkarê vê cengê. Nebim xizmetkarê wî serokî û ew serwerîya ku dida min û ji wan re got : Seryasê sibehdem fîşekê berde. Kurê qehban fîşekê berde...Serokê wan ji min*

*hesdikir, ewan ji wan hesdikirin ku wekî seyan ji wan hesdikirin"*(Elî, 2015: 277) , gelek ji wan kesan dibun xizmetkarê serok û jêr fermana wan de bû ,gelek ji van şeran ji ber sedemê ne fêmkirina sîyasî çê dibû.

"*Piştî seetek din cîhaz ji me re kirin û gotin : Eger hun ne zivirin cihê xwe.... Hizib wê we hemuyan sêdare bidin. Min bi dengekî girî ku hemu cûrê cîhazên cîhanê dengê min dibihîst û min hewar kir. Ez ê bi hemu hizban ve bimîzîm... Mîz. Guh bidin min, Hizib dixwaze me hemuyan di vir de wekî seyan bi kuje... Me çawe îşev serê wan birî. îşev ew jî wê serê me bibirin. Di vî şerî de kes bi wijdan nîne we fêmkir. We hemuyan jî şer dîtîye... Şevek tu êrîşî wan dikî û şevek jî ew. îşev wê we hemuyan bi kujin. Guh bidin axaftinê min. "*(Elî, 2015: 290) , bêguman eger tu birevî ji şer û hizbê wê hizib li pey tebe û te hertim bi şopîne ta te diruxîne. Ewê ku di vir de behsa van buyerên sîyasî jî dike, Seryasê duweme. Bi vî awayî behsa hizib û desthilatdarên wî zemanî dike.

*" Çend sal berê di girmîna cengê de, li cihekî dur min hêza xwe veşart. Min bihîst pêşmergeyek di sengeran de hewarê li yekê dike û dibêje: Ji Seryasê sibeh dem re bêjin bila hinek zexîre bêxin di pişta pîqabê de. Hewarekî nasyar bu. Lê belê min wisa fêmkir ku yek ji kurê min li wire. Piştî çend seetek din demê serde girtina pêşmergeyên min hat. Ciwanekî zirav, xemgîn û rih dirêj hat li ber devê min û got : Serok, navê min Seryasê Subehdeme, mezinê min ez dixwazî daxwazîyekê pêşkêşî te bikim. Min bibe bereyê herî pêş û alîyê ku ceng herî zêde lê heyî. Ciwanekî ciwan û bê hêvî bu. Min ew wekî kesekî sar dil req û bê rehim naskirî bu. Hinek mabu ez dest bavêjim milê wî û wî maç bikim. Hinek mabu ez li ber runim û pêlava wî bigirim û bêjimê bibore "* (Elî, 2015: 374) , ew li gorî pêdivîyên şer çuye û xwe bi temamî ji cengê re amade kirîye. Ewê ku bixwaze xwe bêxe diçavê serok û mezinê xwe de, wisan dike ku cihê lingê wî diyar be di hemu şer û lêdanî sîyasî de. Ji ber vê jî Seryasê dem daxwaz ji mezinê xwe kir, wî bixe di berîya pêş a cengê de.

### 2.1.3 Rolê Bandorîya Aborî Li Ser Avahîya Derûnîya Karekterên Di Romana (Diwahemîn Henarî Dunyayî) Bextiyar Elî De

Bêguman bandorîya aborî jî di rewşên cuda bandorîya xwe li ser dorîya kesan dike. Bi şêweyekê wisan li wan dike ku di dema bazarê de helwestên cuda cuda nîşan bidin. Ji ber vê jî em dikarin du alîyan diyar bikin. Belku bandora wê hebe li ser samanê aborî. Ew jî evên li jêr me dayîn diyarkirinin.

"*A- Samanê Aborîya Derketîy.*

*B- Pêwîstîya Aborîyê bi pêşketinê ، di vir de ev herdu cîyawazî dibin sedemê çêbuna pirsgirêkên aborî. Yan jî bi sîstemekdin aborî hatîye danîn. Pirsgirêka aborî bi vê lêk tê dayîn ku dijî yek cîyawazîya wan hene. Yekem :Dawî û kêm, ya duwem jî : Berbi zêdebunê ve diçe û ne ya dawîye. Ji ber vê jî zanayên vê sîstemê di bêjin samanê aborî nikarin hemu pêwîstîyên aborî yên cuda têr bike. Ev jî dibe sedemê pirsgirêka aborî û bi wateyek din dibe sedemê nebûna pêwîstîyên aborî* "(Qadir E. M., 2014: 5) , ev her du rewş jî bandorê li ser bazarê dike , ev jî wisan dike ku pirsgirêk bikeve di nava derûnîya kiryar û forşgeh de. Li pey çareserîya vê pirsgirêka aborî bi gerên.

Di derbarê aborîyê de pêwîste em derûnîya bazirgana destnîşan bikîn. " *Radibe lêkolînê li ser berhem û kelupelên ku herî baş kiryar dixwaze dike. Herwisa jî çawe razîkirina kiryar û kêşana wî ji bo kirîna kelupelan. Zanîna van sedemên derûnî yan ku bandorê li ser kesayetî û kiryar dike ewe ku tu propaxanda û wan agahdar bikî ji bo kelupelan.* " (Qereçetanî, Derwazey Derûnzanî, 1996: 4) , ji ber vê jî pêwîste van sedeman diyar bike ku bandorê wan li ser derûnîya kiryar dike.

“ *Herwisa bazirganê cengê jî bi heman şêweyîye , di demekî kurt de pereyek gelek bi dest tixe. Di vê bawerîyê deye êdî rastî nebûn û hejarîyê nayê* “ (karîgerî nest yaxud kesêtî serkewtu, 2015: 72), bi vê wateyê ew wisan hîsdikin ku êdî gehişine armanc xwe. Wisan dizanin ku êdî rastî pirsgirêkên darayî nayên.

Di vir de pêwîste em pirsyarekê bikin. Belê ew ê kengê hewildanekê bikin ji bo aborîyekî bilind ? Bi şêweyekê di hizrê wan deye bi gehin astekî bilind ? Bersiv bêj ji mere dibêje: " *Na, hîna ev roj ne hatîye bîra me* " (karîgerî nest yaxud kesêtî serkewtu, 2015: 133) , derûnîya mirovan li gelek deman de ne dicih deye, wisan na hizire ku rojek ji rojan wê aborî bikeve astekî bilind de.

*“Em di her karî de xeyalê adem û şerê yek dikin serketî nabîn... Eger kesekî serkeftî be wê serkeftina xwe di xeyalê xwe de çêbike* " (karîgerî nest yaxud kesêtî serkewtu, 2015: 149), ew kesê ku di pêşîya hemu karekê de wisan di xeyalê xwe de danî ku di gehe encamê, dikar di alîyê aborîya xwe de jî bi gehe astekî bilind. Bêguman ew ê serkeftinê bi dest bîne. Lê belê eger di xeyalê xwe de wisan çê nekiribe ne gengaze ku bi gehe encam yan jî serkeftinê.

Gelek kes hene wisan hîs dikin ku di aborîya xwe de na gehin pileyek bilind. Ji ber ku " *Ewên ku gelek kes di jîyana wan de pêşnakevin ew nikarin vî karî encam*

*bidin. Belku sedemê vê ê serekî jî ewe ku ew xwe kêm dibînin, xwe wisan nizanin ku di jîyanê de bi gehînin cihekî bilind. Ev kes tenê li gel wan kesan tamê ji axaftinê werdigirin di alîyê aborîyê de wekî xwe bin "* (Dayir, 2004: 29) ,ew cûrên kesên bi wî awayî wisan ji derûnîya xwe fêmkirîne ku nagehin asta bilind , ev jî ji ber ku wisan dide fêmkirin ku nikarin wî karî bikin. Wisan hîs dikin di derûnîya xwe de di gehin asata bilind , ev jî yan li gel kesên aborîya wan bilinde di gehin asta bilind. Wê demê dikarin hest bi mezinbuna xwe bikin di nav xelk û derûnîya xwe de.

Ya ku mayî em qala wê bikîn, hinek sedem hene dikare wisan bi derûnîya kesan bike ew hest bi xweşîyê bike. *" Du hêze : Meyla lezetê û xwe ji nerehetî û bihêztirîn matura jîyanê parastin , ewên ku reklama bazirganÎyê çêdikin. Ew baş dizanin ku nîşa xelkê bikin da ku bên tiştan bikirin, ew dizanin dema xelk tiştekê zêde dikirn û propaxanda wê berhemê jî dikin, yan jî wisan nîşan bide ku kirîna berheman derd û êşan kêm dike "* (Rabînis, 2006: 38) .

*" Komek kes eger ji çîna navend be dikarin pêngavan bibînin û bibin xwedîyê baştirîn berheman jî. Eger serokekî baş wan rêve bibe di heman demê de baştirîn dest yan jî grupên li ber hev sekinin hildiweşin. Eger serokê wan lewaz bû nikarin karkirinê di derûnîya wan de bicih bike "* (Kurtiwa, 2001: 17) , eger kesekî serkeftî serpereştîya komek kes bike wê demê ew ê bikarin astekî baş ji bo wan bide avakirin. Lê belê eger kesekî xirap bu bêguman barê derûnîya wan cihgir nabe, bandorê li ser jîyana wan jî dike.

*" Ez dikarim kurekî ciwan bînim li pêş çavê xwe ku di bazarekî mezin deye. Di nava dengê hezaran maşînan deye.Di nava qêrîna sedan firoşyaran de ku sêvi pîvaz, tivir û firingîyan di firoşin û pesnê ciwanîya berhemên xwe dide"*(Elî, 2015: 98) ,êdî wisan bu destkeftîyên jîyan û razî buna jîyanê wisan lê hatî bu ku tu êdî wan tiştan gelek xweşik bidî diyarkirin da ku tu pereyan bi dest bixî. Ji ber wê jî Seryas di bazarê de bi vî awayî tiştên xwe di firoşt.

*“ Wê salê Seryasê sibeh dem sîneya kejalî kirîye.Di êvara destpêkê de destgirana Seryas, yekemîn êvara cengêye jî li gel polîsên çavderîya şarewanîyê bû. Ew jî yek ji wan hezaran destgirtina bu ku beyanîyan zu bi erebê dihatin nava bajêr peya dibun. Roja yekem a karkirinê rojekî tarî bu. Di wê rojê de destgirtan polêsek li cem run firoşan kuşt "*(Elî, 2015: 100) , behsa wê rojê dike dema ku Seryas ji bo pêdîyê jîyana xwe erebaneyk kirî  da ku bi wê kar bike. Dur be ji hemu pirsgirêkan. Sedemê

kuştina wî polîsî jî wisan fêmkirin ku bi xeletî çêbuye. Lê ew ji bo bi destxistina pereyan dihatin şer bi xelkê re dikirin.

*" Ew ji cem şîrê zarok firoşan anîn pişt hêsingeran. Run firoş jî ji pêşîya mizyeftê ta nêzikî meydan mirişk froşan dur xistin. Ew bu neynik firoş nêzîkî qeyserîyê kirin.Derman froş jî ji ber pîstîya di nava bazarê de cihê wan bir nava bazarê kir hevalê prtûk froş û wêne firoşan. Ew ji hemu alîyan ve xwe amade kirîye ji bo revandina erebana xwe. Bi dehan kolanên kevin û depoyên vale, hewşên xirap kir cihê veşartina xwe. "*(Elî, 2015: 113) , bêguman ew karê ku Seryas kirî karekî cîyawaz û çav netirs bu.Ev jî ji bo yekxistina aborî û bazarkirina wî serdemî bû. Dikarî di demekî kin de hemuya kom bike. Bixe bazarekî kerkeftîya wî demî. Da ku xelk hemu di yek cihî de kom bibin.

*" Serdana wî ya wê şevê ji bo xwedîyên ereban buyerkî balkêş û ne xwestek bu. destgiran jî dizanî ev cûrê ciwanan wekî heywanan temaşeyî wan dike , wê şevê li ber agir rojname nivîsek axaftin li ser samanê çandinîyê û berhemên ajalan di kir. Seryasî jî behsa samanê mirov û ew serwetê bi hezaran zarokan kir. Di çar salîya xwe de ji bo peydakirina nan diçun ser çupan "* (Elî, 2015: 114-115) ,Seryas ev jî ji bo rojnamenivîs eşkere kir pêwîste di destpêkê de qala samanê kes bê kirin û piştre jî yê giştî. Ji ber ku di nava bazarê de her tim şerê wane. Ev jî wisan kirî bu ku peydakirina nan û pêdîvîyên jîyanê gelek giran bibe ji kesên di nava civakê de.

*" Di wir de jî destgirtin ( Harac ) jî behsa derdê dilê xwe ji bo Seryas dikirin. Ewên ku erebe di firoştin bi temamî bazar li gel wan dikir. Ewan evînî dikirin name li ser nameyan ji bo hev dinivîsin. Destgirên nu jî dihatin li cem Marşal. Seryasê mezin bi polîs û çavdêrên şaredarîyê re rêkdiketin. Pereyek baş didan kenasan da ku cihê pîsan paqij bikin. Ji wan zarokan gelek aciz dibu ku yên ne dizanî jîyan li gel leşkerên ereban de çîye... "*(Elî, 2015: 232-233) ,ev karê Seryas jî ji bo wê bu ku da karê aborîya hemuyan baş bibe. Bibin xwedîyê sermayekî baş da bikarin karê xwe bikin. Derûnîya wan jî pêwîstîya wan bi vî cûrê karaye.

*"Bisekine Muzefer tu dizanî Sîneya kejal çîye ? Erebana biçuk bi destê xwe ji bazarê kirî. Di wir de biryara çêkirina encumena erebanekan daye. Di wir de biryara cengê dabû li ser navê hemu destgiran û zarokên biçuk yên di nava bazarê de. Biryar dabu sîyasetê neke û di şerê navxweyî de jî li dijî hemu alîyekê bi sekine. Namayek ji bo destgiran nivîsandibû di rojên teng de nirxan zêde nekin. Ev amojgarîye dabu*

*destgiran eger bazirganên mezin nirx bilind kirin hun jî ji wan tiştan nekirin. Gotîbu şîr firoşan jî ji her 50 qutî şîr yekê bidin zarokên koçberan. "*(Elî, 2015: 259 -260), Seryas dem bi rêya kasetê ji Muzefer e dibêje :Seryas ew berjengane hebu. Ewe ku Seryas jî di jêr navê wê debû, xelk di demê şerde rastî rewşên wisa neyên. Pere zêde bi tiştan bidin û bibe sedemê bêzarîya ji jîyanê. Ji ber wê jî rica ji xwedîyê erebanakir bi bilindkirina bihayê tiştare razî nebin. Eger hatu ewan biha dîsan bilind kir hun xwedîyê erebana û destgiran dîsan wekî rojên berê tiştên xwe bi firoşin. Da ku xelk di jîyanê de rastî nexweşîyan neyê.

*" Kesê ne dizanî eger Seryas bimaya wê çawe bi jîyaba. Adem û mercan got : Kurek bu hertim xwedîyê mizgînîya bû. Dixwest piştî çend salekê erebana xwe bi firoşe here wî alîyê bajêr bibe pırtûk firoş... Karê herî xweş li cem wî pirtûk firoştin bû , yek hêvîyek ya wî jî hebu rojek ji rojan bibe xwedîyê vîdoyekê, ji bo filîmên nu temaşe bike "*(Elî, 2015: 152), wisan diyare ku çipişeyê heskirinê be yan jî pirtûk firoş be ev hemu dibun sedemê derûnîya Seryas aram bibe û heskirnê çêbike ji van îşan re.

*" Du caran di astekî zîrveyek bilinde hat xwar. Şaderyaya sipî û Lawlaw jê derxist. Ajokar ji me re got : Ez ê du qat pere ji mirdwan bistînim... Çar sale ez di vê rêyê de kar dikim ev zagona mine. Ji ber ku hemu ajokarê terektorê mirîyan nabin... Ez bi şertê îzraîl kar nakim ku bi lez mirîyan dibin asîman "*(Elî, 2015: 167), ev jî behsa wê dikin dixwestin Seryas bibin cem duhemîn henara dunya. Ji ber vê jî di vê şevê de ketine rê ji berîya mirina Seryas da ku bi gehe hêvîya xwe. Li cem wê darê bi xakê bisipêrin. Ji ber wê jî neçar bûn ku wê terektorê bigirin û Seryas bibin cem darê. Eşkereye ku kesek karên bi vî awayî bi lez nake. Ji ber bi destxistina hinek pere vî karî dike.

*" Di wî demî de jîyan ji bo karekî balkêş cuda kirîbû. Karekî di yek demî de gelek nêzîk û gelek durjı bû. Her du jî li ser du mekîneyên kevin cil û bergên bukanîyê didurîn.Ya ku li cem min balkêş bu ew bu ew her du xuşk cilên sipî yên bukanîyê nebin qet cilek din çênakin. Rojekê di dibistanê de ji boxwarina durmeyan cihek veqetandîbûn, qumaşekî mezin danîbun. Her kirasê ku temam dikirin wekî wêneya dixistin nava zerfekî taybet. Di dawîya mehê de dema diçun muçeya xwe bistînin diçun ser gora Mihemedê dil şuşe. Kirasên xwe jî didan çend dukandarên taybet "*(Elî, 2015: 208), di vir de armanc xuşkên sipîy û çêkirina wan cilan û pişeya mamostayan bû. Ji bo bi destxistina pêwîstîyên jîyanê û aborîya baş vî karî dikirin. Ev jî derûnîya wan a

kar aram dikirin. Guh ne dida wê rojek ji rojan xelk axaftinê li ser vî karî bikin. Bêguman ev jî gelek asayî di civaka roja meya îro de, keçek ji bo xwe kar bike. Civakên pêşîde belku karkirina keçan ne wekî ya niha asayî be , ev jî bi hizirîna civakê re dibe.

*" Li wir sifir firoşek guh nade çi tiştê cîhanê. Guh nade sitiranên zeman û têkçûna zemînê. Kesek hertim li pey komkirina sifir û bafona da digerîya. Hinek din jî eger paşayê wan bimirin ew jî tim li pey xwe dikevin. Gelê wan her çiqas bi kevin û serbikevin jî lê ew her dîsan jî li pey leyîstoka xwe de digerin. Kar dide wan hersê zarokan , dikarin di mehekê de samanekî mezin kom bikin "*(Elî, 2015: 142-143), hinek kes ji bo bi destxistina pereyek kêm yan jî zêde jîyana xwe têxin di nava metirsîyan de. Dest bi komkirina bermayên şer diki. Ji ber wê jî behsa xeletîya sê zarokan dike. Li gorî gotinên zilamekê : Sê zarok diçim wan cihê ku şer lê qewimîne, guleyên hewanan yên ji bermayê wan mayî komdikin. Gelek encamên xirap ji vê derdikeve û bandorîyek xirap û mezin li ser derûnîya wan çêdike.

*" Min ne dît kurê melon banî me dike, Guh daye hemu gotinên me. Wî bi dengê bilind got : Ew berhemê mine. Yê bapîrê mine, berhemê Nedîmê Şazdeye ku bapîrê min di kuşka pehlewîyan de pileyekî bilind hebû... Şahenasê îranê nasnavê şahenşane. Ew nasnavê bi min re diyare şahenşaê îrane. Ew î ev nav daye xêzana me... Dibêje : Ji wê rojê ve me ew nasnav girtîye. Heywanê me sê qat heywanên din bi şîrtir bû... Min got : Kurê melon... Taqeta min nîne ez goh bidim direwên te. Tenê dilê min bi gotinên vî kurî vedibû "* (Elî, 2015:  263), nedîm hevalê Seryas bû , her wî wisan kir ev dara hinarê çêbibe. Dibin vê darê de peymana hevaltîyê mor kirin.Ji ber wê jî dibin vê darê de behsa aborîya serdema bavê xwe dikir. Eşkereye ku çi di kevin debe yan jî di niha debe çandinî destkeftîyên xelkê gunde. Ev jî wisan kirîye ku destkeftîyên baş ê aborî bi dest wan bikeve. Di sedemê ku berdewambin diçandinîyê de û berhemên xwe bibin di bazarê de bi firoşin.

## 2.2 Xesleta Derûnîya Karekterên  Di Nava Romana (Diwahemîn Henarî Dunyayî) Bextiyar Elî De

Eşkereye ku di serdema roman nivîsên hevçerx de. Nivîskaran herî zêde li ser eşkerekirina tiştên veşartî yên di singê kesan de di sekinî. Bêguman di romana Duwahîm Henarî Dunya a Bextîyar Elî de jî li ser xesleta derûnîya karekteran sekinîye.

Emê di lêkolîna xwe de herî zêde hewil bidin diyartirîn mînakên li ser xesleta derûnîya romanê derbixîn holê.

### 2.2.1 Karekterê Geşbîn

Ew karektereye ku her dem di jîyanê û karê rojane ê mirovan de bi hêvî û xwedî hizre. Ev mirov bi çend goşeyên nîgarên cuda temaşeyî jîyanê dike. Di alîyê derûnîyê de jî hertim pêşbînîya tiştên baş dike. Bi wateyek din kesekî bê hîvî û ne reşbînîye di jîyanê de. *" Hêvî û geşbînî, her du jî pêwîstîya wan bi ruhê mirovan heye. Hewleke ji bo zalbuna bi ser hestkirin û karê xusar û şewitîna derûnîyê. Ji ber ku tenê rêya çareserîyê ye ji bo mirov û civakê "*(Nesreddîn, 2013: 341).

Di vir de emê çend pênaseyên Geşbînîyê eşkere bikin

Enwer, dibêje **:** *" Geşbînî dibe hêvênê berg xistina hêzê, bi hêzkirina guhertina cane û pêşdeçuyîna mirovane"* (Mustefa, 2007: 9).

Can bocun, dibêje **:** *" Bêyî geşbînîyê tevger çi suda wê nîne "*(Mustefa, 2007 : 13).

Martn Slîgman, di pirtûka Fêrbûna Geşbînîyê de dibêje **:** *" Jiyanekî taybet , pire ji hêvî û durxistine ji bêhêvîyê. Jîyaneke hemu wextek tê de beşdar dibî"* (Palewan, 2015) .

Enwer dibêje**:** *"Geşbînî wê tiştê fêrî me dike ku em bi çavekî heskirî û bi bawer temaşeyî tiştên derdura xwe bikîn"* (Mustefa, 2007: 14).

Li gorî pênaseyên ku me li jor dayîn diyarkirin, eger li gorî wan be mirov di gehe wê xalê ku di jîyana xwe de hertim bibe xwedîyê derûnîyek aram. Hest bi acizîyê neke. Sedemê van ê serekî jî geşbînîye. Hertim geşbîn bi di jîyanê de da ku hertim serkeftîbin . Dur bin ji rexneyên di nava civakê de.

#### 2.2.1.1 Girîngî Geşbînî Di Jiyana Mirovê De

Eşkereye ku geşbînî sedemekî girînge ji bo berdewamîya jîyanê. *" Tovê hêzêye di can de di çîne. Dernonîyê aram û sing jî fireh dike... Lewazîye bihêz dike... Bihêz bihêztir dike.êş û janê kêm dike... Mirovan disekînîne beramber buyer û pirsgirêkan. Eger wisan be geşbînî hêvên bextewerîyê ye di jîyana mirovan de. Çi dema ku geşbînî nema reşbînî cihê wê digire "* (Mustefa, 2007: 10) , eger mirovek di jîyana xwe de bi geşbînîyê re biçe wê demê ew ê bi gehe hêvî û armancê jîyana xwe. Ji ber wêjî pêwîste

mirov di jîyanê de hertim geşbînî be ne reşbînî be. Ji ber ku reşbînî dibe sedemê têkçuna hemu hêvîyên di jîyanê de.

Em dikarin bêjin : Geşbînî, hêvî *" Hêzekî ruşenge di singê mede xweşîyê bi me dibexşîne. Hêvî jî li ser xweşîya jîyanê û amadebûnê berdewame. Ew jî ji bo pêşketina guherînan di zemanî de. Bi vî awayî du rê di pêşîya medeye. Yan pêwîste em jîyanê bi hêvîyan hilbijêrîn yan jî bîyanîya mergî. Ewên ku hêvîyê digirin bawerîya wan bi jîyanê heye. Di hemu deman de hêza pêşketin û guhertinê heye. Ewên ku kîn û kavilîyê di hilbijêrin ew bê bawerin û qet xweşîyekê di jîyanê de nabînin "* (Nesreddîn,2013: 342), wekî ku me di pêşîyê de jî eşkerkir ew kesên ku geşbînîyê di jîyanê de dikin berdewam hest bi xwşîyê dikin. Ew kesên ku reşbînîyê di jîyanê de dikin berdewam hest bi nexweşî û bêhêzîyê dikin.

*" 21 salên di zîndanê de ez kirim wekî koleyekê... Di wan 21 salan de tenê kesekê name ji minre dişand. ew jî di kaxezekî biçuk de dinivîsî. Dema ez hatim ji derve serdemek din bu. Tu di xweştirîn rewşa jîyanê de dijî "*(Elî, 2015: 6) ,ew ji hevalê Muzefer bu, hertim ji bo Muzefer geşbînî û hêvî dixwest. Wisan lêkir ku aram girtina wî zêdetir be di zîndanê de. Wî jî wisankir ku geşbînî li cem wî çêbibe.

*" Hinek şevan jîyana xwe di guhere bi bêhna hinarekê. Di nivê şevê de radibu didît ku tenê bêhna karçikan ji malde tê.Balkêştirîn tişt ewe ku di çolekê de yek avê ji tere bîne. Bi wê avêre dizane cîhan maye. Bi wê avêre dizane derya heye pêlên wê heye... Yakub bîne pêş çavên xwe. Ji berîya ku ez her roj avê vexwim seetekê bêhn dikim. Kî dibêje avbêhna wê nîne "*(Elî, 2015: 62-63) , Ji ber wêjî Muzefer ê Subehdem geşbînîya xwe di avê de dîtîye. Wisan zanîye ku bi wê avê jîyan maye û berdewame.

*" Min gelek şevan hewar dikir: Raste min dost nîne. Hevalê min nîne. Qet cihek nîne ez berê xwe bidimê. Lê belê pêwîste berhemek bigire. avek bigire. Şikevtek pêwîste min bigire nava xwe û min ne derêxe. Ez tenê li ser defteram mirîme. Tenê ji ber wan zagona mirîme ku hukmê cîhanê dikin. Ez ji ber gencîneya xwezayê ne mirîme. Di vê gerdunê de para min jî heye... "*(Elî, 2015: 84-85) ,Ji ber wê jî Muzefer dizîndanê de bawerîya wî bi ji derveyî zîndanê jî heye. Ew jî xweza û geşbînî û jîyane. Li gorî yên baş başî di baweşa xwe de digirtin. Bi taybet jî xweza, nabe sedemê êşan. Ew jî tiştekî başe ku mirov baweî bi xweza û hêvîyan hebe. dirêya xwezayê de bê hêvî nebin.

*" Vaye ez çend sale di şevan de xwenekê dibînim... Girtîyekê azad dikim, muçeyekê ji bo pîrejinekê peyda dikim. Rêya geranê ji bo ciwanekê dibînim. Kesekî*

*serbi hêza din di veşêrim. Her tişta ku wateyek ya wê hebe dikim. Bila tiştek di van şevên tarî de arîkarîya min bike û min nehêle bi tenê... Tiştek wisan be ku ez hîs bikim dijîm... Piştî raperînê ez tim bi tenê me "*(Elî, 2015: 105) ,piştî azadkirina Muzefer , ew hevalê ku behsa wan tişt û jîyana xwe jê re dike. Di demê burî û niha de dike. Ew wisan hîs dike ku jîyan bi alîkarîdayîna kesan re ciwane. Di jîyanê de hêvî wekî alîkarî dayîna kesan dibîne, ev jî tiştek başe.

*" Ew êvara ku Mihemedê dil şuşe derdikeve ji derve, bawerîyek mezin bi firseta jîyana xwe heye. Hêdî hêdî baran jî destpê dike ew jî bi mifteyên xwe re dilehîze. Baran dibare lê ew her li ser lehîstika xwe dibîne "*(Elî, 2015: 18-19) ,ev jî di wî demî deye ku xelk hemu ji ber lêhîya baranê di revin. Lê belê Mihemedê dilşuşe baerîbi geşbînîya xwe dike û ev mifteyên di destê wî de mifteyên bextewerîyê ne...!

*" Cara destpêkê Seryasê sibeh dem hinara şuşe ji berîka xwe derxist, Ji Mihemedê dil şuşe re got, Ji zarokatîve ev hinar li cem wîye. Nizane çîye û wateya wê çîye. Lê belê tiştek fêrbûye nabe dest ji wê hinarê berde. Nabe di cihde bihêle û wenda bike "* (Elî, 2015: 136) , tê eşkerekirin ku Seryas hevalekî nêzîkî Mihemed bû. Behsa vê hinarê ji Mihemed re kirîye. Geşbînîya jîyanê û hêvîya jîyanê ahevlên xwe di vê hinarê de dibîne.

*" Mirov hemu bi kurî ji dayîk dibin... Hemu mirov li ser vê sitêrkê ye... Qet kesek nîne ji dayî bibe cîhanê bibîne. Yên ku çavên wan heye dikarin bibînin. Di cîhanê de qet tiştek ji dîtinê zehmetir nîne , mirov dikare du çavên geş û runî hebe lêbelê qet nebîne... Nedîmê Şazdeyê biçûkê min, Ez nikarim alîkarîya te bikim. Lê belê ev hinare dikare arîkarîya te bike. Pêwîste tu wê bawerîyê di xwede çêbikî ku ev hinar ne wekî hinarên dine "*(Elî, 2015: 139-140) , ne şerte ku mirov du çav hebe, bi wan geşbînîya jîyanê û hêvîya jîyanê derbixîne holê. Ji ber vê jî Seryas wê hinara ku li xem nedîm wisan lê dike ku êdî netirse. Hêvîyê di jîyanê de bi rêya vê hinarê çêbike.

*" Eger rojek ji rojan da ez li zîndanê derbaz bibim dê biçim ji bo welateka din û li wê derê bi zewcim û navê xwe bi guherînim... Muzeferî Subhede eger li zîndanê werim derbazkirin dibe karek bike ezê dernekevim "*(Elî, 2015: 295) , Seryasê duwem ew axaftinên ku bi rêya kasetê ji bo Muzefer şandî, êdî wisan di hizire ku wê ji zîndanê rizgar bibr. Hêvîya wî ewe ku demaazad bû here welatekdin dest bi jîyana xwe bike. Dur be ji kesên xirap û dibe kesekî cuda... !

*" Diwê lutkeyê de min cîhan dît. Min bêhna wan xwnan kir ku ji wan çîyan dibarîn. Di wir de min peymana heta heta nivîsî. Hercihê ku ez çûmê ez dawî dikim, heya ez dimirim ezê nêzîk bibim. Her cihê ku ez çûmê ez ê çîroka Seryasan li gel xwe bibim "*(Elî, 2015: 346) , ji ber wê jî Muzefer biryar dabû here cem wê darê. Ji alîyê Seryas ve wekî dara hêvîyê hatibû naskirin. Ew dar jî dara hinarê bû, bi heman awayî jî Seryasan di wê dara jîyanê de bext xweşî dîtîye. Li gorî wî ev darae dibe sedemê hêvîya jîyanê û xweşîya jîyanê. Ji ber vê jî bi heman şêweyê Seryasên din jî wî jî biryar dabû peymanek bê dawî li gel Seryasê sêyem mor bike. Hêvîya jÎyanê li gel Seryasê din jî çêbibe û bawerîya jîyanê di wî de çêbibe.

### 2.2.2 Karekterê Reşbîn

Ew kesin ku berdewam di jîyana xwe de hest bi reşbînîyê dike. Ew wisa dizanin, eger dest dirêjî tiştekê bikin nikarin wê tiştê bi dest xwe de bînin. Ev hizirînekî xelete, Ev cûrên kesan jî wisan dikin ku bi awayekî reş berbi jîyanê ve biçin. Gelek caran reşbînîya wan cûrê mirovan wisan dike ku di hizrê wan de kesên dewruberê wan jî wê di rojekê de ew jî reşbibînin. bêguman ev jî bandorîyekî xirap li ser derûnîya wan kesan çêdike.*"Mirovê reşbînî ew mirovin ku di beramberî hemû karekê de şikestîye, hêza kurbûna di kar de nîne, derîyê bi destgirtinê jî li ser pitşa wîye "* (Nesreddîn, 2013: 341) , Kesên geşbînîyê dikin di jîyana xwe de hertim hest bi xweşîyê dikin , reşdîtin beramberî her karekterekêde bêhêzîye, ew ê di jîyanê de hertim di cihê xwe de bimîne berbi pêşve naçe .

*"Ew mirovê ku jîyana wî ji dirindeyî,hêrs, nexweşî û rikberîyê pêktê, bixwe bi destê xwe jîyana xwe di ruxîne. Ji ber ku ev fikre berbi nefsê ve diçe piştre jî bandorê li ser tendurustîya wî bi giştî dike "*(Nesreddîn, 2013: 343) , tê wê wateyê ku her mirovê ku di jîyana xwe de ev alîyê xirap hebe ew raste rast rastî reşbînîyê tê. Bandorekî xirap jî li ser derûnî,tendurustî û jîyana wî dike.

*" Reşbînî derdekî kuştînîye, dema ku bal bi ser kesekê bibe jîyana wî kesî xirap dike. Di heman demê de cîhanê jî li ber çavê wî reşdike. Derîyê hêvîyan jî li ser wîdedigire. Wisan lê dike ku başî û xirapîyê ji hevdu cuda neke, jîyana xwe û ya derodura xwejî xirap bike*" (Mustefa, 2007: 10) , eger wê kesê ruberwya reşbînîyê be, wisa lê dike li jîyana xwe karên baş û xrap nehête cudakirin, ev jî bandoreka xirap li ser derûnîya wî dike.

Ji ber vê jî em dibînin *" Dema kesek ruberuyê reşbînîyê were teng dibe, çûkên wî dikeve , şepirze dibe û bê hêvî dibe. Hemu derîyên jîyanê ji xwe re wekî girtî dibîne. Dema rastî pirsgirêkekî biçûk jî were, lê belê ew kese wê pirsgirêkê gelek mezin dike. (Mejîyê Wî Dike Gayek )Wisan hîs dike ku her tişt li dijî wîye. Kesekî bêbext û bê çareye. Ev nexweşîye wisan dike ku hertim di alîyê derûnîyê de nîşanên xirap jê derkeve "* (geşbînî û reşbînî, 2015) , Kesên reşbînîyê dikin hertim di jîyanê de hest bi nexweşî û êşan dike. Ev jî bandorekî xirap li ser derûnîyê çêdike.

### 2.2.2.1 Pêwîste Em Çend Pîvanan B idin Destnîşankirin Ku Sedemeke Ji Bo Nubuna Alîyê Reşbînîyê Ew Jî Eve:

*" A -Bawerîya wan bi berdewamî û dawî ne hatina buyeran û pirsgirêkên nexweş : Kesê reşbînî be rastî pirsgirêkan tê û karesat jî bi serde tên. Heritm berdewam dibe û dawî lê nayê. Gelek caran peyvên wekî, ez bêbextim,seruçavê min sezadare bikartîne.*

*B -Giştî girtin î Firehkirina Pirsgirêkan : Kesê reşbînî be gişt girtinê dike hemu alîyên jîyana xwe di nav de digire. Peyvên ku herî zêde bikartîne evin; Hemu zordarin, Jina baş di navde nîne, Ewrupî ji hemuyan xiraptirin....hwd.*

*C - Niviskirina pirsgirêkan li ser hest û derûnê : Kesê reşbînî be hemu hest û derûnîya wî tevlî pirsgirêkan dibe. Bêgoman ev jî sedemekî girînge ji bo rastî reşbînîyê bê û têkçûna alîyê derûnîyê"*(Mustefa, 2007: 19-20) , Ji bo balkişandina ser van her sê xalan mirovên reşbînî serkeftî nabin di jîyana xwe de. Ji ber vê jî pêwîste kesên reşbînî dest ji vê berdin êdî bêbextî û bê hêvîya jîyanê bihêlin. Dest bi geşbînî û bawerîya jîyanê bikin.

*" Gelek pêwîste ku heya fêr dibe li gelel min biaxive. Divan 21 salan de fêr dibe ku hunerê axaftinê li gel min bi şêweyek dine... Axaftina li gel min ewe ku her dem li benda bersivdayînê nemîne. Bi axive û guh bideya sade "*(Elî, 2015: 8) , bêguman 21 salan di zîndanê de dimîne û zîndana wî jî ji xakekî lîmî be,hêvîya wî a azadîyê nabîne. Ji ber vê jî reşbînî buye divê jîyana ku têde dijî , li gorî wî axaftina li gel min bê encame. Bêguman kes nikare axaftinê li gel min bike. Di vir de xwesteka wî a li ser çûlê ew bû ku kes nebû guh bide daxwazên wî, ji ber vê jî bê hêvî bû.

*" Di beyanîyekê de ez rabûm min di nava nîgarê xwe de winda kirî bû... Her sala ku diçû min kêmtir hizir dikir. Ji ber ku di dawîyê de min ne dizanî ez hizra çi dikim. Hizirîna min ne şêweyê wê hebû ne jî pêşkêşkirina wê. Ya ku min dixist hizirînî*

*ew bu ku tişta ez li pişt xwe bi hêlim. Ez wisan di hizirîm ku ez mirîme û her kesê ez ji bîr kirîme* "(Elî, 2015: 14) ,ji ber ku kesekê tenê di zîndanê de be di cihekî lîmavî de , guman têda nîne reşbîn dibe di hizirkirin û dozeweya zaroka xwe û hîvî û umêda xwe li cem xwe kêm dibe.

*" Ez ne li benda wê bû Seryasê subeh dem bibînim. Min wisan hesab kirîbû ku heta dawî ez ji vê çulê dernakevim... Min qet tiştek di derbarê ji derve ne dizanî. Mayîna zarokek bê dayîk û bav di serdemekî wisa dijwar de "* (Elî, 2015: 53) , ji ber vê jî zindan wisan li mirov dike di demekî wisa dijwar de mirove rastî reşbînîyê tê bawerî bi jîyanê û dewruberê xwe namîne.

*" Îkram bi hêdî got : Di piştî raperînê de ez wisan hîs dikim heyîna min nîne... Di destpêkê de min xwest ez bixwînim. Ez herim cûrek dindestpê bikim. Lê belê zehmete ez bi cûrek din destpê bikim... Muzefer ê Subehdem qet tiştek ji wê zehmetir nîneku tu nu destpê bikî. Ez şevan li ser banî di razam.Wêneyê wan dar û malan hertim di vêda min de bû... "* (Elî, 2015: 105-106) ,Îkaram hevalê herî nêzîkî Muzefer bû , behsa raperînê ji min re dike , eşkereye ku di nava gelê kurd de piştî azadîyê gelek ji wan reşbînî dibu, destpêkirina jîyanê êdî zehmet dibe , demekî gelek di xwaze heya wekî caran jîyana xwe sazbikin.

*" Heya ku mirov girtîye jîyan wateyek xwe a girîng heye. Qet tiştek wekî dlî û koletîyê wateyê nade jîyanê. Ji ber ku mirov di wî demî de di şerekî yê azadîyê deye. Lê belê qet tiştek jî wekî azadîyê wateya jîyanê naxe di nava metirsîyê de "* (Elî, 2015: 210) , her reşbînîyek pêve diyare piştî zîndanê azadî ji bo mirovan wateyekî temam namîne. Bi vî şêweyî pêwîst nake ku mirov ji bo azadîya xwe hewilbide, serdemekî wisa di zîndanê de birîbe serî.

*" Pişta xwe dayê û digot Muzefer ê subehdem bi axive , çîroka xwe bêje; Min hemu çîroka xwe got. Ji bilî bendewarîyekî dur û dirêj mirn qet tiştek nîne. Çîroka te ji serî heya dawî ji hêvîyek reş çêbûye. Di sekinî û di got... Tu dixwazî yek gelek salan di bin zilmê de ji bo hêvîyên xwe nezane hêvîya reş çîye... "*(Elî, 2015: 302-303) , hêvîya reş pêşkêşîyeke ji bo reşbînîyê, pêwîste mirovhêvÎyên xwe ê jîyanê wenda neke. Ev jî ji ber wêye ku hevalên wî jî reşbînî neçin jîyanê û hêvîya wan zêdetir be baweîya wan bi jîyanê hebe.

*" Gumana min ji hemu kesên xirap hebû... Heya îro jî ez wisame. Heya ez dimirim jî gomana min ji kesên xirap hene. Bawerîya min bi wan axaftinan nîne tu di*

*vê kasetê de dibêjî. Tenê bawerîya min bi wan hebû mirîne "*(Elî, 2015: 258),behsa wê dike ku Seryasê duwem ji bo Muzefer dişand. Li gorî bawerîya wî di jîyanê de gelek reşbînî ne raweye. Êdî behsa başîya mirovan li cem wî neyê kirin ji ber ku hemû bê wate û tiştên pîçe .

*" Du ciwan her du di destpêka jîyanê de, tifkirîbûn Mihemedê dil şuşe bi tifkirina wan re ev tevlî rewşa kuştinê bûye. Seryas dibêje : Ev jî ne raste ku mirovne wekî hevbin... Neraste... Em hemu bi hevre mezin bûyîne. Jîyana me wekî heve... wekî wêye ku jîyana me wêneyê di yek neynikê deye "*(Elî, 2015: 184-185) ,wîsan diyare ku reşbînîya Mihemed geleke li gorî wî mirov hemu wekî yekin. Evê jî wisan kirîye ku jîyana Seryas û Mihemd nêzîk hevbin. Ev jî di xwede hizirînekî xelet ya van cûrê mirovane. Ji berku jîyana her mirovekê bi wî ve girêdayîye ne bi jîyana kesekî din re. Pêwîste bawerîya wan bi jîyanê were û bibe wesîleyk ji bo kesên din jî.

*" Wê şevê min hizra çarenusa mirovan beramber tiştên din dikir. Mirinê ev tişt anî bîra min di vê zevîya vale de bi berfirehî berhev bikim. Wekî di nava bazinekê de be hemu tişt tê de mirîbe. Wekî jîyan di keskayetîyê de her ne kesk bû. Jîyan wekî firindeyekê be carekê dayne êdî ne fire "*(Elî, 2015: 172-173) , behsa mirina Seryas dike,li gorî wî Seryas mir êdî jîyan berdewam nabe. Ev jî hizirînekî xelet ya wî kesîye. Ji ber ku mirina kesekê nabe sedem sekinîna jîyanê...!

### 2.2.3 Karekterê Asude (Aram)

Van cûrê kesan di nav xwe de digire, bi temamî ji jîyana xwe razîne. Bawerîya wan bi wê heye kengê dest xwe dirêjî çi tiştî bike, bidest bîne. Ev jî wisan bi kesan dike ku derûnîya wan aram be û bi aramî jîyan bikin.

Kirîsto Fermul dibêje :*" Bextewerî di wê deye ku tu bikarî jîyana xwe bi dilxwazîya xwe bibî serê "* (Mustefa, 2007: 16) , tê wê wateyê ku mirov bikare jîyana xwe bi xweşî û bi dilê xwe bibe serê. Ew di wê demê de jî wisan hîs dikin ku gelek bextewerın û aramindi jîyanê de evjî dibe sedemê di alîyê derûnîyê de asude bibin.

Fontêl dibêje:*"Bextewerî rewşeke mirov di xwaze bêyî ku bê gohertin"*(Cemîl, 2010: 43) , lê belê belku wisan ne. Ji ber ku bextewarîya mirovan ji demekê ji bo demekî din tê gohertin. Ev jî pêwîste bi zanabun bazar li gel bextewerîyê bêkirin.

Li ser Karekterê bextewarî ( Con Stîwart Mîl ). Dibêje : *" Ez fêrbûm ku bextewerîyê bi dest bînim, bi danîna sinorekî ji bo hevesên xwe ne têrkirina van hevesan "*(Cemîl, 2010: 43) , dema ku tu daxwaza tiştekî dikî pêwîste ew tişte li gorî

hêza tebe. Ne ji hêza te derbikeve. Ev jî diwî demî de wisan bi wî kesî dike di alîyê derûnîyê de hest bi aramî û asudeyîyê bike.

Sildin dibêje :'' *Çaxa ku hun di cîhanê debin xêr û behra xwe mafê xwe werbigirin. Cîhan ji bo vê hatîye afirandin. Li hemberî êşan dil giran û bê hêvî nebin. Xwe bi parêzin ji vê yan wê êş û dijwarî bi ser canê we bikeve. Kesê ku qedir û qîmetê jîyanê ne zane mafê wî yê bextewerîyê jî nîne* ''(Burî, 2006: 13) ,pêwîste kesên bi vî awayî beramberî xweşî û nexweşîyên jîyanê bê hêvî nebe. Xwe wisan bizanin ku wê beramberî van pirsgirêkan werin û li beramberî wan bi hêzbin. Ev jî wisan dike ku derûn bextewer be û di jîyanê de arambibin.

Ji ber vê jî aqil dewrekî girîng dibîne di hîskirina bi asudeyî de. *'' Aqil ji bo guhertinê derdikeve,, piştî aramncê mînakek ya xwe berbi pêş ve dibe û pêşkêş dike ''*(Nûser, 2008: 72) , dema ku aqilê mirov biryar da tiştekî bi destbixe pêwîste li gel aqilbiguncê. Ew kes û ew karekter hest bi asudeyê dike.

Ji bo diyarkirina armanca hîskirine û bextewarîya wî kesî *'' Aqil ruberuy pirsgirêkan tê. Ji ber ku wisan pêwîst dike bi şêweyekî cêgirî û di heman demî de parêzgarîyê bi armancê xwe bike ''*(Nûser, 2008: 72) , ji bo vê jî pêwîste aqil agahdarê dewruberê xwe be di dema hewildana derxistina bextewarîyê de.

Ya ku maye bê destnîşankirin karekterê bextewerîyê ye. Ev jî hîskirina wî mirovîye ji bo jîrîya xwe. *'' Jîrî û hêz xweşîyekî hestnekirîye... Encamdayîna reftar û rabunek ciwan tenê ji bo bidestxistina paşerojekê nîne. Belku xweşî û bextewerîyeke di jîyana cîhanê de hestkirîye ''*('erîfî, 2010: 31), dema ku mirov bi temamî hest bizîrekî û jêhatina xwekir dijîyan û karê rojane de. Wisan lê dike ku hîn zêdetir asude bibe zêde hewil bide di hêza xwede be.

Ji bo vê armancê jî pêwîste tamê ji naskirina jîrîya xwe werbigire , da ku bikare bazarê li gel xelkê bike, ev yan çîna hejar be yan jî dewlemend be. Ev jî di wî demî de serkeftina wê pisportîyê ye li gel xelkê jî wisan dike bi temamî hest bi asudeyî û bextewerîya xwe bike. Xwe wekî kesekî serkeftî bibîne.

*'' Mezinîya çolê hîsekî bê endazî û kur bi azadîyê li cem min çêdikir ''*(Elî, 2015: 9), ev jî diwê çaxê deye ku Muzefer di zîndanê de bû û derketina wî wisan lê kir hestbi azadîyê bike. Bêguman azadîjî di besedemê bextewarîya derûnîya wî kesî.

*'' Îkram hêdî guhdar dikir û di got : Bizane ew roja ku tu ji bir derkevî tişt wê bêgohertin. Tu diçî nava şerekî mezin. Ji bo ku tu herî navê pêwîste te di pêşîyê de*

*hinek tişt amade kirîbe... "*(Elî, 2015: 84) , xwezaya kwê çu ava dema hêdî di axivî bi bextewerî di axivî da ku bikare kesê beramberî xwe bide fêmkirin. Bêguman kêw jî ji bo alîkarîya Muzefer  bû.

*" Muzefer ê Sbehdem şoreş ne rastîyekî mezine. Tu bextewerî tu şoreşgerbûyî bêyî ku tu şoreş bikî... Ev jî bereketekî yezdanîye... "*(Elî, 2015: 104) ,Muzefer  wekî kesekî bextewer tê nasîn. Beşdarî şoreşê nebûye, ji ber ku wê çaxê wisan hast xwestinku Muzefer  bibin zîndanê. Heya kuderê bibe hevalê karê xwe...

*" Dengê ava şevê me herduyan bextewar dike. Îkram hinekê dengê xwe bilind kir û di got: Ez piştî raperînê û destpêkirina şer gelek hizra wê min dikir... "*(Elî, 2015: 113-114) , tê diyarkirin ku dengê avê jî sedemeke ji bo asudekirina kesan û hest bi xweşîyê bikin.

*" Êvarekî barane, dengê balkêş yê ewran tê. Bêyî ku hizra ewran bike bi hêdî dest bi sitiran gotinê kir.Ji bilî mifte û madalyayên pê dilehîze. Hinarekî şuşe di berîka wî debû... Mifte di avêtin asîman û di girt. Ew mifte ji şuşê bûn derîyê cîhanê û hêvîya serzemîyan xeyalê wî bû. Wê êvarê kesekî di cîhanê de wekî xwe bextewer be ne didît "*(Elî, 2015: 17) , dema ku Mihemed di wê êvarê de şordibe diçe li gel xeyalê xwe. Hest û sozwisan li wî kirîye ku hest bi bextewarîyê bike. Bi taybet jî piştî dîtina keçikên sipî. Ewan jî wisan kir hest bi bextewarîyek bitemamî bike... !

*"Li ber derî hewar dikir, Lawlawa sipî ez dixwazim te bixwazim... Tu razîyî,herduyan bi çavê sar temaşe kirin. Bi aramî wekî revîna ewrekî zulfên efsaneyî dibirin jor. Pencer girtin û perdeya sipî jî berdan bêyî ku tiştek bêjin. Di jurek din de dibin perda situr de temaşeyî mihemed dikirin. Xwîna ser dilê xwe nîşa wan da û digot : Evzama weye... "*(Elî, 2015: 45) , ew asudeyî û aramîya xuşkên sipî di wî demî deye ku bi temamî hest bi heyîna xwe kirin, ji wê hesdikirin li gel kesekê pevjînê nekin.

*" Li gel vê jî min ji Lawlawên sipî re got; Eger hun herin ser gorawî hun dikarin wî asude bikin... Herin... Herin.. ez lipêşîya we nabim asteng. Lawlawên sipî bi tirs gotin : Bi şertekê tu jî li gel me werî... Bêyî te ez naçim ser goristan... Tu jî were li gel me "*(Elî, 2015: 70-71) , diyarbû li gorî gelek kesan her du xuşkên sipî bûne sedemê mirina dilşuşe. Bavê wî jî di wê xwestekê deye eger ew herin ser gorawî wê kurê wî asude û bextewer be. Xuşkên sipî diçin li ser navê asudekirina dilşuşe... !

*" Du sitranbêjên dengxweş bûn. ji ber sedeman ne dixwestin bibin sitiran bêj. Şev bi dizî min guh dida wan. Ez hêdî ji mal derdiketim min pişta xwe da komek dar*

*ku di navbera du keviran debû û min guh dida wan. Min ne dihişt ew bizanin ez guh didim wan "*(Elî, 2015: 207) , behsa xuşkên sipî dike peyman dabun bavê dilşuşe biçin ser gora wî ji bo asudekirina wî. Tê diyarkirin ku Seryas jî hevalê dilşuşe bû û li nêzîkî gora wî guh dida dengê wan keçikan. Sitiranên wan keçikan wisan bi Seryas kir ku derûnîya wî aram bibe û dengê wan wê derûnîya hemu kesê aram bike.

*" Ew her du zarok dibin wê darê de bi arambun. Aramîyekî wisan bû ku li çi cihek yê din ê cîhanê hest pê nake. Aramîyeke dikare aramî nêzîk xwe bibe. Yan jî dur bibe ji metirsîyên zevîyê. Ne li ser wê zemînêne ku wekî du firîşteyên biçuk rêwîne, pêwîste herin. "*(Elî, 2015: 137) ,behsa çuyîna Seryas û Mihemd dike. Ji bo çandina wê henarê, diyare Li gorî wan ev hinare hinara bextewerîyê ye ewan wisan li wan kirîye bi temamî hest bi asudeya xwe bikin.

*" Ne li benda wê bun ku ew zilamê lewaz bi cilê şîr yê cutyaran bê di nav baxçeyî de bi vî awayî bi axive. Bi hêminî temaşe kir û berdaxekî şerap ji bo xwe dagirt. Gilasa min jî vale hişt bi aramîyekî nîşanda ku jîyana wî asude bû. Qumek li şerabê dida û digot : Supas ji bo yezdan spas ji bo yezdan "*(Elî, 2015: 302), dîtina Muzefer li gel seyê celalê şemis û celalê şemis jî ji sere dibêje: *" Ez niha dikarim bi asudeyî temaşe bikim û bixwim, Temaşeyî bejna fêkîyên min bike, liser armancê bi zivire hemu tiştekê bêje min ,Ji mêjde li benda teme. Ew sala ku Seryas winda bun min nedîtin û hertim li benda tebum. Min wisan zanî tu mirîyî. wisan belavbu ku gotin mirîye "*(Elî, 2015: 303).

*" Van her du rojan sitêrkên reş bi azadî di nava deştê û daran de di gerîyan. di deştê de dilehîstin û şîrê mihê divexwarin. Min hest bi bextewerîyê dikir û ez keyfxweş bûm. Tê werî cem min ? Min bi xemgînî jêre got : Na... Sitêrkên reş roja Seryas here ezxwe amade bikim ji bo çuyînê... "*(Elî, 2015: 251- 252) , ew çaxbû ku Muzefer çûyî cem , laşê Seryasê sêyem jî şewitîbû. Hevalê sitêrkên reş jî nêzîkî Meyras bû , dema ku Muzefer dibîne sitêrk di xweşîn hest bi bextewarîyê dikin , ew zarok bu sedemê çûyîna Muzefer ya li cem Seryas.

### 2.2.4 Karekterê Dilgiranî (Dilteng)

Ew jî wekî tirsêye rewşekî derûnîya giştîye. Di dil û derûnîya hemu kesekê de heye. *" Dilgiranî hestekî giştîye, pire ji tirs , guman û girjın. Bêyî ku laş agahdar bibe gelek goherîn di laş û fîsyolojî de hevmil dibin. Mirov di rêya dil tengîyê û pêşbînîyê de hest bi buyerên ne xweş dike "*(Qereçetanî, Nixoşî û Girifte Derûniye

Komelayetiyekan, 2010: 39) , dilgiranî nêzîkî rewşa tirsînê ye cîyawazîya di navbera wan de ewe ku dilgiranî hemu deman nayê zanîn. Lê belê ewên ku rastî tirsê tên çavkanîya sedemên wê dizane.

*" Dilgiran ezmûnekî mirovî a giştîye. Hinek wekî heyînekî asayî didin naskirin. Lê belê pirsgirêka wê di wê deye sinorê xwe berfireh bike û nekare rê lê bigire , bibe sedemê têkçûna hevsengîya derûnî "*(Cebarî, 2000: 112-113) , dema ku kesek hevsengîya xwe ji dest bide û di jîyana xwe de reşbînî be, ew jî ji ber wê ye ku rastî dilgiranyekî zêde hatîye. Nikare wê rewşê bêxe di bin kontrola xwe de.

*" Dilgiran, diyardeyekî derûnîya giştîye. Mirov rastî vê tê û kesek jî nîne di çend çirkeyan de rastî wê neyê. Ji bo saxîya û çêkirina endamên mirovane. Hizir û hiş tamek taybet dide bi jîyanê, Mirov di wê rêyê de xwenên dibîne û digehe hîvî, xwin û xeyalên xwe "*(Qereçetanî, Hendêk Nexoşî û Giriftî Derûnî û Komelayetî, 2010: 32-33) , pêwîste embaş agahdarê dilgirane xwe bibîn. Bi cûrekê bandorekî zêde nebe li ser jîyan û derdor.

*" Her çiqas rêjeya dilgiranê di sinorekî guncaw û asayî deye. Kesên di nava civakê de rastî çi pirsgirêkan û paşketinekî derûnî nayên, metirsîyek zêde nîne. Lê belê hinek car buyerên dil tezî û li bendê nemayî alozîyê di jîyan wan de têkdide. Rêjeya dilgiranê ji sinorê asayîya xwe nivistir dike. Ev jî êrîşekî ya anîna tirsêye û hêzekî ji bo birina ser endamê derûnîya mirovan "*(Qereçetanî, Derwazey Derûnzanî, 1996: 17) , rêzeya dillerizînê li gel gelek endamên di nava civakê de wekî heve. Lê belê di encama buyeran de goherîn bi serde tê. Wekî mirina mirovekî hêja, ev jî wisan dike ku rêjeya dilgiranê di kesde bi gehe rêjeyekî bilind. Bêguman ev jî bandorê li ser gelek alîyên laş dike. Belku kes bi bilindbûna dilgiranê rastî nexweşîyan jî were. Ev jî rewşek xirap dibe ser jîyan û derûnîya kesî.

### 2.2.4.1 Sedemên Çêbuna Dilgiranî

Pêkte ji wanan wekî:-

*" A- Amadebûn Ji bo Demî: Dema ku yek ji endamê xêzane rewşa dilgirannê hebe, egera rast hatina endamê xêzanê zêdetir dike. Eger yek ji endamê malbatê rastî dilgranê hatibe, rewşa dilgirana endamê din jî di rêjeya ( %50 ) deye.*

*B - Amadebûna Derûnî : Hîskirina êrîşa navxweyî û ji derveyî ya di jîngeya derdor de.*

*C - Rewşa Piştgirîya jîyanê : Piştgirîya çandî, jîngeyî û şaristanî.*

*D - Cîyawazîya di navbera kesê rast û yê bi mînak de.*

*E - Ezmûna Soza Nexweş : " Hêdmeya derûnî û perwerdeya aborî "* (Ezîz, 2012: 233) , ji bo çareserkirina van sedeman pêwîste di jîyanê de bi şêweyekî reftarê bike. Daku dilgiran di dil û derûnîya mede bi şêweyekî kêm çêbibe.

### 2.2.4.2 Cûrên Dilgiranî

Eşkereye ku hemu mirovek dilgiranî li gel wan de heye, du cûran jî di nava xwe de digire. Ew ji wekî : *" A- Dilgirana Asayî ( Dilgirana Babetî ) : Ev cûr jî nêzîkî tirsê ye. Hinek wekî diyardeyekî rast û pêwîst dizanin ji bo gehiştina derûnîyê. Ev jî demikîye li gel nemayîna tirsê dawî lê tê. Arîkarîya mirovan jî dike ji bo xwe amadekirina ji metirsîyan.*

*B - Dilgirana Nexweş : Nexweşîyekî aloz û ne hestîye û kar dike ser kesayetîya nexweş. Ji ber wê jî pêwîstî bi çareserîyê heye. Di vê rewşêde rastî êşa endamên laş û hêrsekî tê. Dest û lingê wî/wê sardibe û masulkeyên wan di êşin. Xuhdanekî zêde jî dike "*(Cebarî, 2000: 113) , Ji ber wê jî pêwîste mirov bi zanebûn li gel van herdû cûrên dilgiranî tev bigere. Da ku gelek ji jîyanê û derdor aciz nebe.

*" Ez anîm vê koşkê. Min qet tiştekê jê fêmnekir û min ne dixwest ez jê fêm bikim. Hemu tiştek di şevê de encam dan. Heya ez gehiştim vir ez di tarîyê de bûm. Dema ez ji zîndanê hatim ji derve min ronahî ne dît heya min çavê xwe di vê koşkê de vekir... "*(Elî, 2015: 9-10) , Muzefer  behsa zîndanê dike ku bi şev ew biribûn zîndanê. Her di wê şevê de jî hat azadkirin ji ber wê jî rastî dilgiranê hatîye.

*" Wan salan ez fêrbûm ku ya laşe ew dîle. Dikarî bi rih azadbibî. Lê belê di şeva azadîyê de min hest bi rastîya leşê xwe kir. Min hest kir ku cara destpêkêye lingên min diçe û hêzek nîne bigire "*(Elî, 2015:  109) , Muzfer behsa piştî azadbûna xwe dike, ka rastî çi dilgiranê hatîye û sedem jÎ ewe.

*" Mihemedê dilşuşe bi ruyekî xweş, lê belê bi nexwestek dibêje : Tiştên wisan nîne, Hun ne xuşkên minin. Ez di nava hemu tofanan de hatîme yek ji we hesbikim. Min baran şandîye da ku lavlav xweş bibe "*(Elî, 2015: 23) , Dilşuşe bi pêlên avê re gehiştîye ber derîyê xuşkên sipî. Rastî jan û dilgiranê hatîye ji ber wê jî dest ji Lawlawên sipî bernade. Daxwaza pevjînê bi wan dike. Lê belê ew qebul nakin. Ji ber wê jî Mihemed dibêje : *" Ji hemu tiştekî girîngtir dilê min li cem şuşeyêye. şuşeyekî gelek nazike, dilşikandinekî herî biçûk wê min bikuje... Ez kesekî ji şuşeyê me çaxa şikest ez ê hur bibim. Dema ez hur jî bûm ezê parçeyan li pişt xwe bihêlim , parçeyên*

*min hêlan wê bibe mirîyekî bê dawî "*(Elî, 2015: 23), bi razî nebûna Lawlaw derûnîya Mihemed zêdetir têkdiçe. Rastî dilgiranîyekî zêdetir dibe. Van gotinan ji xuşkên sipî re dibêje û xuşkên sipî jî bi wan balkêş dihar ku dilek ji şuşeyê hebû...!

*" Di wî demî de rojên jîyana Mihemedê dilşuşe geşetekî balkêş li pey xwe hiştibû. Lê belê hest dike nikare bibîne. Hest dikir ji dîwar zêdetir tiştek din nîne temaşe bike. Rojekê di gehe wê rastîyê piştre rêyek ya mayîna jîyanê dibîne. Pêwîste jîyanek hebe wekî şuşeyê runî be.Jîyanek di hemu alîyan de bê dîtin. Jîyanek be qet ne wekî jîyana serzemîna niha be "* (Elî, 2015: 42-43) , ev jî di wî demî de tê ku bavê wî biryar da ji ber vê dilgiranê xanîyekî jişuşan jêre ava bike. Da ku hinek jan û dilgirana wî kêm bibe.

*" Lawlawên sipî tu jî di cîhanekî dinde Mihemedê dil şuşe dibînî. Ez bawerim niha li wir li benda tiştekêye. Min hîs dikir mirî ji me zêdetir li bendê dimînin... Niha li benda mene. Lawlawên sipî muçeyek ji bo wan dibe. Her heftî yek demjimêr here li ser gora wî... "* (Elî, 2015: 70) , bavê wî ji ber mirina kurê xwe rastî dilgiranê hatîye û wê daxwaza seyir re li wan kiçan bike bi awayeka seyir, di encam de Lawlaw ji bo arambûna dil û derûna bavê wî û bi nemana dilgiranî ya bavê wî.

*" Ew û Seryasê yekem her du li ser wê rêkketin ku xuşkên sipî bê tewanin. Min radikêşa bi ser xwe de û min got: Çawe bê gunehin. ew bê tewanin erê Mihemedê dil şuşe çi dike di wê gorê de... Eger ew bê gunehin çi ma Mihemed na rabe wekî caran nabe hevalê me û li gel me bê li bin Diwahemîn hinara dunya ? Çi tewanek ji wê mezintire mirov yekê ji dil hesbike û ew jê hesneke ? "*(Elî, 2015: 241) , aramanca bavê Mihemed ewe kombibin û bikare keçikên sipî nîşan bide ew bûne sedemê kuştina kurê wî. Hevalên Mihemed rastî dilşikandinekî zêde bûn û bawer ne dikirin tiştek wisan çêbibe û ew keç bê tewan bibin.

*" Ew fezaya mezin û berfireh berê wê gelek berfireh bû. Demekê cih ji bo siha kêlan bi cih hiştibû. Min hest dikir ev ew asoya ew qas ber fireh û mezin alîyekî bê endezyar û mezin bû ji bo wê mirinê cih hiştîbû û hizra gerdunê bike. Girtinek bû di wê cûrê girtinê de mirovbi ne dawîyêkê ve girê dide. Di van salên dawî de ji bilî Şaderya sipî û Lawlawên sipî kesek ne çûbû ser gorê "*(Elî, 2015: 172) , behsa bavê Seryas dike ku rastî dilgiranîyekê hatîye. Ji ber sedema mayîna wî a dizîndanê de, piştî hatina wî a ji derve çûyîna wî a liser gora Seryas, rastî vê rewşê hat. Wisan dizanî ku bes xuşkên sipî gora wî dizane.

*" Min wisan zanî ku ji bilî mirîyên di nava deştê de Seryasek din heye ku dikare bibe kurê min. Dikare ew kurê xeyalî be ku 21 salan li benda me maye.Lê belê min wisan dizanî ew şadî hest , hêvî û êşan li dilê wî da bu sedemê çêbûna mirina Seryas "*(Elî, 2015: 199), ew dilgiranî ya zêde ya li cem Seryas çêbûyî sedemê wê wan salên di zîndanê de mayî ye. Zêde hizra kurê xwe yê rast dikir ji ber wê rastî dilşikestinekî zêde hat.

*" Ji mêvanên xwe re digot : Hun çi demekî balkêş de hatin. Wekî xencerekî li min bidin û min di cihde bihêlin. Temaşebikin, Ez niha dikarim çi bêjim ?... Eger nehênîyek hebe mifteya wê nehênîyê ne li cem mine. Eger hun tiştekê jê fêmdikin ji min re bêjin. Ez tiştekî fêmnakim... Ez jî naxwazim di tarîyê de bijîm... Hun bi xwe dibînin ez niha li cihê karim... "*(Elî, 2015: 182-183) , dema ku Mihemd û Seryasê yekem çûnli cem Seryasê duwem, ka bizanin ji ber çi ew ji Seryase. Di wî wextî de Seryasê duwem rastî dilgiranîyekê tê û wan gotinên balkêş dibêje...

*" Şevekê Îkramê Kêw hatîye cem min. Ew derbarê hemu tiştan de ne razî bû... Ne rihet bû ez bi van rihên dirêj û pirça dirêj ve çum ji derve. Lê belê tejî bu ji bêdengî û lêborînê. Îkram tiştek di derbarê Seryasê duwem de ne dizanî. Li cem wî Çîroka wî wekî tiştekî balkêş bû. Bi wî laşê xwe ê mezin û aram di mal de diçû û dihat di got : Ezê hemu tiştekê bikim ji bo ez biafirînim "*(Elî, 2015: 204), dîtina Muzefer ya vî Seryasî Îkram rastî dilgiranîyê anîye. Dema bi vî awayî Muzefer dîtîye û qet derbarê Seryas de tiştek ne zanîye.

*" Îkram carnan wan milên xwe yên sitor vedikir da ku ez baştir guh bidimê. Digot : Muzefer ê Subehdem, bajarekê bîne pêş çavê xwe, Tejîye ji hezaran kuçên teng, pire ji hezaran derîyên girtî. Pire ji hezaran qele ku mirov tê de dizivire û derîyê wê nabîne "*(Elî, 2015: 211) , di vir de Îkramê Kêw rastî jan û dilgiranekî zêde hatîye. Hest dike ku ji xwe winda bîye nizane berbi kuve diçe.

*" Seyê Celal ji te zêdetir kesek din nîne van zarokan rizgar bike... Ez nikarim tiştekî ji wan re bikim. Di tarîyê de min zarok jê girtin, hemu canê min dilgiranî. Carekê du caran sê caran min pirsî ? Ev zarok zarokên kêne. Yakubê Sinober zarokên kêne? Her carê bi şermî digot: Zarokên şoreşêne lawên şoreşêne. Ji bîr neke her sêyan jî yek nav heye lawên şoreşêne "*(Elî, 2015: 306) , bêguman di wî demê balkêş de sê zarokan bîne bide destê wî û ew jî rastî dilgiranîyekî zê de dibe, ecêb dimîne ku hersêyan jî yek nav heye, ew jî navê Seryase... !

*" Wê şevê digehe ber mala hebîbê, Pîrîyê çokên wî lewaz kirîye. Li ber derî disekine û du dile her hindir. Yan jî bi sekine bi nîgarekî xeyalê xwe ve bi zivire û heya demekî bi nîgarê xeyalê xwe ve were ser bi sekine. Du caran di wî demî de destê xwe dirêj dike li derîyê mala mehşuqan bide. Destê wî dilerize û canê wî diçe ser avê lerzîn dikeve çokên wî...Di wî demî de biryar dide çawe bi salane bi xeyalan jîyan kirîye... "*(Elî, 2015: 314) , Sey Celal behsa serdema xwe a kevin ji Muzefer re dike. Ji ber evînîya wê demê çawe rastî dudilî û dilgiranê hatîye... !

### 2.2.5 Karekterê Xeydî (Aciz)

Ji wê rewşa mirovan ya ku di encama karekî de ne bi dilê kesêberam ber be pêltê. Yan jî di jîyanê de ne gehiştîye hêvîya xwe. Mînak ; ji destdana heskirîyên xwe wekî mirin. Durketina ji ezîzên xwe, ew jî dibe semdê reftarekî aciz di nava civakê de.

Li ser acizîyê jî emê çend fikrê zana û fîlozofan bidîn destnîşankirin. Yek ji wan jî Darwîn : *" Acizî wekî rewşekî rojaneye û behs dike. Di encam rube rubûna buyerên li derwruberê de serî hildide. Ev buyer wisan bi ( Mirov yan jî Ajal ) dike bersivekî laşî û fîsyolojî hebe. Ji bo ku xwe bi parêze û jîyana xwe berdewam bike. Darwîn, acizîyê wekî beşekî yê parastinê dibîne"* (Qereçetanî, Nixoşî û Girifte Derûniye Komelayetiyekan, 2010: 112) , li gorî Darwîn acizî di encama bilindbûnê de çêdibe. Ew jî diwê demê deye ku ew mirov nekare bilindbûna xwe kontirol bike. Wisan lê hatku beramberî tişta heyî aciz bibe.

Li gorî fikrê Dr. Hornî jî acizî, *" Ji tirsê tê û hewil dide xwe bi parêze ji wê tirsê "*(Mehdî, 2012: 399) , dem kesek di jîyana xwe de rastî tirsekî gelek hat, ji bo ew tirs dernekeve. Ew acizîya xwe nîşan dide, da ku hest bi tirsê neke.

Li gorî Bkîkş *" Acizî di encama bîr û bawerîyak li hevdana kes deye, buyerên jîyanê jî li gorî hev tên gohertin. Hinek buyer hene kesan aciz dike, lê belê heman buyer kesekî din aciz nake "*(Qereçetanî, Nixoşî û Girifte Derûniye Komelayetiyekan, 2010: 114) ,di vir de armanca bîk ewe ku ne şerte her du kesan heman hizir û fikir hebe beramberî heyînên dewruber, ev jî wisan dike ku yek ji wan acizbe di beramberî buyera ku heyî. Yê din jî her wekî xwe dimîne û aciz nabe.

Li gorî Arîsto ; *" Acizbûn gelek hêsane...Hemu kes dikaritê, Lê belê aciz be jî pêwîste li gel kesê pêwîst, bi pileya pêwîst, di demê pêwîst de û ji bo armancekî pêwîst. Ev ne gelek hêsane û di hêza hemu kesê de jî nîne"*(Mehdî, 2012: 400) ,acizbûna mirovan jî li gorî rewşê tê gohertin.

Her ji ber vê jî di bêjin , *" Acizî yek ji hilçûnên mirovane, heyînekî derûnî a asayîye "*(Qereçetanî, Derwazey Derûnzanî, 1996: 20) , mirov li gorî jîngeya xwe bazarê li gel wan heyîn û helwestan dike. Li gorî ya pêwîst acizbûna xwe nîşan dide.

Ji ber vê jî em dikarin bêjin : *" Bi çi awayekî mirov nikare xwe ji acizbûnê rizgar bike. Wekî sîberê ye berdewam li gel temenê mirov deye. Tenê çareya wê ewe mirov xwe li ser helwestên xwe hakim bike. Bêguman acizbûn li gel ker kesê heye û cudaye. Lê belê çawe bi ser wande zalbûn girînge û nebin sedemê bûyeran. Li gorî her kesekê cîyawaze "*(Qereçetanî, Saykolojiyay Giştî, 2007: 151) , eger li gorî vê heryînê be, acizî her di destpêka mirovan de li gel wan jîyan dike. Pêwîste bi şêweyekî baş li gel acizîya xwe rêve biçe. Bikare xwe zêde aciz neke beramberî bûyeran .

Ji ber wê jî em di dawîyê de di bêjin acizî diyardeyekî fîsyolojîye. Her li gel hatina mirov a jîyanê de heye, heya mirinê.

*" Li ber baranê bi destê bi xwîn hemu mifteyan lêkolîn dike.Lê belê bê sude dixwaze bi dîwaran ve bi sipêre lê nikare. Diçe ser darên nêzîk û ji wir hewar dike. Ji bilî dengê baranê çi dengekî din na bihîse. Ji bilî ronahîya rondikê xwe çi tiştekî din nabîne "*(Elî, 2015: 46-47), ji ber ku xuşkên sipî bi wî razî ne bûn. Mihemed jî bi vî awayî acizbûna xwe derdixist û ne razîbûna xwe ya jîyanê jî nîşan dida.

*"Dema ez aciz dibûm Prf şevên tarî bêdeng dibû. Ez Seryasê çepel dibin duwahemı henara dunyayê de min ji wan re got : Di dema acizbûna min de xwe ji min bi parêzin. Dema em çûyîn ser cenazê hema ew cil li ber bûn ku min û wî bi hevre kirîbûn "*(Elî, 2015: 227) , meseleya Profesorê şevên tarî. Nedîmê Şazdehem bû dema Seryas aciz dibû pêwîste hemu bêdeng biban. Acizbûna Seryas jî ji wê tê dema gotin Mihemedê dilşuşe mirîye.

*" Yekem car bû ku wî zanî Seryas firoşkarekî asayî yê di nava leşkerê deatgîrandeye. Hevalênwî jêre gotin : Marşalê ereban bihîst û bi acizî ji av firoşan re dibêje: Ez sedsala jî têhn bim û tenê ew sitila ava te mabe li ser ruyê erdê ez ava te navexwim. De êdî rabe û dest ji min berde. Çend demekî balkêş bûn çûn ber devî. Bi dengekî ji kezebê sitiran gotin. Nîvro baş marşal "*(Elî, 2015: 97) , ji ber nexweşîya wî demî wisan bi Seryas hat ku bi wî awayî acizbûna xwe bi wî av firoşîre derbixe. Wekî ku bêjê karê wî kurî wekî tiştekî bê wateye û ew wekî tiştekî balkêş temaşeyî karê wî kurî dike. Seryas di jîyana xwe de gelek asayî bû û gelek dixwes arîkarîya

kesên dewrubera xwe bike. Dema ku xuşkên sipî çûn cem Seryas li gorî wan gelek balkêş bû ew bivî awayî acizbûne...!

*" Lê belê cara destpêkê bû ku Seryas bi vî awayî hizra şerefê bike. Got : Ewê tenê yek tîpê jî axaftinê ji Lawlawên şaderyayê re bike ezê bi kujim. Wê bibe demjimêra dawî a jîyan wî. Ew xuşkên minin "*(Elî, 2015: 123-124) , acizbûna Seryas jî piştî wê tê xelkê her du xuşkên sipî tewanbar dikirin ew bûn sedemê kuştina Mihemedê dil şuşe. Bi vî awayî arîkarîya xuşkên sipî da. ji ber ku ew wan baş nasdike. Xuşkên sipî jî Seryas wekî birayê xwe danîbûn û gelek ji wî hesdikirin wekî birayekî.

*"Xuşkên sipî ez girtim û di gotin : Muzefer ê Subehedem tu azarê êşê didî... Tu bi van hewaran wî bixwer tînî.. Dema ku bixeber tê birînên wî di êşên... Bêdeng be... Muzefer ê Subehdem bêdeng be "*(Elî, 2015: 173-174) , acizbûna Muzefer jî ji ber ne dîtina Seryas bû. Li gel xuşkên sipî çû ser gora wî. Li gorî xuşkên ji ber vê hewarê Seryas di nava gorê de êşê di kêşe... !

*"Lawlawan bi acizî di gotin :Kesek nikare bi hizra Seryas hewar bike. Ew li kuderê be jî nabe dengê xwe tevlî dengê kesekê bike "*(Elî, 2015: 201), eskirina xuşkên sipî a ji bo Seryas ji wê tê ku wan ew wekî rênîşanê xwe qebûl kirîbûn , li gorî wan Seryas bû sedemê rêxistina bazarê û wî dikarî bi ser wan de hewarê bile. ew jî di wî demî de bû ku Muzefer  behsa wî dikirin lipey Seryas di gerîyan. Li gorî xuşkên sipî tenê yek Seryas heye nabe Seryasek din hebe.

*" Bi hezaran kes li berde diçin, kesek na sekine guhbidê û alîkarîya wî bike. Ew di vê rêya fireh de digirî û aciz dibe. Ji xelkê re dibêje : Hun gelekî ji sene... Hun guyê ser vê erdêne... Hun tifekin ji xelkê hîz û tirsonekin. Nedîmê Şazade di nava gelê pirsker de mezinbûye... Hemu xeberên ne xweş ê cîhanê dizanin... "*(Elî, 2015: 129), Ji ber kurîya xwe û acizbûna ji jîyanê, nebûna hevalekê di destpêka jîyanê de wisan kirîbû alîkarîya xelkê bike û bi vî awayî xwe li xelkê aciz bike.

*" Singê xwe ji ber bahozê û acizîyê ve dikir. Bi dengekî birînda ku hemu canê min li berde dilerize. Kesek sengerên xwe bi cih nehêlin.Bi bombeyan min êrîş dikir ser dijmin. Ez di nava mayîn û hemu xefkên dinde diçûm û hewardikir "*(Elî, 2015: 281) , di vir de dema Muzefer  di zîndanê de bû Seryas şoreş û şer dikir. Gelek ji hevalên xwe aciz bû ji ber ku sengerên xwe vale hiştin. Ew jî bu sedemê hîn zêdetri Seryasê duwem aciztir bibe. Bi tenê ma sengerî de.

*" Fêkî komdikir û acizbû min temaşekir û min got : Ne kurên tene... Ne tenê kurê teye... Kurê hemuyane... Pêwîste em hemu vê janê hilgirîn "*(Elî, 2015: 315), Seyê Celalê şemis behsa her sê Seryasan ji Muzefer re dikir. Yek ji wan Seryasan yê celalê şemis bû yek jî yê Muzefer bû. Piştî Muzefer zivirî cem Seryasan celalê şemis aciz bû, li gorî wî ew Seryas yê hemuyane. Pêwîste agahdarê wan bûya. Nabe piştî Muzefer zivirî cem Seryasan bêje hersê yên minin. Pêwîste agahdarê wan bûya.

*" Min hîs kir ku Sitêrka reş desthilatekî taybet li ser wan de heye. Sitêrka reş ji min re got : Her çibe nabe acizbibî... Pêwîste cara dawîyê wekî hespan axaftina xwe dubare bikî. Lê belê aciz nebî. Ji ber ku te ew qas dengê xwe bilind kirîye hemu tiştek wê temam bibe. Li vir kesek nikare dengê xwe bilind bike. Eger tu bi dengê bilind axivî ne ez ne jî Seryasê Subehdem wê li gel te bimîne "*(Elî, 2015: 337) , ji ber ku Seryasê sêyem di cihê şewatê deye nabe tu di wî cihî de dengê xwe bilind bikî û acizbûna xwe nîşan bidî.

### 2.2.6 Karekterê Sergerim (Hilçun)

Evan cûrê kesan di nava xwe de digire beramberî rewşa derûnîya diyardeyêk din bilind dibe. Hinek caran ev hilçûne baş dibe û hinek caran jî xirap dibe. Herwisa*" Hilçûn rewşekî wijdanî û hêzekî zêdeye li ser endamên laş û derûnîya kesîye. Komek nîşane û hinek diyardeyan li gel xwe tîne û barê hilçûna mirovan jî pê diyar dibe "* (Qereçetanî, Saykolojiyay Giştî, 2007: 114)

*" Rewşa wijdanî bi hêze dibe sedemê jana derûnî û fîsyolojî. " Hilçûn, bersıvekî du cemserîye, yan dibe pozîtîf yan jî dibe negatîf "*(Ezîz, 2012: 74) , dema ku kesek berbi jor ve diçe pêwîste agahdar be ka ev çûyîne başe yan jî xirape. Ji ber ku wê rastî lêpirsînê were eger her çawe be.

*" Hilçûn demekê de wekî acîzîyê ye û tirse yan jî bi rêya fêrbûnê peyda dibe. Wekî şermkirin û hîskirin bi tewan. Hilçûn ji bo demekî gelekî sadeye. Lê belê bilindbûna fêrbûnê gelek caran ji komek hilçûna pêktê. Wekî, hesidî, tirs, hîskirina bi kêmî, heskirina milkdarî "*(Şerîf, 2009: 46).

Em di gehin wê pênaseyê ku hilçûn ji wê rewşa janî ya mirovî pêktê. Evdi encama çend sedemên derekî û navendîya mirovan çêdibe. Wekî acizî û axaftina di rewşekî ne guncaw de.

### 2.2.6.1 Xesletên Kesê Sergerim

Di cîhanê de her mirovek bi siruşta xwe dide naskirin em jî li vir de pêwîst dike qala mijara kesên sergerim dikin.

*" A - Rewşekî wijdanîya hişke. Mil bi milê janekî fîsyolojîye, heyînekî rêxistinî ya cûr bi cûre.*

*B - Rewşeke rastî kesan tê bi şêweykî hişk.*

*C - Şêweyekî tenge di nava derbazbûnek ya xwe de digire û gelek dewam nake. Wekî hişk tê û wekî hişk jî diçe "*(Şerîf, 2009: 46) ,pêwîste mirov bi zanebûn şer li gel hilçûna xwe bike. Da ku bandorekî xirap li ser nebe.

### 2.2.6.2 Alîyên Sergermê

Eger em bi xwazin hilçûnê wekî acizî û tirsê şîrovebikîn. Pêwîste em sê alîyên hilçûnê şîrove bikin.

*" A- Alîyê Hestê Xwe : Ev alî jî bi tayber di mirovan de bilind bûye. Ew bixwe bi zimanê xwe  behsa hilçûn û goherînên fîsyolojî dike. Mînak; eger yek rastî bilindbûna acîzîyê were. Ew bi xwe dikare behsa wan hest û goherînan bike ku di encama acizîya wî de derketîye.*

*B - Alîyê Jiderve : Ev jî wan gohertinan digire ku ji alîyê jiderveyî mirov çêdibe. Dikare di rêya hestan de naramîya alîyê derûnîya mirov diyar bike. Wekî acizî dilxweşî, yan jî tirs.... hwd.*

*C - Alîyê Fîsyolojî : Mirov bi xwe hest bi bilindbûnê dike. Di alîyê ji derve de jî di dev, çav, dest û ling de çêdibe. Di heman demê de gelek goherînê fîsyolojî di mirovan de jî çêdibe. Wekî zêdebûna lêdana dil. Bilindbûna nefesa bêhndanê û zêdebûna rêjeya şekir di xwînê de. Sorbûn yan jî zerbûna dev û çav. Sekinadina pirsîsa hêrskirinê "*(Qereçetanî, Derwazey Derûnzanî, 1996: 13) , ev hersê alî kêm û zêde jî be bandorê li ser derûnîya mirovan dike. Pêwîste agahdarê vê rewşê bibîn û bi awayekî zanêbûn li gel van hersê reftara rêve biçîn.

*" Hewarê dike û agahdardibe di demekê de hemu gerdun di temekî sipî de dibin. Di dil de hest bi êşekî mezindike. êşek wisane di demekê de dest bi girî dike"*(Elî, 2015: 26) , Mihemed di wî demîdeye mifteyên wî wekî caran kar nakin. Evjî wisan dike destên wî bilerize û bi keve rewşekî xirap de.

*" Erê wê here kuderê ? Bêyî ku bi sekinim hewar kir. Ez ê herim çolê... Guh bide, Îkramê Kêw min geştekî heye û pêwîste ez herim... Wezifeyek ya minheye pêwîste ez bi cihbînim... Tiştênmin wisane. Hukmetek heye vaye ez di 21 salan de ne mirîme... Hikmetek heye ez li virim... Hukmek heye ez û tu di vî cihîde digehin hev... "*(Elî, 2015: 86) , ew salên ku zorbûn Muzefer di zîndanê de bû. Piştî derketinê wisanlê hat ji jîyanê aciz bibe. Dengekî bilind rabe û bi vî şêweyî ji bo Îkram Kêw di jîyanê de bike.

*" Bikarim wekî dostekî temaşeyî deryayê bikim. Dest li vê deryayê bidim û hewar bikim. Ey derya alîkarîya me bike... Min bihezaran şevan di pencereya zîndanê de hewar dikir. Ey deştê hewara min were... "*(Elî, 2015: 107-108) , em dikarin bêjin sedemê wê jî ew 21 salên di zîndanê de bûn û wisa ser hatiye guzarişit bike li zîndan û lim û derya û bi wî awayeka aram sergerim dibe û tiştên a jîyana xwe derdixe.

*"Nedîmê Şazade bibêhndanê re nêzîkî û dûrîya xwe a lutkeyê diyar kir. Di gehişt wê ku ne dikarî wê deryaya bê binî û bêdawî bi ciwanî bibîne. Lê belê li gel yekem pêngavê bi xwe hewar kir ev tenê bîstekî beheşte li ser rûyê erdê. Di nava wî girîde darekî biçûk ku dara hinarê rabû "*(Elî, 2015: 135) , Bi korîyê ve bu dema gehiştin wê lutkeya çîya û çû cem dara hinarê bi gehiştina wî re hewar kir. Di derûnîyê de jî wisan hîs bike ku ji wê darê digot : Diwahemîn Henarî Dunîya.

*" Adem Mercan ne dikarî xwe pê bigire. Ewî jî li cem me diqîrand, li ser Seryas bi kombûn me diqîrand.Bi xwe du caran destê min girt, got min bibin mala xuşkên sipî. Min hewarkir ezê te bibim cem pizîşk... Ka em bi gehînin nexweşxanê,Tirêmpêl di vê qerebalixê de na gehitê , di wê çîrkeyê de min hîskir ku ew mîrîbu , Carekdin min temaşekir û got min bibin mala xuşkên sipî... "*(Elî, 2015: 160) , ew guleya ku li Seryas ketî bû sedemê bandorîyê li ser derûnîya hemu hevalênwî, Hemu gelek ecêb mabûn ji ber birîndarîya Seryas. Birîn di laşê Seryas de kurbibû, her dîsan di got pêwîste hun min bibin mala xuşkên sipî, Ji ber ku ewan ew wekî birayê xwe qebul kirîbûn, disan li ser erebanê danî û ew birin cemxuşkên sipî.

*" Wê şevê ez wekî dîna bûm min baweş lixuşkên sipî dikir û hewardikir. Seryas ne mirîye. Mirinekî behude ne mirine. Polîsekî pîs di nava bajêr de ne kuştîye... Ew livire dikare bi axive. Dikare behsa xwe bike, çîroka xwe bêje.Tevlî vê jîyanê bûye. Gazî Sitêrkan bike hewarê li firindeyan bike "*(Elî, 2015: 200-201) , piştî lêgerîna Muzefer a ji bo Seryas, piştre çûyîna wî ya li gel xuşkên sipî wê deme dizane Seryas

maye yan jî çûye. Ji ber vê jî ev rewşa hilçûnê li gel wî balkêşbû, Seryas bi destê polîsan hat kuştin.

*" Bi xuroş û heycan min got : Keça min, Lawlawa min, wekî çawe beşek ji jîyana me di nava hemû jîyanên din deye.Wisa beşek ji hemu jîyanên din jî di nava jîyana me deye. Wekî çawe beşek ji mirinên din jî di nava mirina me deye. Wisa mergê me bi cûrek ji cûran di hemu mirinê de ye... "*(Elî, 2015: 201-202) , Muzefer bi wê jîyana ku tê de jîyankirîye, bi vî awayî hizra jîyana xwe û keçên sipî kirîye , bi vî awayî hilçûn wisan lê hatîye ku behsa jîyan û mirinê bike...!

*" Bi awayekî şewitî bû mirov ne dixwest wêneyê şewata wî binê ber çavê xwe. Lê belê tişta ji derve dihat dîtin jî safîya rih bû. Got : Hun dizanin çima ez bi sivikî di axivim? Min got : nizanim, Min temaşekir û min got : Pêwîste bizanî... Li vir hemu hewarê dikin, hemu dinalên, Ewên bi dengê bilind bi axivin, pêşeya yên din xirapdike. Rihetbûna pzişt û grupa wî xirap dikin... Rojek hat ew hemu derxistin yên ku bi dengê bilind hewar dikirin , Ji bo ku di vir de bijî ûnan bixwe û di jorekî germde razê nabe hun hewar bikin "*(Elî, 2015: 328) , di wî çaxî de bavê Seryasan û yê Seryasê sêyem serdana wî cihî kirî bû. Hevalên Seryas jî armanca wan hilçûna hevalên wî bû.Ji ber sedemê gelek şewîtînê navber navber hewar dikir û ji jîyanê acizdibû û ji kesên dewrubera xwe jî.

*" Di demekê de bi çavê pir girî, bi bilindbûna xwîna dilekî min biryar da xwe û jîyana xwe heta heta bi peymanekî kur ve girêbidim. Peymanekî tenê ez li gel xwe mordikim. Min bixwe dinivîsî û dibirû radikir "*(Elî, 2015: 338) , Ji ber vê jî di alîyê derûnîyê de rastî vê hilçûnê hat, ev hilçûn jî heya demekî piştî Seryas jî ma.

### 2.2.7 Karekterê Tirsinok

Ji wê rewşê pêktê ku di hemu mirovan de heye. Ev jî di wî demî de çêdibe ku tirsê di derûnîya xwe de çêdike. Ew jî beramberî diyardeyekê ku her wexta hat li pêş çavan ew tirs di wî de çêdibe.

*" Tirs xasyetekî mirovîye di hemu kesan de heye û giştîye. Di alîyê laş de pir girînge, dema mirov ruberuy buyerekê hat hewil dide xwe bi parêze. Dema ku mirov rastî êrîşek yan jî cûrek ya zîyana kesekê dibe, dibe sedemê tirsê "*(Kaprîz, 2009: 245), em dikarin bêjin tirs tiştekî xwezayîye, di hemu mirovan de heye. Ji kesekê ji bo kesên din tê gohertin.

*" Tirs rewşekî derûnîye heyîneke rastî mirovan tê. Tirsîna wekî ji cihekî tarî, cihekî bilind yan jî rastî buyerêkê hatin...hwd "*(Şeyda M. M., 2010: 85), tirs peywendîya wê bi derûnîya mirovan re heye û li gel hemu mirovan jî heye.

Ji ber vê jî *" Tirsê jî wekî cûrek yê nexweşîyan tê zanîn. Di vî serdemîde bimilyonan kes hertim tis li gel wan veşartîye. Ev kesên bi vî awayî nexweşin û nizanin li gel wan heye. Dema ku li pey çareserîyê digere diçe cem pizîşk û li gorî pizîşkan jî ev cûrê mirovan rastî nexweşîya Fobyayan hatîne. Niha hemû pizîşk di bêjin sedemê derketina gelek nexweşîyan laşî tirse , Di van salên dawî de jî bûye sedemê tirstirîn çêbûna ne xweşîyan"*(Prf, 2008: 7) ,Hinek kes wisanin di jîyana xwe de berdewamî tirs li gel wanin lê belê gelek bi direngî hest pê dikin. Bêguman ev jî bandorekî xirap li ser derûnîya kes dike. Dibe sedemê zêdebûna çendîn nexweşîyan. Ji ber wêjî pêwîste hemû kes agahdarê rêjeya tirsa xwe be da ku dur be ji nexweşîyan.

Herwisa Fobya jî *" Ji zêde hîskirina tirsê pêktê. Kesê nexweş jî kesayetîyekî ezezîye û reşbînîye "*(Cebarî, 2000: 113) , fobya jî cûrek yê tirsêyê dema ku mirovek zêde hest bi tirsê bike rastî vê nexweşîyê tê.

### 2.2.7.1 Cûrên Tiris

Eşkereye ku tirs jî di serdema zarokatîyê de destpê dike. Rêjeya tirsê jî ji kesekê heya kesekî din tê gohertin.

*"A -Tirsa Bi tenêbûn : Tirs herî zêde di wî demî de derdikeve holê, dema ji zarokekî dur dikevî. Ji ber ku zarok dayîka xwe wekî cîhanekî taybet a xwe dizane , Ji ber wê jî her çiqas dayîka wî/wê jê dur bikeve ew qas hest bi tenêbûnê dike. Pişt re jî ev rewş dizivire tirsê .*

*B - Hestkirina Bi Tewanbarî : Durketina dayîkê ji zarok rik û kinê hişyar dike. Hewarikirin û qirîna zarokên nû ji bo wêye ku dayîk jê dur nekeve. Ev hemu bejdarîyê dikin di hestyarîya zarokan a bi tewan. Piştrejî ev rewş dizivire hestkirina bi tirs.*

*C - Pêkhateya Hestkirinê Bi Kêmasî : Di bingeha xwe de sedemekî yê derketina tirsêye. Wekî çawe di zarok û kesan de derikeve ev dibe sedemê hestkirina bi kêmahî beramberî hinek helwestên dewruber. Ev dilkêşîyê piştrejî dizivire tirsê "*(Elbewab, 2011: 337-338), pêwîste dayîk bi van sê cûrên tirsê re li zarok binêre. Wisan li wan bike bi kêmî hestbi tirsê bike. Bandora wê kêmbe li ser wan dakû bi şêweyekî baş di wê jîngeyê de bîjî.

*" Min bêhna darê û newala Seryas derdor dikir. Lê belê hîna ev bêhne bi temamî tevlî hestên kur nebibû. Dema ez di zevîyê de diçûm hêna heman tirs hebû. Min kesek ne dît, hest bi kesekê nekir. Tenê min ew qas dît dema min çavê xwe vekir ez li malekî berfireh de bûm "*(Elî, 2015: 11-12), tê eşkerekirin ku ew tirsa li cem Muzefer ji zevî û xelkê derdor sedemê wê mayîna wî ya di zîndanê de bû.

*" Wê şevê Îkramê Kêw ne hişt ez ji wê malê derkevim. Li cem wî tiştek ji wê bi tirstir nîne ku mirov mal nebe. Ev tişteke li gel min de. Min wisan dizanîn tirs li cem min nebû. Lê ez ji hemu tiştekî di tirsam... Wê şevê min ji Îkramê Kêw re got : Ez dixwazim hertim di nava baxçeyekê de bijîm her bar tê de xweş neke. Ez di nav xwe de dilerizm. Lê belê ez kesekbum  min bergê tirsê digirt... "*(Elî, 2015: 88) , Kêw jî hevalê Muzefer bû ne dixwest vê şevê li gel wî biçe. Di heman demê de mayîna Muzefer a di zîndanê de bibû sedemê di jîyanê de ji gelek tiştan bitirse.

*" Îkramê Kêw bi mercekê ez derxistim ji derve bikarim xwe bi parêzim. Ji tiştekî di tirsa min bi temamî ne dizanî çîye ? Şevekî tarî bû, heyîv nediyar bû. Belku bi xwe ji qest şevekî wisan hilbijartibe. Bi xwe û tifenga xwe ve di mal de hatû çû dikir. Heya direng dibe emê li bendêbin... "*(Elî, 2015: 103) ,tirsa Kêw di wir de bû, rojek ji rojan Muzefer bêje ka Seryasê kurê min ? Erê ma tu ne hevalê min bûyî me bi hevre şoreş dikir... Piştî wê jî hertim Kêw di tirsa wê de bû beramberî pirsel bi vî awayî were ? Erê Seryas di jîyanê de mayê, niha li kure ?

*" Du keç her duyan xwezayekî şevgerîyan hebûn. Siharan di wî çemî de çavên xwe di şûştin. Min hest dikir kirasên wan ê sipî wekî qetra şevê bûn. Ez jî di destpêk de ji çavên wan di tirsîya. Qet kesek nîne hi çavên wan ne tirs "*(Elî, 2015: 148), tirsa Muzefer ji wan keçikan ew bû ku xelkê ew wekî kesên bi tirs û xirap dabûn naskirin. Xelkê wisan dabû diyarkirn ew bûne sedemê mirina mirovan, Ji ber wê jî tirs di dil û derûnîya wan de çêkirîbû.

*" Wê êvarê destekî nediyar dikeve ser wê geşta taybet a dilşuşe. Geşteke ku pêwîste ez salên were de temam bike. Wê êvarê wekî hêzek jêre bêje ew ne rêya teye. Tirsa wî rê lê digohere û wî berbş cihekî din ve dibe "*(Elî, 2015: 24) , wisan diyare dilşuşe gelek tirsaye ji jîyanê . Wê tirsê wisan lê kirîye rê xwe bi gohere, here li ber derîyê xuşkên sipî.

*" Lê belê dixwast heya nefesa xwe a dawî li gel Seryas be. Girîna adem wisan dikir ajokar di tirsand. Dema siwarê maşînê bûn. Seryas çavê xwe girtî bû lêvên wî*

*wekî cûrek yê tirsê şîn û reş bû Seryas hêdî hêdî çavên xwe girt "* (Elî, 2015: 165) , Di wê şevê de dikevin rê. Belku ew cihê ku Seryas diçitê cihekî bi tirs û dijware. Seryas jî bi giranî birîndar bûye di gehe mirinê. Ev jî bu sedemê zêdetir tirsa wan.

*" Ez hertim dibin bandora wan salên ku di tarîyê de di jîyam de bûm. Temaşedikirin ezrastî tirsê hatîme ji ber wê jî min zîndan wekî gora xwe dîtî bû. Gorekî biçûk wekî gora firindeyekê be "*(Elî, 2015: 172) , di wî demî de bû ku li gel xuşkên sipî çû bû li ser gora Seryasê yekem û dît ku gora Seryas bi wî awayîye, li cem wî gelek balkêş bû. Bi şêweyekî tirs û xirap wekî zîndana xwe wesfê wê kirîye. Zîndan jî cihekî metirsîdar û ne xweş bû ji bo Muzeferê Subehdem.

*" Navê min Seryasê subeh deme, nizanim ev kasêt wê bi gehin destê kê û wê kî goh biditê ) Ez ewim, belê ez Seryasê subehdemim.Tu ji min re dibêjî Seryasê duwem. Ditirsim ji tere ne xweş be... Na ne tirse ez ji wê natirsim ez Seryasê duwem bim. Marşela wekî min nasnake Prf şevên tarî. Ew Seryasê yekem, ez wê nizanim ku kes navê min wekî Seryasê yekem bêje... "*(Elî, 2015: 223) , Seryasê duwem dema di zîndanê de bû, bi rêya kasetan li gel Muzeferê Subehdem di axift. Armanca Muzefer jî ew bû li pey Seryasê kurê xwe bi gere. Ya ku di destpêkê de bihîstî bû tenê zanyarî hebû di derbarê Seryasê yekem de, di tirsa ku kesekî din hebe heman nav hebe. Ji ber wê jî Seryasê duwem jê re got : Ew Seryasê yekeme ez jî yê duwemim.

*" Ji nêzîk ve min ne dît, min fêm nekirî bû Seyê Celalê şemis naxwaze min bibîne. Ey xuda çi tiştekî bi tirs bû. Prçeyek goştê temam bû, min hîs dikir çavê wî bi ser rumetê wî de helyabû.Rumetê xwe bi çirnûkekî mezin pêçaye û hestîyê wî derketî bû"*(Elî, 2015: 330) , Seyê Celal hevalekî nêzîkî Muzefer bû. Cihê Seryas dizanî ku bi wî şêweyî ruyê Seryasê sêyem hebû. Geliek tirsonek bû wisan lê hatî bû her ku didît Muzefer li cem Seryase hest bi tirsê dikir. Lê belê bi mecbûrî xwe wekî keyfxweşî nîşan dida, ew tirse qebûl kirîbû.

*" Min himbêza xwe vekir û min got : Sitêrka reş derkeve ji derve... Tu dikarî bi axivî... Tu dikarî hizra wan zilamên şewîtî bikî û bi axivî. Tu ji hemuyan bi hêztirî, Were ji derve seroçavê xwe derxe ji derve ne tirse. .. Pêwîste ev bajar fêrbibe temaşeyî ser û çavên we bike. Sitêrka reş bi tirsekê got : Eger hun me ji vir derxin em jîyan nakin... Hun me derxin li ser şeqam wê pisîk me bixwe... Min Sitêrka reş veşart û min got : Ji wan re bêje bila werin ji derve... Hun hemû wê rojekê derkevin û bi rêjin kolanan...Werin ji derve bila em we nasbikin... Bila yên ku çîroka we ne bihîstine we*

*bibînin* "(Elî, 2015: 352) , Sitêrka reş hevalekî nêzîkî Seryas sêyem bû. Ditirsa piştî çûyîna Muzefer bê kes bimîne. Ji vê jî ditirsa ji ber xirabîya ruyê wan xel henekên xwe li wan bike...!

### 2.2.8 Karekterê Xemgîn

Ji wê nexweşîya derûnî a rastî mirovan tê pêktê. Ew jî ji ber rewşekî navendî yan jî ji derveyîye. Ne şerte heya dawîya temenê wî li gel wî be. Belku gelek caran wisan dibe heya demekî kurt li gel wî be. *" Ev rewşe rastî wan kesan tê ku di encamê de rastî nehametê tê.Wekî, buyerek yan jî serneketinek, mirinek, ji destdayîna heskirîyê xwe, yan jî rastî pirsgirêkekî darayî û civakî... hwd* "(Şeyda M. M., 2010: 81).

*" Xemgînî wekî nexweşîyekî wijdanî ligel rewşên din cudaye. Derdxwarin jî hestkirinekî demikîye û xwezayîye di her mirovan de heye...* "(Elbewab, 2011: 279) ,Pêwîste ew kese bi zanebûn li gel wê nexweşîyê tev bigere .

Em dikarin bêjin hertişt rastî xemê werin. Rastî derd û xeman tên , ji ber ku *" Xemgînî di destpêka qonaxa herzekarîyê de hîna di sinorê asayî yê xwe deye. Ne bûye nexweşîyekî derûnî. Lê belê pişt xistin û çaresernekirina vê nexweşîyê dibe sedemê gelek pirsgirêkan û têkçûna derûnîya mirovan di nava civakê de* "(Qereçetanî, Saykolojyay Geşe, 2009: 481) ,mirov dikare di temenê baliqbûnê de rastî xemxwarinê were. Lê belê ne tiştekî asayîye heya dawîya temenê baliqbûnê li gel de be. Wê pirsgirêkê ji xwe re û derdora xwere jî çêbike.

#### 2.2.8.1 Sedemên Xemgînîyê Li Cem Kesan Gelekin

Em dikarîn Hewlibidîn sedemên ya Herî Girîngî xemgînîyê Destnîşan Bikîn di jêr de wekî:-

" A- *Ji bo demekê yek ji sedeman wekî rastî nexweşîyekê tê danîn. Heya niha jî nizanin ew şêwazê hur heya kîjan demî wê were rakirin. Bawerî jî ew bi.*

*B - Xeletî û ne rêzîya hevsengîya di demaran de berpirsyarîya wan a di rêkirina fermana di demarên mejî de. Demarê herî girîng yê wan dema kurt be dibe sedemê derketina nexweşîya xemginîyê.*

*C - Sedemê jana derekî jî ya herî giring mirina kesekî nêzîk. Yan jî destayîna astekî civakî yan jî aborî. Yan jî hestkirina bi tewana di encama şikandina bazdana sinorê reftarêcivakê yan jî ayînî... hwd.*

*D- Elkhol, hinek dermanê xweye, xarina dermanê elkhol sedemekî girînge ji bo xemxwarinê. Yek ji sedemên herî girîng ewe ku rastî janê û têkçûna derûnê dibin. Ew jî pişt bi xwarina Elkohl ve girêdidin. Ji bo ku ji vê xemê û dil tengîyê rizgar bibe.*
*E- Nexweşî û kêm endamîya laşî, ev nexweşî dibe sedemê xemekî dirêj be. Yan jî ji ber fedîkirina kêm endamîya nexweşîyê... hwd.*
*F- Li gorî hinekan rêgeza mê zêdetir ratî tirsê tê ji ya nêr. Lê belê ev fikre xelete....* "(Nûserêk, 2012: 141-142-143-144) ,ew sedemên kû hatine eşkerekirin, gelek ji wan armanca diyare. Tenê xala şeşem nediyare. ew jî aramancê wê ewe ku jin alîyên wan ê heskirinê zêdetire ji yê zilam. Ew jî wisan dike rêjeya xem û derdan li cem jinê zêdetir bibe. Dibe gelek caran ev xeme li cem zilaman zu dawî lê were. Lê belê li cem jinan bi kêşandina êşên laş dawî were. Bêguman ev jî bandorekî xirap li ser derûnîya kesan dike.

### 2.2.8.2 Cûrên Xemxwarinê Çarin

Pêkte ji çar cûran wekî:-

*" A- Xemgînîya Derûnî : Pêktê ji xemekî zêde û dudile û tengbûna nefesê. Ev jî rewşeke gelek caran encamekî baş jê derdikeve. Wekî, berhemê wêjeyî û fikrî, hinek caran jî encamên xirap jî jê derdikevin wekî xwe bi xwarinê madeyên bêhişbûnê ve girêdan.*
*B- Xemekî têkçûyî : Nexweşîyeke ji ber pêkhateya amadeyî û rast rastî mirovan tê.*
*C- Xemek ji nava xwe : Pêkhateya mirovan amadeye ji bo rastî vê nexweşîyê were. eger ev amadebûne jî hiş û dijwar be xemekî temam dikêşe.*
*D- Xemgînîya Rugirtî : Ev cûrê xemgînîyê jî nexweşîya xwe ji xelkê di veşêre. Yan jî nîşanê wê bi ronî eşkere nake. Herî zêde jî li gel zarokên biçûk çêdibe* "(Cebarî, 2000: 115-116) , eger li gorî van cûrê xeman be hemu mirov rastî xeman tê. Pêwîste xwe gelek jê bi parêzin da ku xelk hest bi xem û derê wan neke.

*" Wekî rihê min bixwîne bi xemgînî got :Hinek caran serkeftin û mirin wekî heve. Min hest kiri ku hesabê tarîyê ji min re dike. Hesabê mirinê... Ewî min di hemu cihande kuştî bû wekî di bîranînan de nebîm. Bi balkêşî temaşekir û got : Ez dixwazim li ser mirinê axafitinê li gel te bikim. Hinek ji acizî got : Ez ji mirinê ne hatîme* "(Elî, 2015: 33-34) , di wî demî de bû Yaqubî dost piştî azadbûna Muzefer ji zîndanê bi vî awayî xemgînÎ behsa jîyan û mirinê dike...

*" Min got : Eger ez bizivirm cîhanê, eger ez hesbikim tevlî jîyana we bibim ji bo Seryase... Seryasê subehdem kurê min bû... Tu nasdikî... Wisan nîne nasdike ? Bi*

*xemgînîyekî giran got ez dizanim mirîye... Seryasê subehdem demkî pêşîya niha hat kuştin... Ez bi temamî çîroka wî nizanim. Lê belê hinek kesan nasdikim çîroka wî hemûyê dizanin... "*(Elî, 2015: 83) , xemxwarina Yaqub ji ber wê bû ku Muzefer bê encam li pey Seryas dizivire. Li gorî wî tenê Seryasek heye bi hatina Muzefer jî ne gelek keyfxweş bû.

*" Ez naxwazim pesnê wê şevê ji were bikim ji ber ku nayê pesindan. Şevek bû tejî bu ji ronahîyê. Ew qas ronî bû ku bêyî çîrayek di wan şevan de diçû. Pêwîst nake ji min bi pirsî hest bi çi dikî ? Na xema min ne tenê xema bavekê bû. Piştî 21 salên zîndanê diçe ser gora kurê xwe. Belku xema mirovekê bû piştî karî diht ser baxçeyê şewitî "*(Elî, 2015: 171) , ji ber wê piştî 21 salan ji zîndanê,piştî derketina wî jî her li hêvîya dîtina Seryas bû. Lê belê neçar dibe diçe ser gora wî. Xemgînîya keçikên sipî jî her ji ber wê bû. Ji ber wê *" Wê şevê Lawlawên sipî got : Seryas kesek bû hevalê hemu xeman bû. Hevalê wan rondikane bû ku te jêre rijand. Lê belê rastîyek heye pêwîste tu bizanî. Ne ez ne jî şa derya û qet kesek nîne di vê cîhanê de bi je ev gora tu li ser digirî ya kurê teye. Muzeferê Subehdem "*(Elî, 2015: 198) , Ji ber ku li gorî xuşkên sipî pêwîst nake ew ewqas xeman bixwe ji bo Seryasekî mirî. Belku pêwîste xemê bixwe ji bo dîtina Seryasên din û li pey wan bigere... !

*" Xuşkên sipî wan dizanî ezê wekî mexluqekê xemgîn bimînim. Dizanîn bi şevan koçberê wan rîyame. Ji bilî hizirîna Seryasê Subehdem xeyalê min li çi cihek din nîne. demaez diçim hindir tenê xeyalê zarokan dikim. Serdename ya çûyîna li ser gora Seryasê yekem bi heybet û bedengîyekî balkêş derbaz bû "*(Elî, 2015: 209) , tê eşkerekirin ku hest bi xemgînîya Muzefer dikir, ew bêdngî û rêze jî dem diçû ser gora Seryasê yekem bû. Çavkanîya wê jî ji xem û derdê Muzeferê Subehdem bû.

*" Di heman demî de Silêmanê mezin ew zilamê çîyayî û xwedî rih bû. Xemgînîya wî û rihên wî wekî ajalekî nexweş bû. Her heftî bi westanekî gelek di hat ser gora kurê xwe. Êvarekê silêmanê mezin her du xuşkên sipî û dayîka wan daxwazî ser xwarinek ya êvarê kir. Mala berpirsekî yê raperînê bû. Lê belê bi rihekî xemgîn û ne razî"*(Elî, 2015: 124) , ew xemgînî û acizîya dilê Silêmangirtî hemu sedemê wê mirina kurê wî bû. Daxwaza wî ew bû bi hatina xuşkên sipî hinek xema xwe kêm bike û xema wan a li ser Mihemed jî bide alîyekê... !

*" Jîno Mexmel di pirsî ? Dwahemîn hinarî dunya li kuderê ye ? Biheşte yan jî çîye? Seryas bêyî ku temaşe bike, bi dengekî du dil û xemgînî dibêje : Ne beheşte, lê*

*belê ne gelek ji beheştê dure. Jîno a Mexmelê bi goman temaşedike û dibêje : Seryas her tiştek li beheştê nîne. Yanî gelek dure ji beheştê. Seryas bi xemekî mezin temaşe dike û dibêje: Rast dibêjî ya di beheştê de nebe ewqas jê dure "*(Elî, 2015: 156), raste her tişta ku di beheştê de nebe dibe sedemê xemgînîya kesan.

*" Lipiştî kaseta yekem mereqekî zêde ya min heye. êşa dubare ji êşa zîndanê xiraptire. Lê belê xemeke û xema mirîyane wisan dike bi axive. Xema wan her du mirîyan êşa wan geleke. Her roj wekî roja yekê ya mirina wan be û hemu roj wekî nu xebara girtina mirina wane... Ew êşe wisan dike bi axive. Muzeferê sunehdem tu kîyî ? Tu ne bavê minî? Ew bavên rast yên min bû. Şevekê min wisa ji Seryasê yekem re got : Min got tu bavê minî. Niha jî kenê wîyê bilind li bîra mine "*(Elî, 2015: 235- 236) , ev xem û derde di derûnîya Seryas de heye. Sedema wê jî ji destdana her du hevalên wî bû. Ew jî Seryasê yekem û Mihemedê dil şuşeye. Demekî gelek hevalên yek bûn. Tê diyarkirin ku piştî nemana wan xem û êşekî giran Seryasê duwem girtîye. Heya çu zîndanê jî her li gel wî berdewam bû. Ji ber vê jî bi vî awayê balkêş bersiva Muzefer da. Di rêya wê kastê re dengê xwe jêre şandîye.

*" Bi dengekî sivik û bi xemgîn got : Nikarim bi axivim... Di wî demî de şewitîye... Nikare bi axive... Tu dikarî hinek peyvan bêjî... Hinek peyvên di xeyalên te de sernivistina wî li cem ya min bû min çend rojan peyv bi peyv gotinên wî bi heve girê didim û tiştekê jê fêm dikim. Bes ez dikarim wisan bikim kesekdin nikare wisan bike "* (Elî, 2015: 329), sedemê asudeyê ne bû, xemxwarina sitêrkên reş jî ew bû ku kesek nikare Seryasê sêyem nasbike û bi başî legel kesê beramberbi axive. Ew jî ji ber sedema zêde şewitîna wî bû. Sitêrkên reş hevalên herî nêzîkî Seryasê sêyem bûn. Di wê nexweşxanê de bû ku taybete bi nexweşên şewatê. Ew jî wisan kir her bixwe fêmbike ji xem û êşên Seryas.

*" Carekê min jê pirsî Muzeferê Subehdem Seryas çû wê bê nexweşxanê. Wê were cem min.Min bi xemgînî jê re got : Na... Sitêrka reş ew roja Seryas here pêwîste ez jî xwe ji bo çûyînê amade bikim... Pêwîste ez li pey wî herim.Li yunan em ê siwarê keştîyê bibin û herin rojava. Piştre jî ezê herim ingîlîstanê. Di dengê wî de min hest bi xemgînîyekkur kir, min dizanî ez nikarim tiştekî bikim... "*(Elî, 2015: 351-352) , ji ber ku di nexweşxanê de wisan biryar hat dayîn ku Seryasê sêyem bibin Îngîltere da ku li wir bikarin çareser bikin. Bêguman Sitêrka reş jî gelek xemgîn bû bi çûyîna Seryasê sêyem. Muzefer jî piştî biryara nexweşxanê ewî jî xwast here. Hêvîya Sitêrka reş jî ew

bû piştî çûyîna Seryas Muzefer li gel wan bimîne. Lê belê Muzefer jî got nikarim pêwîste ez jî li gel wan biçim.

*" Nefesekî xemgîn kêşa û got : Erê tu çi dikî... Erê tu ? Min jêre got : Ez diçim, ez ê li gel Seryas herim rojava... Bi xemgînî di got : Ez ê hemuyan ji tere bihêlim. Ezê hemuyan ji tere di cihde bihêlim û herim dojehê... Di zarokatî de jî wisan bû wî tiştên xwe ji min re dihêla û min jî yên xwe ji wîre dihêla "*(Elî, 2015: 377), xemgînîya Yaqubê Sinober ew bû ku Muzefer wê bi yekcarî welatê xwe bi cih bihêle û here cem Seryasê sêye. Ji ber ku Muzefer hevalê zarokatî yê Yaqub bû.

### 2.2.9 Karekterê Namo (Nediyar)

Ji wan cûrê kesan pêktê, gelek caran di nava civakê de windane bi şêweyekê derneketîne derdikevin, gelek sedemên çêbûna van cûrê kesan heye , *" Encama alozîya jîyanê û pêşketina zu ya zanîstê û teknolojîyê, zêdebûna pêwîstîyên mirovan, xerîkbûna mirovan bi bihayê jîyanê re. Pişt guh xistina bihatê canî, Wisan tê dîtinku mirov hêdî hêdî ji rêça xwe derdikeve. Beramberî xwe û civakê rastî bîyanîyê tê"* (Qereçetanî, Nixoşî û Girifte Derûniye Komelayetiyekan, 2010 : 178), wate, nebûna encamekî baş a rewşenbîrîyê û bernameyekî rêkûpêk a jîyanê. Ev jî dibe sedemê ku wêneyê xwe ê di nav civakê de nizane çi bike. Ev jî wisan lê dike hest bi bîyanîyê bike, dur be ji kesên dewrubera xwe.

Di pirtûka rexneyî a wêjeyî de bi vî awayî karekterê namo destnîşan kirîye , *" Hestkirina mirov ji xwe birîn. Li gel pêşketina teknolojîyê mirov hîs dike ku buye amêrek xwe rêve nabe "*(Kerîm, 2013: 165) , ew pêwîstîyên ku di jîyanê de cihê mirovan girtîye, xelk di karê xwe de bikartîne. Di wî demî de jî pêwîstîya wan hindik bi mirovan heye. Ew jî wisan dike dur bikevin ji jîyanê.

Têgeha namoyê li cem Froud di naverokê de pêktê ji *" Xwe xilaskirina mirovan ji melûlî di xwezaya wan de heyî. Di encama wan pirsgirêkên di kevin pêşîyê ji bo rêya çareyê di nav bera hewildan de ji bo giştî meyl û xerîzeyên serbixwe "*(Nesreddîn, 2013: 346) , Ji ber wê jî mirov dixwaze hemu pêwîstîyên xwe bi destbixe, da ku ji namoyê rizgar bibe. Di heman demê de dur be ji pirsgirêkên civakî û şaristanî.

Em dikarin bêjin namoyî bûyîn diyardeyekî derûnîye, *" Di encama komek sedemên civakî deçêdibe. Ji van jî, hejarî, buyerên diltezî, nebûna hêzê û piştgirîyê û çaresernekirina pirsgirêkên civakê. Nebuna pile û rêzê di nava civakê de. Kes wisan hîs bike di civakê de pişt guhre hatîye avêtin û çi nirx û bihayê wî di jîyanê de nîne*

"(Qereçetanî, Hendêk Nexoşî û Giriftî Derûnî û Komelayetî, 2010: 54) , Ji ber wê jî em dibînin kesên dest kurt û hejar herî zêde rastî namoyî bûyînê tên. Tê diyarkirin ku buyerêns xwezayÎ, wisan li mirovan dike namoyî be, Pêwîste ew bawerî di wî de çêbibe bi alîkarîya kesên di nava civakê de ji namoyî bûyînê rizgar bibe, Ev jî bi serê xwe hizrekî xelete pêwîste ew kes bixwe bawerîya xwe bi jîyanê bîne. Pirsgirêkên di nava civakê de bandorê li ser wî neke, Heya durbe ji bîyanîyê.

Li gorî Froud *" Namoîya mirovan di zivire ser bend û pîvanên zagonî yêndi nava civakê de derdikeve. Li ser çalekîyên xerîzî yên mirov di rêya damezirandina civakê û rewşenbîrî, madyet jî xwe dispêre civakê. Ev jî wekî pîvanekê ye nabe mirov xwe jê bide paş. Ev namoye jî her di destpêka zarokatîyê de destpêdike. Ji ber ku liser pêwîste û di bêjin( Weneke ) yan jî ( Şerme ) ev hemu diibin sedemê tirs di mejîyê wî de çêbibe "*(Nesreddîn, 2013: 346) , ev jî di wê demî de têdema zarok di destpêka jîyana xwe de hewildide hinek tiştan û pêdîvîyên xwe li gorî hêza xwe bi dest bixe. Lê belê dema ku civakê jî got vê neke ev şerme ew raste rast tirsê têxe li ser laşê wî. Ev jî wisan lêdike xerîbe derbikeve. Bi şêweyekî baş di nava civakê de rêve neçe,bibe wekî kesekî namo.

*" Yakub Sinorber mirovekî xwedî xeyalên gelek bû. Di şeva yekem de di wê kuşka sar û bedeng de tirsîya bû. 21 salan bi tenê bûm , 21 salan ez bêdeng bûm, Min di van 21 salan de karekî mezin dikir ku ez ziman ji bîr nekim, Lê belê di van salên di zîndanê de min demê wê hebû ku ez zimanek din çêbikim. Zimanê helbestên hêsan dema ez hatim ji derve min dikarî hemu tiştan bêjim. Lê belê hinek kesan ji min fêmnedikirin "*(Elî, 2015: 6-7) ,ew tê berçavê min û xelkên din jî bi heman awayî tên li ber çavê min. Piştî dîtina Yakub ecêb mabû wekî kesekî namo dihat berçavan. Di wî demî de Muzefer û xweza, xelk jî wekî tiştekî xerîb dihat li ber çavê wî. Her vê xerîbîyê wisan lê kir ku xwe fêrî zimanê helbestên asanî bike.

*" Demê nîvro bû hat. Bi tenê hat hindir, Eger navê xwe ne gotîya belku min ew nasnedikir, Di dengê wî de hîna hêjanek balkêş hebû , Hinek pîr bibû lê di bejnê de biheybet bû , Ez li wê hêvîyê bûm ku dema me hevû dît em xwe bavêjin hev, Lê wî bi germî ez pêşwazî kirim ne min "* (Elî, 2015: 27-28) , di wê demê de bû Yakup ferman bi pasevana da herin Muzefer bînin. Ew jî çend kesên bîyanî û ne nasyarbûn ev kare kirin. Ji ber wê jî yakub di vê nivroyê de diçe cem Muzefer. Muzefer ji dur ve wekî

kesekî namo temaşe kir, Heya ku nêzîkî wî ne bû ne dizanî Yakubê hevalê wîye. Ew jî ji ber van 21 salên zîndanê bû.

*" Wê êvarê hêdî hêdî baran di hat. Mihemedê dil şuşe temaşeyî asîman dike û balê dide û dibêje heya niha min ewrên wisa bitirs nedîtîye. Bêyî ku bi tirse bimifte û derîyê xeyalên xwe re dileyîst û sitiran digot. êvarekî xweş bû li gorî Mihemed mifteyên wî tenê di demê baranê dederî vedike "*(Elî, 2015: 18) bi vê li cem xelkê balkêş dihat dil şuşe bivî awayî li gel mifteyên jîyanê dilehîst. Ji ber wê jî ew wekî kesekî xerîb didîtin. Mihemed jî wisan lê hatîye  xwewekî kesekî namo bibîne.

*" Di destpêkê de pasevana ew nasnedikirin. ew jiwan re dibêje: Ez kurê weme. Kurê Silêmanê mezin. Rengekî wî heye wekî rengê mirîyane. Du caran gazî Silêmanê mezinkir lê nasnekir "*(Elî, 2015: 47) , sedemê ne naskirina dilşuşe ji alîyê bavê wî pasevana ve xuşkên sipî bû. Ewan heskirina Mihemed qebul nekirin û ew jî wisan kir ku wekî kesekî namo û şikestê bê dîtîn. Li cem wan gelek balkêş bû ku ev bi serê wî hat.

*" Xwezaya wan wekî du kesên din xwe na goherin. Ew wekî du keçên goşegir mezin dibin. Du keçin zilam xwe jiwan diparêze. Ne ji ber ew ne xweşikin. Ji ber ku hêzek di çavê wan deye zilam jê ditirse "*(Elî, 2015: 40) , sedemê namoyîya xuşkên sipî ew bû ku di wî serdemî de li cem xelkê gelek balkêş bû ew bi vî awayî temaşeyî jîyanê dikin û jÎyana xwe dizivirînin. Ji ber wê jî ewan xwe wekî dukesên bîyanî dîtîn. Ew jî ji ber wêye ku zilam ji çavên wan ditirsan ne wekî mihemedêdil şuşe bibin evîndarê wan...!

*" Yekemîn roja naskirina me bû û destê xwe da milê min û got : Ew birayê me bû... Eger tu dixwazî tu dikarî li gel me jîyan bikî.Ez tiştek balkêş bûm ji bo wan. Ewan jî kesekî nedîtîbû bi salan bitenê ma be "*(Elî, 2015: 147) , tê diyarkirin ku piştî mirina Seryas kesek nebû bigire himbêza xwe. Piştî zivirîna Muzefer ji bo Seryas. Wî xuşkên sipî nasdikir ji ber wêjî li ber çavên wan jî ev ruye bîyanî bû... !

*" Ewên ji nêzîk ve nasdikirin gotin : Hêzekî efsaneyî hebû li ser razîkirina jemê kesekê. Bi sedan zarokbun eger ev erebane neban wê hemu biban çekdar. Yan jî pêwîste bi zivirîna gundê pîs û tarî , yan jî li gel karwanekê berê xwe bidin ji derveyî welat "* (Elî, 2015: 113-114) , sedemê temaşekirina Seryas wekî kesekî bîyanî , ya balkêş ew bû ku bikare zarokan hemuyan di cihekê de kombike. Bike xwedîyê erebana û jîyanê ji wan re ava bike... !

*" Wê êvarê Seryasê mezin li bin daran firingî sipî dikir, caciq çêdikir û goşt çêdikir. Goşt bilind dikir û digot : Neremeyekî çiqas xweşike. Nedîmê kurê melon gazî me dike. Me hay ji hemu axaftinê xwe bû. Wî bi dengekî bilind got : Ew daramine, Dara bavê mine, dara nesîmê şahdehemîne ku di kuşka pehlewîyan de xwedî xan bû.."*(Elî, 2015: 262-263) , ew jî sedemek bu nedîm ji alîyê hevalên xwe ve wekî kesekî namo be. Kur bû lê gelek jîr bû pispor bû di naskirina cihan de. Wekî cihê Diwahemîn henarî dunya... !

*" Seryasê duwem zarokekî sipî û çav hingîvîne. Li cem hemu mexluqutan bi gumane. Di destpêkê de jê fêm nedikirn. Gêjî û ne fêdmî bê halî bandorekî li ser sîmayê wî hebû. Di tangekî kevin a bin qul de du caran çavê xwe dişû û dibêje: Ev êvar naçe û beyanîyekî nexweşî diçe... "*(Elî, 2015: 180) , ji ber ku Seryasê duwem bê dayîk û bav mezin bûye. Ew jî wisan lê kiribû xelk wekî gêj û bîyanî temaşeyî bikin. Ew bixwe jî wisan lê hatibû ku wekî kesekî bîyanî temaşeyî xwe bike.

### 2.2.10 Karekterê Şermin

Ew keseye ku bi çêbûna rewşekî nexwesteke di nava civakê de. Ev jî bi xwe kêmzanîn û ne nîşandana hêza veşartî ya di nava civakê de. Wekî nexweşîyekî derûnî singê  xelkê têkdide. Ev jî dibe sedemê durketina ji kesên derdor.

Şerim yan jî fedîkirin *" Destnîşankirina hebûna xwestekan goşegir û du dilî yan jî hestnekirina asudeyê di nava vê rewşê de. Pêwîste peywendîyê li gel xelkê din bike "*(Entonî, 2011: 14-15) ,ew jî ew axaftin û peywendîye li gel xelkê ji bo nemayîna şermê.

Şermin  *" Nexweşîyekî derûnîye belavbûye di nava endamên civakê de. Wisan bi mirovan dike mirov berbi ne serkeftinê ve biçe "* (Şeyda M. K., 2000: 24) *Ev jî bandorekê li ser jîyanê çêdike. Lewazîya derûnîye. Lekebûn betmanî sorbûn û tirsîn.... Hemu nekirine yan jî axaftin û reftare ku pêwîste di demê xwe de û cihê xwede bê kirin.*

Şermkirin *" wekî nemayîna gazê di çirayê deye. Kêmdibe û  ronahî namîne, her çiqas ew çiraye baş jî be. Şermkirin hewildanekî negatîfe  ji ber ku mirov nikare peywendîyê li gel kesên derdor girê bide. Ya ku heye em bêjin, kar di pêşketin û serkeftina mirovan de dike"*(Nesreddîn, 2013: 216), wisan jî lê dike peywendîya civakî jî gelek serkeftî nebe û hertim hest bike pêwîstîya wan bi alîkarîya kesên din heye. Da ku rizgar bibe ji vê şermê ruyê xwe kirîyê. Ev jî hizirînekî xeletî ya wî kesîye pêwîste

ji bo xwe gelek demên jîyanê de hewildanê bide. Heya rizgar bibe ji şerminê da ku bikare bi tenê pêwîstîyên xwe bi cih bîne di jîyanê de.

*" Şermkirin yek ji wan reftarane kêmtire ji diyardeyên derûnîyên din. Bala kesên hawirdor dikişîne. Hinek ji dayîk û bav, mamoste diyardeyên tirsê jê datîne* "(Qereçetanî, Saykolojyay Geşe, 2009: 251) , ji ber ku li gorî wan heya demekî kêm yan jî zêde li gel wan dimîne. Bandorekî zêde li ser derûnîyê nake. Ev jî hizirînek xelet ya wan kesane. Eger şerm bi berdewamî li gel te berdewam bibe tu nikarî karê xwe encam bidî.

Gotinek ya bavan di nava civaka me de heye ku di bêjin: Zarok dema aqil dibe tevgera wan kêmdibe. Jina şermin bajerekê tîne, zilamê şermin şanazîyekî bêdawî. Eger em di vî alîde temaşe bikîn em dibînin ku zarok zêde çav li dayîka xwe dike. Eger dayîk bi şermin tevlî civakê nebû, bêguman zaroka wê jî wê wekî wê derbikeve. Ev jî bandorekî baş li ser laşê zarok nake.

Derbarê çêbûna sedemên şerminyê bêguman komek sedemên navendî û ji derveyî kar dikin, bandorê li ser derûnîya mirovan çêdike.

*" A- Yekem şermkirin di rêya ( piştgoh xistin, sivkayî û rîsawkirin ) di nav dil û derûnîya zarokan de dçikile.*

*B- Danîna rêgirtina li ber zarokan li gel zarokên din. Wekî bîyanîya parastina wan ji reftarê xirap. Ji ber ku her di destpêka jîyanê de rewşekî goncaw ji bo zarok rêxistin û ji bo tevlîbûn û naskirina wan ya di nava civakê de. Bêguman zarok di pêşerojê de bê par dibe ji zanyarî û naskirinê civakî. Rastî tirs şermîn û hestên kêm bûnê dibe.*

*C- Nebûna lewazîyê bawerî ya bixwe û bi çavekî kêm temaşekirina xwe û çavekî sivik.*

*D- Çavlêkirina kesên derdor. Dema ku kesên derora zarok şerdikin, ew zarok jî wan dibîne û çav li wan dike.*

*E- Nazdarî mezin kirina zarok û bicih anîna pêwîstîyên wî* "(Qereçetanî, Saykolojyay Geşe, 2009: 252), her ji ber vê jî çareserîya diyardeya şerminê ya li cem mirovam pêwîstîya wan bi nehiştina van sedemên jorin. Ev jî zanayên jêhatî jêre pêwîste da ku çareser bike. Başîya xwe a jîngeyî û tevlîbûna xwe bi peywendîyên civakîre pêkbîne.

*" Wê êvarê bi bêdengî derbas bû. Her du xuşk daxwazê jê dike vê hinara şuşe bide wî. Bi şermî dibêje: Ew ne hinara mine... Belku hinara bêdawîyane. Ji hizra wê hinarê guldana zîv ya yadgarî di cihde dihêle* "(Elî, 2015: 23-24), di vir de destpêka

naskirina xuşkên sipî û Mihemedê dil şuşe bûye. Her ji ber wê Mihemed bi şermî bersiva xuşkan dide. Hinar neda wan.

*"Nedîmê Şazade lawekî bêşerm bû. Li bîra min nayê kesek ji wî hes bike. Wekî Mihemedê dil şuşe nebû bi nazîkî dilê min wêrankir, ez di kuştim. Wê êvarê Mihemedê dil şuşe dest da milê Nedîmê Şazade û got : Nedîm rast dibêje ev darê şazdehîyane "*(Elî, 2015: 263), Seryas behsa hevaltîya li gel Nedîm û Mihemed dike. Gelek şerm nekirîye di babetan de gotinên xwe têde kirîye wekî Seryas bûye. Kurekî şermin bu di destpêka temenê xwe .

*" Bi şermî du keçan dibîne û silavê li wan dike , ew feqîrtirîn kurê cîhanê ye... Kesek nizane ji kur hatîye. Bi xwe jî nizane kîye. Bes dizane navê wî Seryasê Subehdeme. Navekî balkêşe di nava navê bê rehimde "*(Elî, 2015: 98) , ji ber wê Seryas bê dayîk û bav mezin bûye. her li ser şeqam û cahdeyan bû , ew jî wisan lê kirîbû her dema ku yek didît şerm lê dikir, dema temaşeyî nav çavên yê beramber dikir.

*"  Tu di pola çendê deyî, bavê te çi karî dike ? Seryas got min ne xuşk heye ne jî bira, ne dayîk û ne jî bav û min dibistan jî ne xwendîye. Piştî ku ev hemu pirs ji Seryas kirin, ewan jî behsa mirina bav û bê birayên xwe kirin. Bi cûrekî şanazî gotin : Em ji malbata mamostayanîn. Dema temam bû Seryas hinek bi şermî got : Ez we nasdikim, hun xuşkên sipîne... Ez dixwazim carek din goh bidim dengê we. Şahderyayên sipî û Lawlawên sipî  bi tirs û xuruş gotin: Na ne xwaze, goh nede dengê me qet ne xwaze "*(Elî, 2015: 94-95) ,sedemê şermina Seryas ew bû ku destpêkê ew nasdikirin. Piştre xelkê wisan behsan wan xuşkan kirî bû kî wan bi bîne aşiqê wan dibe. Ji ber wê jî Seryas hinek şerm hebû.

*" Ew zilame bû şerm û têkçûn sorbûn û balkêşîyekî diyar li cem xuşkên sipî bi cih hiştîbû. Lê belê xuşkên sipî heya siharê bi wî kenîn. Şermina wî kurî bi cûrekî kenîn bû , dema sitirana xwe xilas kirin rabûn bi wê sermayê sitiran. Ji prf şevêntarî yê me re got: Me bi gehîne mal, Bi rêza birayê xwe şermekî temam ji xuşkan bike. got : Ser çavan, her niha ezê we bigihînim. Wê şevê gelek gotin li cem min bû. Ji Seryas re got : Neçe hezar çîrokên din li cem mine... "*(Elî, 2015: 101-103) ,di vir de kaseta çarebû Seryasê duwem ji bo Muzefer dişîne. Behsa fedîkirina Seryas dike her dem wekî xuşkên xwe temaşeyî keçên sipî dike. Berdewam ew şerme hebu li beramberî wan.

*" Dema sitirana xwe xilaskir, bi wê nîgarê xwe ê sar ve rabû ser xwe. Me ji pirofesorê şevên tarî re got: Me bi gehîne malê. Marşal bi rêzdarîya birayên xwe re bi*

*temamî ji xuşkên sipî şerm bike. Got: Serçavan, Her niha ezê we bi gehînîm. Di vê şevê de gelek axaftin li cem min hebû. Min ji Seryas re got : Neçe, bi hezaran çîrokên din li cem mine "*(Elî, 2015: 267) , di vir de di kaseta çarem de Seryasê duwem ji bo Muzeferê dulnermî behsa şerma Seryas dike. Her tim wekî xuşka xwe temaşeyî xuşkên sipî dikir. Berdewam ew şerma wî hebû li beramberî wan.

*" Ji bilî vi cihê biçûk û vî zerfa peran min tiştek din nîne... Çiqas tu dixwazî rake, dixwazî zevîyekê bi kirî bi gire. Wisan got zerîyek mezin ket ser ruyê wî. Wekî ku şerm bi mezinbûna xwe bike. Bi pîrîya min ve û destê min maç dike. Min jê re got : Îkramê bin mezintirîn biçûkê cîhanê... ez ê ji destpêkê destpê bikim, ezê bi hinek zevî û hinek ajalên biçûk destpêbikim "*(Elî, 2015: 206) , sedemê wê hestkirina Îkramê Kêw ew bû gelek sale Muzefer ne dîtîye ji ber wê ev helweste kir.

*" Wekî min baweşdir ji Seryasê Subehdem re got : Ez gelek bêrîya te dikim... Em hevêln hevin hemu rojan bi hevre nan dixwin. Sitêrka reş kurekî şermîn bû. Lê belê rastgo bû. Wî destê min girt û ji min re got : Tu dikarî çend rojan li gel xwe bibî ji derve... Belku here Ewrupa pêşî ku hun bibin. Tu dikarî çend rojan bibî cem xwe. Hişk destê min digirt û di got : Min jî li gel cwe bibin, Ez vaye demek ji derve na razêm "*(Elî, 2015: 335) ,Sitêrka reş hevalekî nêzîkî Seryasê sêyem bû. Sedemê şermina wan jî ew bû gelek temenê jîyana xwe bi şewitîna Seryas birin serê. Kêm tevlî xelkê dibûn. Ji ber wê bi şermî li gel Muzefer di axivî. Ji ber wê jî eşkereye ew kêm tevlî xelkê dibin.Zêde şermin bû li gelkesên din. !

## ENCAM

Roman yek ji ew cûreyên wêjeyê ye ku bi zelalî alîyê derûnîya kesayetîyan têda derdikeve.

Di nav romana (Diwahemîn Henara Dunyayê) da ji bilî sedemên civakî, sîyasî û aborî sedemên rewşenbîrî û dînî jî bi ber çavan dikevin.

Peywendîyeke bi tîn û xurt di navbera derûn û wêjeyê da heye, ev jî ji ber wê ye ku nivîskar bi rêya derûnîya xwe ve digêje mijareke wêjeyî.

Zimanê nivîsandina romanên Bextîyar ‘Elî, zimanekî sade, hêsan û zelal e ku pirranîya gel ji zimanê xwendina romanên wî têdigên (fêm dikin).

Di nav romana (Diwahemîn Henara Dunya)ya Bextîyar ‘Elî da zêdetir kesayetîyên; geşbîn, reşbîn û tirsonek bi ber çavan dikevin, cûreyên din yên wek; şermin, xemgîn û… hwd jî têda kêm derdikevin.

Bi şêweyeke giştî ew bûyerên ku Bextîyar ‘Elî di romana(Diwahemîn Henara Dunyayê) da wergirtîye, zêdetir peywendîyan wan bi rewşa gelê kurdan ya salên nodî (90) ve hene.

Dema ku em bala xwe didin romanên Bextîyar ‘Elî û bi taybetî jî romana (Diwahemîn Henara Dunyayê) em dibînin gelek alîyên sîyasî di nav romanê da bi ber çavan dikevin, ew jî wisa diyare ku behsa bûyereke dîrokîya serdema xwe dike û behsa yekgirtin û yekrêzîya gelê kurd dike wek; Şerê Navxweyî yê Kurd di salên nodî da.

Di navromana (Diwahemîn Henara Dunyayê) da dema ku em bala xwe didin alîyê civakî em dibînin, jinên ku zilm û zordarî li wan hatinekirin tên nîşandan û bi eşkere jî di nav romanê da diyare ku heta radeyeke bilind jin di jîyana xwe da rastî sîstem û nexweşîyên sîstemê tên.

Herwisa dema ku em bala xwe didin alîyê aborîyê romanê, diyare gel neçarin û ji bo debara xwe bikin divê gelekî bixebitin, di vir da jî diyare vê yekê bandoreke nebaş li ser kesayetîyên romanê kirîye ku ji bo debara xwe bikin.

## ÇAVKANÎ

Nawdar ,*Basêkî Bextiyar Elî*. (2017).

Besîr, D. K. (1993). *Mêjûy Rexnesazî*. Weş,Korî Zanyarî Îraq.Bexdad .

Birêslêr, Ç. (2007). *Rexney Edebî Qutabxanekanî - Pêşêşekîyek Bo Tiyorî.* (Wer, Yehqûbî). Weş, Aras , Çapî Diwem. Hewlêr .

Bokanî, S. (2006). *Le Saykolojyay Mirovda.* Weş, Renc. Silêmanî .

Burî, L. A. (2006). *Geryan Li Dîf Bexteweryiyê.* (Wer,C. S. Pîndiroyî). Weş, Wezaretî Perwerde. Hewlêr .

Cebarî, U. Y. (2000). *Derûnzanî* . Weş, Zankoy Selaheddîn. Hewlêr.

Cemîl, H. (2010). *Kesayetî Karîger*. (Wer, H. S. Kewlosî). Weş, Genc. Silêmanî .

Cengawî, w. B. (2011). *Dad Yan Bêdadî.*Weş, Hemdî. Silêmanî.

Dayir, W. (2004). *Hest Be Gewreyî Xot Bike.* (Wer, N. Selahî). Weş, Çawar Çira. Silêmanî.

Ehmed, H. U. (1977). *Rajenînî Lankî Mirovayetî.* Weş, Kameranî. Silêmanî .

Ehmed, R. (1999). *Adler û Saykolojyay Takekes.* Raman,Hej, 40.Hewlêr.

Elbewab, X. (2011). *Însaykilopîdiyay Derûnî.* (Wer,F. M. Kewrînî). Weş, Wezaretî Roşenbîrî û Lawan. Hewlêr .

Elî, B. (2015). *Diwahemîn Henarî Dunya.* Weş, Endêşe , Çapî Şeşem. Silêmanî .

Entonî, M. (2011). *De Rêgay Asan Bo Çareserî şerminî.* (Wer,M. Kewlosî). Weş, Genc , Çapî Diwem. Silêmanî .

'erîfî, m. (2010). *bextewer bijî.* (Wer,h. m. elî). Weş, dar alme'arife. libnan .

Ezîz, '. E. (2012). *Binemakanî Derûnzanî Giştî.* Weş, Rojhelat , Çapî Sêyem. Hewlêr .

Froud, E. û. (2007). *Palnerekanî Ceng.* (Wer, M. Helebjeyî). Weş, Wezaretî Roşenbîrî. Hewlêr.

Froud, S. (2015). *Pênc Wane Le Derûnşîkarîda.* (Wer, S. M. Ewla) .Weş, Rojhelat. Hewlêr

Hemed, A. U. (1998). *Zanay derûnzanî Alfrêd Adler.* Raman, Hej, 27. Hewlêr .

Hemed, A. U. (1999). Rehendekanî Kesayetî Le Nêwan Firoyid û Eniştayîn. *Raman,Hej, 37*, 246.

Hemed, K. R. (2015). *Rûdawe Siyasî û Komelayetîyekan Le Romanekanî Kerî kakeda.* Beşî Kurdî. (T , M Nehatîye Weşandin ) . Zankoy sellaheddîn Kolêjî Perwerde. Hewlêr.

Hemed, U. U. (2015). *Çend Wêstgeyekî Saykolojî.* Weş, Ofsêtî Tîşik. Hewlêr .

Husên, H. (2010). *Derwazeyek Bo Rexney Edebî Niwêyî Kurdî.* Weş, Baz , Çapî Diwem. Hewlêr.

Îbrahîm, R. E. (2000). *Girîngtirîn Tiyorekanî Kesayetî.* Raman,Hej, 47.Hewlêr.

Îbrahîm, R. E. (2000). *Girîngtirîn Tiyorekanî Kesayetî Tiyorî Şîkaryetî .* Raman, Hej,48.Hewlêr.

Îgilton, T. (2004). *Şîkirdinewey Derûnî.* (Wer, S. H. Palewan).Weş, Serdem. Silêmanî .

Kaprîz, F. .. (2009). *Derûnzanî Reftar.*(Wer, S. Xwrmalî). Weş, Genc , Çapî Çiwarem. Silêmanî.

Kerîm, A. E. (2013). *Rexney Edebî.* Weş, Karo. Kerkûk .

Kurtiwa, C. .. (2001). *Derbarey Hunerî Serkirdayetî Kirdin.* (Wer, S. Bokanî). Weş, Danas. Silêmanî .

Mehdî, E. (2012). *Kesayetî Le Nêwan Serkewtin û Sernekewtin.* Weş, Roşenbîrî. Hewlêr.

Mehmmud, M. (2004). *Şî'r û Felsefe.* (Wer, F. Mecîd). Weş, Hemdî , Çapî Diwem. Silêmanî.

Mustefa, E. E. (2007). *Geşbînî ... Giringtirîn Rêgay Bextewerî û Asûdey Toye.* Silêmanî Weş, Gul. Silêmanî .

Nadir, H. (1999). Dîdgayekewe, *Ravekirdinî Geşey Saykolojî Le Çend.* Raman,Hej, 42.Hewlêr.

Nesreddîn, K. F. (2013). *Le Perawêzî Kesayetîda* . Weş, Mûkiryan. Hewlêr .

Nûser, K. (2008). Min Hem Min Şerangêzim. In K. Nûser, *Min Hem Min Şerangêzim* (Wer, S. Cemal). Weş, Rûn. Silêmanî.

Nûserêk, Ç. (2012). *Nexoşîye Derûnîyekan - Hokar û Çareser.* (Wer,B. M. Elî). Weş, Genc. Silêmanî.

Palewan, S. H. (2015, 8 15). *Basnîyuz* .

pertuk, karîgerî nest ...

Pispor, L. (2004). *Derûnzanî Komelayetî.* (Wer, C. X. Jaleyî) Weş, Genc. Silêmanî .

Prf, H. Y. (2008). *Derûnnasî Tirs.* (Wer, N. Selahî) .Weş, Şivan. Hewlêr.

Qadir, E. M. (2014). *Kêşe Aburyekan û Çareseryekan Le Dîdî Aburî Îslamda.*Weş, Minare. Hewlêr.

Qadir, R. X. (2009). *Mîtodî Rexney Tewawkarî Le Edebî kurdîda.* Beşî Kurdî. (T, M Nehatîye Weşandin ) . Zankoy Sellahaddîn Kolêjî Ziman . Hewlêr.

Qereçetanî, K. Ş. (1996). *Derwazey Derûnzanî.* Weş, Zanko. Hewlêr.

Qereçetanî, K. Ş. (2007). *Saykolojiyay Giştî.* Weş, Hacî Haşim , Çapî Diwem. Hewlêr.

Qereçetanî, K. Ş. (2009). *Saykolojyay Geşe.* Weş, Peywend. Silêmanî .

Qereçetanî, K. Ş. (2010). *Hendêk Nexoşî û Giriftî Derûnî û Komelayetî.* Weş, Hacî Haşim. Hewlêr.

Qereçetanî, K. Ş. (2010). *Nixoşî û Girifte Derûniye Komelayetiyekan.* Weş, Peywend. Silêmanî.

Qeredaxî, '. (2001). *Rêbazekanî Rexney Derûnî.* Weş, Renc. Silêmanî .

Rabînis, E. (2006). *Serkewtinî Bêsnûr Le (20)da.* (Wer, H. Hesen). Weş, Wezaretî Perwerde. Hewlêr.

Resul, H. B. (2012). *Rehendî Derûnî Le Çîrokekanî (Şerzad Hesen)da.*Weş Mûkiryan. Hewlêr.

Salih, Q. H. (2002). *Mirov Le Riwangey Firoiyîdewe* .Weş, Serdem. Silêmanî.

Şamlo, S. (2010). *Qutabxane û Tiyorekanî Derûnzanî Kesayetî.* (Wer, S. D. Firmêsik Rizgar). Weş, Genc. Silêmanî .

Şerîf, '. T. (2009). *Derûnasî Giştî.* Weş, Arabca , Çapî Diwem. Kerkûk .

Şeyda, M. K. (2000). *Nexoşîye Derûnyekan û Derûn Leşyekan* .Weş, Wezaretî Roşenbîrî. Hewlêr.

Şeyda, M. M. (2010). *Çareserî Nexoşîye Derûnîyekan .* Weş, Soran. Hewlêr .

*Tendrwstî Kurd*. (2015).

W. B, G. (1983). *Derûnzanî.* (Wer, H. U. Ehmed). Weş, Dar Elhurîye. Bexdad .

Xerîb, P. '. (2011). *Şî'rekanî Bextiyar Elî Le Riwangey Derûnşîkarîyewe.* Beşî Kurdî. ( T, M Nehatîye Weşandin ) . Zankoy Selaheddîn Kolêjî Ziman . Hewlêr.

Xwrşîd, B. F. (2015). *Hunerî Monolog Le Romanekanî Rêwas Ehmed da.* Beşî kurdî.( T , M Nehatîye Weşandin ) . Zankoy Sellaheddîn Kolêjî Ziman . Hewlêr .

Yonug, K. G. (2005). *Mirov û Hêmakanî.*Weş, Serdem. Silêmanî .

**JÎNENÎGARÎ**

REBAND ISMSEL AHMED di 08.11.1991’ê de li bajêrê Hewlêrê li taxa Şoreşê ji dayika xwe bûye. Dê û bavê wî xelkê Hewlêrê ne. Xwendina xwe ya despêk û amadehiyê li Hewlêrê temam kirine û li Hewlêrê li Zanîngeha Sellaheddînê li Fakulteya Perwerdehiyê Beşa Ziman û Wêjeya Kurdî di vedora 2013-2014’an de temam kirîye. Di beşa ziman û çanda kurdî de lîsansa bilind di vedora 2017- 2018’an de li bajarê Wanê berdewam dike.

Reband niha karê mamostetiyê dike. Di vedora 2016- 2017’an li peymengeha Qela û Minareyê li bajêrê Hewlêrê weke mamosteyê ziman û wêjeya kurdî dest bi karê xwe kir.

**ÖZGEÇMİŞ**

REBAND ISMAIL AHMED 08.11.1991’te Erbil şehrin Şorş mahallesinde doğmuş. Anne ve babasi Erbil'de ikamet ediyor. İlkokul ve liseyi Erbil'de bitirdi ve daha sonra 2013 -2014 eğitim ve öğretim döneminde Erbil'de Selahaddin Üniversitesi Eğitim Fakültesi Kürt Dili ve Edebiyatı bölümünden mezun oldu. Daha sonra 2017-2018 yılında Türkiye'nin Van ilinde Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü bölümü yüksek lisans programından devam ediyor.

Asıl mesleği öğretmenlik olan Reband, 2016-2017 eğitim ve öğretim döneminden Erbil'de Kela ve Minare Akademisi’nde Kürt dili ve edebiyatı öğretmeni olarak çalışmaktadır.